nivîsê, bêyî ku hînkirina stratejiyê were kirin, performansa têgihîştinê dikare were diyarkirin. Lê belê ji bo hin kesan dema cureyê nivîsê tê guhertin, dibe ku pêwîst be digel nasandina pêkhatiya nivîsê carekê an çend caran ji stratejiyê re modelbûn were kirin. Hînkirina Çareserkirina Pirsgerêka Matematîkê ya li ser Bingeha Pêvajoyê: Di pêvajoya çareserkirina pirsgerêkê de divê mamoste bi bilind fikirînê û bi cihdayîna diyalogên têkiliyî ji çareserkirina pirsgerêkê re bibe model. Ji bo ku li ser rewşa pirsgerêka heyî bê serî, divê ne tenê tiştê ku divê kes bike, lê belê di heman demê de divê çawa bike jî ji kes re bê modelkirin. Der barê wê yekê de ka pirsgerêka matematîkê dê çawa were çareserkirin, çar pêlekên herî bingehîn ev in; têgihîştina pirsgerêkê, plansazkirin, sepandina planê û kontrolkirin. Dema ev pêlekên tînin dayîn, divê berî çareserkirina pirsgerêkê were peydakirin ku kes pirsgerêkê bi hevokên xwe îfade bike. Dema pirsgerêkê tê çareserkirin, divê were peydakirin ku kes ji bo têgehîkirina pirsgerêkê bi şema an bi xêzkirinê xwe wê dîtbar bike. Di pêvajoya çareserkirina pirsgerêkê de divê di qonaxên xwendina pirsgerêkê bi dengekî bilind, ravekirina bi hevokên xwe, veguhastina wê bo dîtbarê, texmînkirin, kirina operasyonê û kontrolkirina pêvajoyê de ji kesan re modelbûn were kirin.

4. Pîvandî û Nirxandî di Bernameya Perwerdeya Piştgirî ji bo Kesên bi Kêmasiya Dîtinê de

Kesên ku hewcedariya wan bi perwerdeya taybet heye, di pêvajoya fêrbûnê de gava teknîkên fêrbûnê yên cuda û pirjimar bînin bikaranîn û sepandinên ku ji zêdetirî yek hestî re dibêjin bînin meşandin, hêsantir fêr dibin. Ji bo her kesekî ku ji kêmasiyê bandor bûye, cureyê bandorbûna ji kêmasiyê, asta wê, dema çêbûna kêmasiyê, xizmetên hatine peydakirin û taybetmendiyên kesane ji hev cuda ne. Girêdayî wê yekê astên fêrbûnê jî gelekî ji hev cuda dibin. Ji ber wê yekê pêwîst e ku ji bo her kesekî li gorî taybetmendiyên wî yên kesane BPK were amadekirin. BPK, dokumaneke nivîskî ye ku hatiye pêşxistin da ku hewcedariyên perwerdehiyê yên kesê ji kêmasiyê bandorbûyî di derdora perwerdehiyê yên guncaw de bi xizmetên piştgirî yên pêwîst bînin bicihanîn. Divê BPK ji bo her kesekî ku hatiye diyarkirin ji kêmasiyê bandor bûye were pêşxistin. Pêşxistina BPK'ê berî destpêkirina perwerdeya taybet, ji bo ku xizmeta perwerdeya taybet a dê were dayîn li gorî hewcedariyên kes were rêxistin pêwîst e. Divê BPK; asta performansa heyî ya kesê ji kêmasiyê bandorbûyî, armancên ku tê hêvîkirin di dawiya salê/dawiya demsalê de di kes de pêk werin, xizmetên perwerdehiyê û dema van xizmetan bihewîne. Herwiha divê xizmetên derbasbûnê yên ku dê di navbera derdor an pileyên perwerdehiyê de ji bo kes bînin peydakirin û pîvandina pêşketinê jî bihewîne. Dema BPK tê amadekirin, ji bo diyarkirina hewcedariyên kes pêwîst e ku nirxandî di destpêka pêvajoya hînkirinê de, di pêvajoya hînkirinê de, di dawiya wê de û di dawiya salê de bînin kirin. Di wê pêvajoyê de bi taybetî di destpêkê de girîng e ku nirxandî qerase û berfireh bi awayekî ku performansa rastîn a kes nîşan bînin kirin. Dema sepandinê pîvandî û nirxandî tînin meşandin, divê wek prensîba bingehîn pêvajoyên nirxandîna teşedayîner (nirxandîna pêvajoyê) û nirxandîna kurtekar (nirxandîna giştî ya dawiya salê) bînin şopandin, rêbazên berhevkirina daneyan ên cuda û amûrên pîvandî bînin bikaranîn. Sepandinê pîvandî û nirxandî yên Bernameya Perwerdeya Piştgirî ji bo Kesên bi Kêmasiya Dîtinê; ji qonaxên diyarkirina hewcedariyên kes, nirxandîna berî hînkirinê (pêş), nirxandîna dawiya hînkirinê (paş) û şopandîna pêşketinê, nirxandîna dawiya salê pêk tînin. Pêvajoya sepandîna van qonaxên nirxandî li jêr hatiye ravekirin.

1. Diyarkirina Hewcedariyên Kes

Bi armanca diyarkirina hewcedariyên kesan nirxandîna qerase tê kirin. Li navenda rêberî û lêkolînê (NRL) li gorî encama nirxandîna qerase tê diyarkirin ka kes dê kîjan modul û kîjan beşên di modulan de yên bernameya perwerdeya piştgirî ya têkildar werbigirin. Di heman demê de li navenda

perwerdeya taybet û rehabîltasyonê jî ya ku ji aliyê NRL ve hatiye diyarkirin

bi kirina nirxandinên qerase yê berbi modul û beşan ve divê hewcedariyên kes bi awayekî berfirehtir bên diyarkirin. Di encama nirxandina qerase de divê warên hewcedariyê yê kes bên diyarkirin û armanc û tevgerên armanckirî (armancên kurt û dirêjdemî) bên danîn. Bi vî awayî BPK ya kes tê amadekirin. Di nirxandina qerase de dema hewcedarî tên diyarkirin û li gorî rêza pêşînahiyê tên danîn, divê temenê kesan, asta polê, taybetmendiyên kesane, taybetmendiyên fêrbûnê û fonksiyonelbûna şiyanan a di jiyana rojane û dibistanê de bên berçavgirtin. Ji bo nirxandinên qerase yê kesan, li navenda perwerdeya taybet û rehabîltasyonê divê pêvajoya berhevkirina daneyan di sê pîvanan de were meşandin. I) Kirina hevpeyvînê: Ji bo hevpeyvînan divê ji yekê zêdetir çavkaniya daneyan were bikaranîn. Ev in: a) Malbata kes b) Mamosteyên wî yê li dibistanê (mamosteyê beriya dibistanê, mamosteyê polê, mamosteyê rêber û hwd.) c) Kes bi xwe Ger dê bi kes re hevpeyvîn were kirin, temen û asta performansê kes girîng e. Hevpeyvîna bi kes re, ji aliyê piştgirîkirin û dewlemendkirina hevpeyvînê bi malbat û mamosteyên kes re hatine kirin ve dê bi wate be. II) Kirina temaşekirinê: Di vê qonaxê de divê bi taybetî mamoste/pispor bi xwe temaşe bike. Dema temaşe tê kirin, divê li gorî kes û derdora ku dê tê de temaşe were kirin, temaşekirina avakirî an jî xwezayî were tercîhkirin. Divê encamên temaşekirinê bi hevpeyvînê hatine kirin re bên girêdan. III) Sepandina lîsteyên kontrolê û mifteyên nirxdana pileyî (rubrîk): Piştî hevpeyvîn û temaşekirinan divê bi bikaranîna lîsteyên kontrolê û mifteyên nirxdana pileyî kes yek bi yek bên pîvandîn.

2. Nirxandina Berî Hînkirinê (Pêş)

Nirxandina berî hînkirinê (pêş), ew nirxandina berfireh e ku dê were kirin bi armanca diyarkirina wê yekê ka kes berî destpêkirina hînkirina têkildarî armanc û tevgerên armanckirî yê di encama nirxandina qerase de ji bo BPK'ya wî hatine hilbijartin, di kîjan pêlekane (astê) de ye. Di nirxandinê berî hînkirinê de ji bo her kesekî sepandinê yek bi yek tên meşandin û dane tên berhevkirin. Di vê qonaxê de dikarin Testa li gorî Pîvanê (ÖBT), (bnr. forma mînak Pêvek 1), Lîsteya Kontrolê ya ku şiyane bo pêlekane biçûk hatine dabeşkirin tê de hene (bnr. forma mînak Pêvek 2), Mifteya Nirxdana Pileyî (bnr. forma mînak Pêvek 3) bên bikaranîn. Divê daneyên ji amûrên pîvandî yê hatine bikaranîn tên bidestxistin di Forma Tomarkirina Performansê de bên tomarkirin (Pêvek 4).

3. Nirxandina Dawiya Hînkirinê (Paş) û Şopandina Pêşketinê

Nirxandina dawiya hînkirinê; ew nirxandin e ku piştî ku hînkirina tevgerên armanckirî yê têkildar temam dibe, bi armanca dîtina wê yekê tê kirin ka kes tevger bi çî astê bi dest xistiye an fam kiriye. Di vê qonaxê de divê amûrên nirxandina berfireh ên berî hînkirinê bên bikaranîn. Divê daneyên ji amûrên pîvandî di dawiya hînkirinê de tên bidestxistin dîsa di Forma Tomarkirina Performansê de (Pêvek 4) bên nîşankirin. Ji bo bibandorî û berhemdariya hînkirinê girîng e ku di pêvajoya hînkirinê ya kesan de, ango dema hewl tê dan tevgerên armanckirî yê têkildar bên dayîn, sepandinê pîvandî û nirxandinê jî digel hînkirinê bi hev re bên meşandin. Ji ber vê yekê divê berbi şopandina pêşketina kes ve di dema hînkirinê de û di dawiya rûniştina de nirxandin bên kirin û encamên nirxandinê di grafîk an tabloyên tomarkirinê de bên tomarkirin. Herwiha divê bi nêrîna li berhemên kes pêşketina kes were şopandin û ger bertekên hevîkirî ne di asta xwestî de bin, divê di rêbaza tê bikaranîn, di amûr û gerekên, di derdorê, di hejmara temrînan û hwd. de rêxistinê hînkirinê yê pêwîst bên kirin. Herwiha divê tabloyên tomarkirinê, grafîk, berhemên kes (pelên xebatê, erk û hwd.) di nav demsalê de bi navberên diyar bên lêkolînkirin û bibandorî û berhemdariya hînkirinê were nirxandin. Di encama vê yekê de divê portfoliyoya kes were avakirin. Portfolyo dosyayeke pêşketina kesane ye. Cureyekî nirxandinê ye ku di dirêjahiya salekê de tomarên performansê û xebatên kes di ber armancekê de bi awayekî plankirî û birêkûpêk tên girtin, mînakên ji xebatan tê de hene û bi hêsanî tê şopandin ka kes

di çî pêşketinê de ye. Armanca bingeîn a nirxandina bi portfolyoyan, ew e ku bi nirxandina pêvajoyê û encama fêrbûna kes bi hev re, were diyarkirin ka kes çî pêşketinekê dişopîne. Dosyayên pêşketina kesane yê ku di encama berhevkirina sistematîk a xebatên kes hatine avakirin, derfetê didin nirxandina tevahî ya şîyanên cuda û astên kes, aliyên wî yê xurt, serkeftinên wî û pêşketina wî ya di nav pêvajoyekê de. Li gorî armancên ku em ê di pêvajoya perwerde û hînkirinê de bisepînin portfolyo cuda dibin. Cureyên portfolyoyê; dikarin wek portfolyoya xebatê, portfolyoya vitrinê û portfolyoya nirxandinê bîn polînkirin. Ji van, portfolyoya nirxandinê hemû tomarên ku mamoste ji bo nirxandina kes hewcedariya wî pê heye dihevin. Ev cure portfolyo, pêşketina kes di ber armancên di bernameyên hînkirinê de hatine diyarkirin nîşan didin. Di van cure portfolyoyan de armanc ew e ku her xebateke tê danîn nav dosyayê were nirxandin û serkeftina kes were nirxandin. Ev portfolyo, dikarin ji bo nirxandina berbi diyarkirina astê ve bîn bikaranîn û mînak û xebatên herî baş dihevin ku nîşan didin piraniya armanc û tevgerên di bernameya hînkirinê de hatine bidestxistin. Ji ber vê yekê girîng e ku di nav portfolyoyan de berhemên ku li ser pêşketin û aliyên herî xurt ên kesan hûr bûne bîn danîn û şîroveyên kes û mamoste der barê berhemên de bîn nivîsandin.

Di vê çarçoveyê de divê portfolyoyên kesan; grafikên di pêvajoya nirxandinê de hatine bidestxistin, formên tomarkirinê, vîdyo, tomarên deng û berhemên ku şîyanên cuda yê ku kes tê de herî xurt e nîşan didin bihevin. Di sepandinên portfolyoyê de; girtina berhemên kes, bernameya perwerdehiyê ya kesane, Forma Kurte ya Şopandina Pêşketina BPK'ê (Pêvek 5), mînakên amûra pîvandî, formên tomarkirina performansê, tabloyên tomarkirinê û mînakên vîdyo û tomara dengê ku xebatên kes nîşan didin, dê derfetê bide şopandina çêtir a pêvajoyê. Di nirxandina van cure portfolyoyan de nêzîkatiyeke tevahîgir (holîstîk) tê pejirandin. Divê di mijara parvekirina portfolyoyan de bala mirov li ser prensîbên etîk be, portfolyo bi kes an saziyên ji bilî malbata kes, mamosteyê wî û NRL'ê re neyên parvekirin.

4. Nirxandina Dawiya Salê

Pêlekane ku dê di vê nirxandinê de bîn şopandin li jêr hatine diyarkirin: a) Hemû nîşandekên performansê kes (berhemên kes, temaşekirinên mamoste, hevpeyvîn, tabloyên tomarkirinê, grafik, Forma Tomarkirina Performansê ya ku performansê kes di beşek an modulekê de nîşan dide) bi nêrîneke tevahîgir tî lîkolînkirin. b) Di encama vê lîkolînê de performansê kesan derbasî Forma Kurte ya Şopandina Pêşketina BPK'ê (Pêvek 5) dibe. c) Naveroka portfolyoyê tê temamkirin. d) Lîsteya Kontrolê ya Portfolyoyê (Pêvek 6) ku naveroka portfolyoyê nîşan dide tê tijîkirin. e) Mifteya Nirxdana Pileyî ya Portfolyoyê (Pêvek 7) digel dosyaya kes ji NRL'ê re tê şandin. Divê dosyaya portfolyoyê ji sê beşan pêk were. Divê di her beşê de belgeyên jêrîn hebin. Beşa Yekem: Lîsteya Kontrolê ya Portfolyoyê, Mifteya Nirxdana Pileyî ya Portfolyoyê (her du jî du heb dê bîn danîn, yek dê ji aliyê navenda perwerdeya taybet û rehabilitasyonê ve were tijîkirin, ya din dê vala were hiştin û li NRL'ê were tijîkirin.), BPK, Forma Kurte ya Şopandina Pêşketina BPK'ê (2 heb dê bîn danîn, bi awayekî ku yek li NRL'ê bimîne), Formên Tomarkirina Performansê yê ku nirxandina pêş û nirxandina paş ji aliyê mamosteyan ve tê de hatine tomakirin Beşa Duyem: Mînakên amûrên pîvandî yê hatine bikaranîn, mînakên formên tomarkirinê yê di şopandina pêşketinê de hatine bikaranîn û mînakên grafikan, mînakên tomara deng û vîdyoyê yê ku performansê kes nîşan didin Beşa Sêyem: Divê xebatên ku kes di pêvajoya hînkirinê de kirine; mînakên erkan, mînakên pelên xebatê, mînakên vîdyo û tomara dengê yê ku xebatên kes nîşan didin û hwd. cih bigirin.

Nirxandina Dawiya Salê ya NRL'ê

Pêvajoya şopandinê ya NRL'ê; bi nirxandina pêşketina kes di çarçoveya armanc û tevgerên armanckirî yê di BPK'ê de hatine pênasekirin û bi lîkolînkirina zanîn û daneyên di portfolyoya wî de

hatine pêşkêşkirin tê pêkanîn. Pêlekane ku dê di nîrxandina NRL'ê de bîn şopandin li jêr hatine diyarkirin: a) Bi lêkolînkirina portfolyoya kes tê kontrolkirin ka dokumanên di Lîsteya Kontrolê ya Portfolyoyê de hatine diyarkirin hene an na. Ev form tê tijîkirin û ji bo arşîvkirinê tê wergirtin. b) BPK ya kes, Forma Kurte ya Şopandina Pêşketina BPK'ê, tabloyên tomarkirinê û grafîkên ku performans kes nîşan didin tîne lêkolînkirin. c) Performansa kes tê nîrxandin. d) BPK ya kes, tabloyên tomarkirinê, grafîk û ger hebin tomarên vîdyo û dengê yê ku performans kes nîşan didin tîne lêkolînkirin û Mifteya Nirxdana Pileyî ya Portfolyoyê (Pêvek 7) ku bi du kopyan di dosyayê de heye tê tijîkirin. e) Ravekirinên tîkildarî aliyên xurt ên portfolyoyê û yê ku divê bîn pêşxistin tîne nivîsandin. Bi awayekî tê rêxistin ku yek li navenda perwerdeya taybet û rehabilitasyonê û ya din jî li NRL'ê bimîne. f) Di encama nîrxandin û lêkolînê hatine kirin de li gorî pêşketina kes perwerde ji nû ve tê plansazkirin. NRL, kopyayeke Forma Kurte ya Şopandina Pêşketina BPK'ê, Mifteya Nirxdana Pileyî ya Portfolyoyê û Lîsteya Kontrolê ya Portfolyoyê ya di portfolyoya kes de digire û arşîv dike.

Amûrên Pîvandîne û Formên Tomarkirinê di Çarçoveya Bernameya Perwerdeya Piştigirî ji bo Kesên bi Kêmasiya Dîtîne de

Amûrên pîvandîne yê ku li jêr cih digirin dikarin bi armanca nîrxandina performans kes bîn bikaranîn. Amûrên Pîvandîne Bi armanca diyarkirina performans kes berî hînkirinê, di dema wê de û di dawiya wê de tîne bikaranîn. Formên Hevpeyvînê: Bi taybetî amûrên pîvandîne yê nîv-avakirî ne ku di pêvajoya nîrxandina qerase de di hevpeyvînê bi malbatan, bi mamosteyên kes ên li dibistanê û bi wî bi xwe re tîne kirin de tîne bikaranîn. Formên Temaşekirinê: Amûrên pîvandîne ne ku di nîrxandina qerase, nîrxandina pêş, nîrxandina di pêvajoya hînkirinê de û di nîrxandina paş de jî di pêvajoya temaşekirina kesan a yek bi yek de tîne bikaranîn. Formên temaşekirinê bêtir formên nîv-avakirî ne.

Testa li gorî Pîvanê (ÖBT): Amûra pîvandîne ye ku bi rêya temaşekirina rasterast tê bikaranîn bi armanca diyarkirina wê yekê ka kes xwedî taybetmendiya berî hatine diyarkirin in an na û divê ji kesan re di kîjan mijaran de hînkirin were kirin. ÖBT; li gorî armanc û tevgerên armanckirî yê di bernameya hînkirinê de tîne amadekirin. Nîşan dide ka dê ji ku ve dest bi hînkirinê were kirin û der barê wê yekê de zanîne peyda dike ka kes di dema hînkirinê de pêşketin tomar kiriye an na û piştî hînkirinê armanc pêk hatine an na. Di ÖBT'ê de, performans kes bi piranî bi pîvanekê ya berî hatiye diyarkirin re tîne berhevdan. ÖBT test in ku ji aliyê mamoste ve tîne çêkirin û armancên hînkirinê diyartir û taybetir dîkin. Sînorên naveroka hînkirinê xêz dîkin. Lîsteya Kontrolê: Amûra pîvandîne ye ku di pêvajoyên cûrbecûr de bêtir di dema temaşekirina tevgerên armanckirî yê kesan de tîne bikaranîn û bertekên du kategoriyî tîne de tîne nîşankirin, bi awayekî ku dema kes tevgerekê dike (+), dema nake (-) be. Mifteya Nirxdana Pileyî (Rubric): Ew amûr in ku bi armanca pîvandina performans kes di ber armancekê diyar de, pîvanên cûrbecûr û asta performans tîkildarî her pîvanekê tîne de tîne pênasekirin. Ev amûr pêwîst dîkin ku berî were diyarkirin ka dê di kîjan rewşê de kîjan nîrx were dayîn. Du cure mifteyên nîrxandê hene, wek analîtîk û tevahîgir. Mifteyên nîrxandê yê tevahîgir ji bo gihîştina diwaneke giştî der barê performans kes de, mifteyên nîrxandê yê analîtîk jî di nîrxandina performansê ya bi awayekî berfireh de tîne bikaranîn. Pîvana Pileyî: Pîvanên pileyî ew amûrên pîvandîne ne ku performans tîkildarî taybetmendiya tîne pîvandîne bi astên wê yê cûrbecûr pênase dîkin û nîşan didin ka pîvan heta çî astê derfetê peyda dîkin. Pîvanên pileyî du form hene. Yek ji van pîvanên helwestê ne ku kategoriyên bertekê yê wek “bi tevahî beşdar dibim”, “beşdar dibim” dihewînin. Ya din jî pîvanên pilekirina performansê ne ku derfetê didin nîrxderan ku performans kes li gorî pîvanekê diyar wek “lawaz”, “navîn”, “baş”, “pir baş” polîn bikin. Mifteya Nirxdana Pileyî ya Portfolyoyê: Bi armanca lêkolînkirina têrbûna portfolyoya kes li NRL'ê û pêşkêşkirina rêberiyê ji navenda perwerdeya taybet û rehabilitasyonê re hatiye pêşxistin.

Formên Tomarkirinê Forma Tomarkirina Performansê: Formek e ku encamên nîrxandina pêş û paş ên her tevgerêke armanckirî tê de tên nîşankirin. Der barê rewşa pêkanîna armanc û tevgerên armanckirî yên kes ên di beşa têkildar de zanînê dide. Lîsteya Kontrolê ya Portfolyoyê: Lîsteyeke kontrolê ye ku naveroka portfolyoyê nîşan dide. BPK: Bernameya perwerdehiyê ya taybet bi kes e ku hewcedarî, armanc û tevgerên armanckirî yên kes di hewînê.

Forma Kurte ya Şopandina Pêşketina BPK'ê: Di vê formê de stûnên jimarên tevgerên armanckirî yên ku kes li gorî encama nîrxandina pêş pêk anîne, jimarên tevgerên armanckirî yên ku hînkirina wan hatiye armanckirin, tevgerên armanckirî yên hatine xebitîn, tevgerên armanckirî yên ku hatine armanckirin lê nehatine gihîştin, sedema negihîştinê û pêşniyar hene. Divê di stûna "tevgerên armanckirî yên hatine xebitîn" de cih ji jimarên tevgerên armanckirî yên di nav demsalê de hatine hînkirin re, di stûna "tevgerên armanckirî yên hatine armanckirin lê nehatine gihîştin" de ji jimarên tevgerên armanckirî yên nehatine hînkirin re, di stûna "sedema negihîştinê" de ji ravekirinên berfireh ên wek tênebûna demê, tênebûna amûran, neçûyîn re, di stûna "pêşniyar" de jî ji pêşniyaran ji bo her beşê re (guncawbûna beşê ji bo kes, guncawbûna tevgerên armanckirî ji bo kes, ji nû ve xebitîna tevgerên armanckirî yên nehatine gihîştin û hwd.) were dayîn.

5. Xalên ku dê di Sepandina Bernameya Perwerdeya Piştgirî ji bo Kesên bi Kêmasiya Dîtinê de Bala Mirov bikişînin

Bernameya Perwerdeya Piştgirî ji bo Kesên bi Kêmasiya Dîtinê, wek li jorê pênaseyên wan hatine dayîn, ji bo kesên kor (nabînin) û kêmdîtin hatiye avakirin. Ji ber vê yekê tevgerên armanckirî yên hin modulan ên wek xwendin-nivîsandin û matematîkê ji bo kesên kor û kêmdîtin cuda cuda hatine nivîsandin. Modula dîtina fonksiyonel jî tenê ji bo kesên kêmdîtin hatiye rêxistin. Di vê çarçoveyê de divê bi berçavgirtina teşhîsê perwerdehiyê yên kesên bi kêmasiya dîtînê modul bîrê sepandin. Kesên ku li gorî pênaseya hiqûqî wek kor tên teşhîskirin, gava cudahiyan wan ên kesane jî bîrê berçavgirtin, carinan dibe ku bermayiya dîtînê ya heya bi awayekî fonksiyonel bi kar bînin. Ji bo van kesan divê tevgerên armanckirî yên modulan ên ku li gorî kesên kêmdîtin hatine amadekirin bîrê bikaranîn. Bernameya Perwerdeya Piştgirî ji bo Kesên bi Kêmasiya Dîtinê, ji bo bicihanîna wan hewcedariyan, piştgirîkirina pêşketina wan û zêdekirina serbixwebûna kesên bi kêmasiya dîtînê yên her temenî ku ji dayikbûnê ve hewcedariya wan heye hatiye pêşxistin. Di destpêka her modulekê de ravekirineke giştî ya têkildarî modulê, rêbazên hînkirinê yên dê bîrê bikaranîn, rêbaza pîvandîna û/an materyal hatine nivîsandin. Ravekirinên têkildarî armanc an tevgerên armanckirî jî di nav modulan de hatine dayîn. Ji ber ku ji bo kesên kor û kêmdîtin sepandin an adaptekirinên cuda cih digirin, divê bala mirov li ser ravekirinan be. Her çend modulên di Bernameya Perwerdeya Piştgirî ji bo Kesên bi Kêmasiya Dîtinê de cih digirin bi rêzeke diyar tên pêşkêşkirin jî, ne pêşmerca hev in. Li gorî hewcedariyên kesan dikare di heman demê de zêdetir yek modul têkevin nav bernameyê.

Modula tevgera serbixwe ne tenê ji bo kesên kor (nabînin), lê belê di heman demê de ji bo kesên kêmdîtin jî hatiye amadekirin. Kesên kêmdîtin her çend bi dîtînê dilivin jî, girêdayî guherbarên wek ronahî, derdor û hwd. dibe ku rewş hebin ku nikaribin ji dîtina xwe sûd werbigirin. Ji ber vê yekê divê beşên ku hewcedariya wan pê heye yên modula tevgera serbixwe ji kesên kêmdîtin re jî bîrê dayîn. Divê Bernameya Perwerdeya Piştgirî ji bo Kesên bi Kêmasiya Dîtinê bi berçavgirtina taybetmendiyên sosyocandî û baweriyên kesan û malbatên wan, tenduristî, ewlehî û nepenîtiya kesan were sepandin. Perwerdeya piştgirî dikare di navbera her temenî (0-99) de were dayîn.

1. Navê Modulê	ŞIYANÊN KOGNÎTÎF
1. Armanca Modulê	Di vê modulê de tê armanckirin ku kesên bi kêmasiya dîtînê şiyanên kognîtîf ên ku divê di dema beriya dibistanê de xwedî wan bin bi dest bixin.

1. Beşên Modulê	Têgihiştina Bihîstinî û Bîr, Têgihiştina Dîtinî û Bîr, Têgihiştina Taktîl û Bîr, Şiyanên Kognîtîf ên Zû, Amadebûn ji bo Fêrbûnê Ravekirinên Giştî yê Têkildarî Modulê Ev modul ji bo xwendekarên bi kêmasiya dîtinê (kêmdîtin/kor) yê koma temenê 0-6 salî ya beriya dibistanê hatiye amadekirin. Lê belê di dema dibistanê de
------------------------	--

Ravekirinên Giştî yê Têkildarî Modulê

- Ev modul ji bo xwendekarên bi kêmasiya dîtinê (kêmdîtin/kor) yê koma temenê 0-6 salî ya beriya dibistanê hatiye amadekirin. Lê belê divê ev modul ji xwendekarên ku di dema dibistanê de ne (piştî temenê 7 salî) û xwedî şiyanên di modulê de nînin re jî were dayîn. Beşa têgihiştina dîtinî û bîrê, divê ji xwendekarên kêmdîtin re were dayîn. Beşa têgihiştina taktîl û bîrê, divê ji xwendekarên ku nikarin hesta dîtinê bi kar bînin re were dayîn. Pirtûkên pirhestî, tiştî û taktîl ên ku di tevgerên armanckirî de bikaranîna wan hatiye pêşniyarkirin, bi taybetî ji bo xwendekarên kor tên amadekirin. Pirtûkên pirhestî; ji herî zêde 6-7 rûpelan pêk tên û di her rûpelê wan de hevokeke kurt a bi Braille hatiye nivîsandin û tiştek an parçeyeke tiştekî heye ku dikare wê hevokê taktîl/bihîstinî bike. Divê pirtûk bi awayekî têkiliyî bi xwendekar re were xwendin. Pirtûkên tiştî; ew pirtûk in ku di her rûpelê de tiştek û peyvek/hevokeke kurt a bi Braille hatiye nivîsandin heye. Bêtir li dora temayekê (cilên zivistanê, materyalên polê û hwd.) tên avakirin Pirtûkên taktîl; di her rûpelê pirtûkên taktîl de wêneyên taktîl cih digirin ku guncaw in bi hêmana girîng a tê vegotin re û bi destlêdanê tên hîskirin. Cudahiya wan a ji pirtûkên pirhestî ew e ku tenê ji hesta destlêdanê re dibêjin. Cudahiya wan a ji pirtûkên tiştî jî ew e ku di rûpelên pirtûkê de li şûna tiştî, wêneyên taktîl hene û li bin wan li şûna peyveke tenê an hevokekê, nivîseke herî kêr bi qasî paragrafekê cih digire.
- Armanç Ravekirin Tevgerên Armanckirî

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 1.1. Têgihiştina Bihîstinî û Bîr	1.1.1. Ji dengên dibihîze re bertek dide.	1.1.1.1. Ji dengên dibihîze re berteka ne-devkî dide. 1.1.1.2. Ji dengên dibihîze re berteka devkî/ bi deng dide.	Bertekên di tevgera armanckirî ya 1.1.1.1. de; dikarin guh badan, bêdengbûn, rawestandina karê tê kirin û hwd. bin. Bi taybetî dibe ku kesên kor tevgera zivirandina rûyê xwe berbi dengê ve an berêkirinê nekin.
Beş 1.1. Têgihiştina Bihîstinî û Bîr	1.1.2. Dengan ji hev cuda dike.	1.1.2.1. Tonên dengî ji hev cuda dike. 1.1.2.2. Ji çavkaniya dengê ku ji her aliyekî tê re bertek dide. 1.1.2.3. Çavkaniya dengê dibêje. 1.1.2.4. Taybetmendiyên çavkaniya dengê dibêje. 1.1.2.5. Ji nav 3-4 dengan dengê cuda ji hev derdixe.	Di tevgera armanckirî ya 1.1.2.1. de tonên dengî yên ku hilû, pesin, rehetkirinê dihevin ji hev cuda dike. Ji bo tevgera armanckirî ya 1.1.2.1. dikarin tonên dengî yên cuda yên wek dengê bayê, dengê makîneya fêrê, dengê tirimbêlê bîn bikaranînin. Tevgera armanckirî ya 1.1.2.2. xebatên ji hev cudaker dihevin der barê wê yekê de ka çavkaniya dengê solo ye an dengê pirjimar e, hişkbûna/nembûna madeya materyala ku deng derdixe, û cureyê madeya materyalê (metal, dar û hwd.). Ji bo tevgera armanckirî ya 1.1.2.2. divê were hêvîkirin ku kes berbi çavkaniya dengê ku ji her aliyekî tê ve binêre, bilive an dirêj bibe. Ji bo tevgera armanckirî ya 1.1.2.3. divê yek ji dengên tîn guhdarîkirin aidî çavkaniyeke ji dengên din cuda be (dengê baranê, dengê bayê, dengê wesayîtê). Ji bo tevgera armanckirî ya 1.1.2.4. divê yek ji du dengên tîn guhdarîkirin di fona paş de, ya din jî dengê serdest be. Mesele ji bo ambulansa ku di baranê de diçe, dengê baranê dengê fona paş e û ambulans dengê serdest e.
Beş 1.1. Têgihiştina Bihîstinî û Bîr	1.1.3. Hejmar, peyv û hevokên ku guhdarî kiriye dibêje.	1.1.3.1. Peyvên ku guhdarî kiriye bi rêzê dubare dike. 1.1.3.2. Hejmarên ku guhdarî kiriye bi rêzê dubare dike. 1.1.3.3. Hevokên ku guhdarî kiriye bi rêzê dubare dike.	Di tevgerên armanckirî yên 1.1.3.1., 1.1.3.2. û 1.1.3.3. de bi peyvek/hejmarek/ hevokekê tê destpêkirin û divê li gorî taybetmendiyên kognîtîf ên kes hejmara wan were zêdekirin.
Beş 1.1. Têgihiştina Bihîstinî û Bîr	1.1.4. Cudahiyên di komên peyvan de dibêje.	1.1.4.1. Peyva zêde hatiye gotin a di komên peyvan de dibêje. 1.1.4.2. Peyva kêr hatiye hiştin a di komên peyvan de dibêje. 1.1.4.3. Dema peyveke ku di nav komên peyvan de hatiye dubarekirin dibihîze berteka devkî dide.	Ji bo tevgera armanckirî ya 1.1.4.1. mamoste komeke peyvan a diyar dibêje (kiraz-armut-kavun), paşê bi zêdekirina peyvekê koma peyvan dubare dike (kiraz-armut-elma-kavun), ji kes dixwaze ku peyva zêde ya di koma peyvan a dawî gotiye de bibêje. Ji bo tevgera armanckirî ya 1.1.4.2. mamoste hêvî dike ku peyva nehatiye gotin (kêr) a di koma peyvan de bibêje. Mînak: “kiraz-armut-vîşne-elma”, “kiraz-vîşne-elma” û hwd. Ji bo tevgera armanckirî ya 1.1.4.3. ji kes tê xwestin ku peyvên di komên peyvan de zêdetirî carekê hatine gotin bibîne. Mînak: “kalem-silgi-defter-silgi” û hwd.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 1.1. Têgihiştina Bihîstinî û Bîr	1.1.5. Peyvan li gorî taybetmendiyên wan ên fonolojîk ji hev cuda dike.	1.1.5.1. Ji peyvan, peyvên ku bi heman dengî dest pê dikin dibêje. 1.1.5.2. Ji peyvan, peyva ku bi dengêkî cuda diqede dibêje. 1.1.5.3. Bi avêtina dengê pêşîn ê peyvê, ya dimîne dibêje. 1.1.5.4. Bi avêtina dengê dawî yê peyvê, ya dimîne dibêje. 1.1.5.5. Bi avêtina dengê navîn ê peyvê, ya dimîne dibêje. 1.1.5.6. Dengê ku di peyvan de hevşêwe ye dibêje. 1.1.5.7. Di nav peyvên tên gotin de dengê tê xwestin dibêje. 1.1.5.8. Peyva nû ya ku bi guhertina dengê pêşîn an dawî yê peyvê ava kiriye dibêje. 1.1.5.9. Bi berhevanîna peyvên qafiyedar dibêje. 1.1.5.10. Peyvê bi dabeşkirina li dengên wê dibêje. 1.1.5.11. Dibêje ka kîjan ji cotên peyvan gotina rast a peyvê ye. 1.1.5.12. Peyvê ji paş ve dibêje.	Li jêr ji bo van tevgerên armanckirî mînak hatine dayîn. Ji bo tevgera armanckirî ya 1.1.5.1. “taş, tarak, kat” û hwd. Ji bo tevgera armanckirî ya 1.1.5.2. “mat, yat, kapı” û hwd. Ji bo tevgera armanckirî ya 1.1.5.3. “silgi-ilgi, kova-ova” û hwd. Ji bo tevgera armanckirî ya 1.1.5.4. “balon-balo, maça-maç” û hwd. Ji bo tevgera armanckirî ya 1.1.5.5. “kapla-kala” û hwd. Ji bo tevgera armanckirî ya 1.1.5.6. “saç-güç” û hwd. Ji bo tevgera armanckirî ya 1.1.5.7. “u” “muz, yaz, kış” û hwd. Ji bo tevgera armanckirî ya 1.1.5.8. “kere-tere-bere” û hwd. Ji bo tevgera armanckirî ya 1.1.5.9. “maç, taç, saç” û hwd. Ji bo tevgera armanckirî ya 1.1.5.11. “çabuk-çapuk” û hwd. Ji bo tevgera armanckirî ya 1.1.5.12. “para-arap” û hwd.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 1.2. Têgihiştina Dîtinî û Bîr	1.2.1. Ji handekerên dîtinî re bertek dide.	1.2.1.1. Ronahiyê ferq dike. 1.2.1.2. Li hember tiştên ku bi lez nêzîkî çavên wî dibin çavên xwe dilivîne. 1.2.1.3. Ji kesên nas û nenas re bertek dide. 1.2.1.4. Ji tiştên rengîn re bertek dide. 1.2.1.5. Handekerên tevgerî dişopîne. 1.2.1.6. Tiştên ku dikevin erdê bi nêrînê digere.	Ji bo tevgera armanckirî ya 1.2.1.1. divê dema ronahiya odayê vekirî û girtî be li bertekên kes were nêrîn. Ji bo tevgera armanckirî ya 1.2.1.3. divê bertekên wek kenîyîn ji kesên nas re, nêrîna bi hûrbûna li rûyê kesên nenas, dûrketin û hwd. bîn temaşekirin.
Beş 1.2. Têgihiştina Dîtinî û Bîr	1.2.2. Ji handekerên dîtinî re bertekên motorî dide.	1.2.2.1. Berbi tiştên li pêşîya wî ve dirêj dibe/hewl dide dirêj bibe. 1.2.2.2. Tiştên tevgerî digire/hewl dide bigire. 1.2.2.3. Tiştên digire destê xwe bi nêrînê lêkolîn dike.	Ji bo tevgerên armanckirî yên di armanca 1.2.2. de divê mirov piştrast be ku kes bi nêrînê bertek dide.
Beş 1.2. Têgihiştina Dîtinî û Bîr	1.2.3. Ji dîtbaran re bertek dide.	1.2.3.1. Li wêne/fotografan dinêre. 1.2.3.2. Kes an tiştên ku di wêne/fotografan de nas dike etîket dike.	Peyva etîket dike ya di tevgera armanckirî ya 1.2.3.2. de; gotina navê tiştî ji aliyê kes ve an nîşandana tiştî di hewînê.
Beş 1.2. Têgihiştina Dîtinî û Bîr	1.2.4. Ji nav tiştên cuda tiştên ku heman reng û mezinahî ne hevber dike.	1.2.4.1. Tiştên ku heman reng in hevber dike. 1.2.4.2. Tiştên ku heman mezinahî ne hevber dike.	
Beş 1.2. Têgihiştina Dîtinî û Bîr	1.2.5. Ji nav wêneyên tiştên cuda û wêneyên tiştên nîv-abstrakt yên ku heman reng û mezinahî ne hevber dike.	1.2.5.1. Wêneyê tiştî yê ku heman reng e hevber dike. 1.2.5.2. Wêneyê tiştî yê ku heman mezinahî ye hevber dike. 1.2.5.3. Wêneyê nîv-abstrakt ê ku heman e hevber dike.	Wêneyên nîv-abstrakt ên di tevgera armanckirî ya 1.2.5.3. de, wêneyên xêz/xêzkirinê di hewînê.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 1.2. Têgihiştina Dîtinî û Bîr	1.2.6. Wêneyên tiştan û wêneyên tiştên nîv-abstrakt li gorî cih û hûrgiliyên wan hevber dike.	1.2.6.1. Wêneyê tiştî yê ku di heman cihê de ye hevber dike. 1.2.6.2. Wêneyê tiştî yê ku heman hûrgiliya wî heye hevber dike. 1.2.6.3. Wêneyê tiştî yê ku heman hûrgiliya wî kêr e hevber dike. 1.2.6.4. Wêneyê tiştî yê ku hûrgiliya wî di heman cihê de ye hevber dike. 1.2.6.5. Wêneyê nîv-abstrakt ê ku xwedî heman hûrgiliyê ye hevber dike. 1.2.6.6. Wêneyê nîv-abstrakt ê ku heman hûrgiliya wî kêr e hevber dike. 1.2.6.7. Wêneyê nîv-abstrakt ê ku di heman cihê de ye hevber dike. 1.2.6.8. Wêneyê nîv-abstrakt ê ku hûrgiliya wî di heman cihê de ye hevber dike.	
Beş 1.2. Têgihiştina Dîtinî û Bîr	1.2.7. Tiştî bi wêne, xêzkirin û siya wî re hevber dike.	1.2.7.1. Tiştî bi wêneyê wî re hevber dike. 1.2.7.2. Tiştî bi xêzkirina wî re hevber dike. 1.2.7.3. Wêneyê tişt/hebûnê bi siya wê re hevber dike.	
Beş 1.2. Têgihiştina Dîtinî û Bîr	1.2.8. Ji nav tiştan tiştê cuda nîşan dide.	1.2.8.1. Tiştê ku ji cureyekî cuda ye nîşan dide. 1.2.8.2. Tiştê ku bi rengê cuda ye nîşan dide. 1.2.8.3. Tiştê ku bi mezinahiyeke cuda ye nîşan dide.	
Beş 1.2. Têgihiştina Dîtinî û Bîr	1.2.9. Ji nav wêneyên tiştên heman û wêneyên nîv-abstrakt wêneyên cuda nîşan dide.	1.2.9.1. Wêneyê tiştî yê cuda nîşan dide. 1.2.9.2. Wêneyê tiştî yê ku bi rengê cuda ye nîşan dide. 1.2.9.3. Wêneyê tiştî yê ku bi mezinahiyeke cuda ye nîşan dide. 1.2.9.4. Wêneyê nîv-abstrakt ê cuda nîşan dide. 1.2.9.5. Wêneyê nîv-abstrakt ê ku bi rengê cuda ye nîşan dide. 1.2.9.6. Wêneyê nîv-abstrakt ê ku bi mezinahiyeke cuda ye nîşan dide.	
Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 1.2. Têgihiştina Dîtinî û Bîr	1.2.10. Ji nav wêneyên tiştên heman û wêneyên nîv-abstrakt wêneyên ku cih û hûrgiliyên wan cuda ne nîşan dide.	1.2.10.1. Wêneyê tiştî yê ku di cihekî cuda de ye nîşan dide. 1.2.10.2. Wêneyê tiştî yê ku hûrgiliya wî cuda ye nîşan dide. 1.2.10.3. Wêneyê tiştî yê ku hûrgiliyeke wî ya cuda kêr e nîşan dide. 1.2.10.4. Wêneyê tiştî yê ku cihê hûrgiliyeke wî cuda ye nîşan dide.	

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		1.2.10.5. Wêneyê nîv-abstrakt ê ku di cihekî cuda de ye nîşan dide. 1.2.10.6. Wêneyê nîv-abstrakt ê ku hûrgiliya wî cuda de ye nîşan dide. 1.2.10.7. Wêneyê nîv-abstrakt ê ku hûrgiliyeke wî ya cuda kêr e nîşan dide. 1.2.10.8. Wêneyê nîv-abstrakt ê ku cihê hûrgiliyeke wî cuda de ye nîşan dide.	
Beş 1.2. Têgihiştina Dîtinî û Bîr	1.2.11. Tiştên/wêneyên tiştên heman cureyî kom dike.	1.2.11.1. Tiştan li gorî cureyên wan kom dike. 1.2.11.2. Tiştan li gorî rengên wan kom dike. 1.2.11.3. Tiştan li gorî mezinahiyên wan kom dike. 1.2.11.4. Wêneyên tiştan li gorî cureyên wan kom dike. 1.2.11.5. Wêneyên tiştan li gorî rengên wan kom dike. 1.2.11.6. Wêneyên tiştan li gorî mezinahiyên wan kom dike. 1.2.11.7. Wêneyên tiştan li gorî cihên wan kom dike.	
Beş 1.2. Têgihiştina Dîtinî û Bîr	1.2.12. Nexşerêzê didomîne.	1.2.12.1. Li bin nexşerêza hatiye dayîn heman nexşerêzê ava dike. 1.2.12.2. Hêmana ku di nexşerêza hatiye dayîn de kêr hatiye hiştin temam dike. 1.2.12.3. Hêmana ku di nexşerêza hatiye dayîn de zêde ye/hexşerêzê xera dike dibîne. 1.2.12.4. Nexşerêza hatiye dayîn didomîne.	Dema armanca 1.2.12. tê xebitîn, dikare bi nexşerêza cotî ya ku ji du tiştên cuda hatiye avakirin were destpêkirin û bi zêdekirina hejmara tiştan nexşerêzên sêyî û çaryî bîr xebitîn. Piştî ku bi tiştan tê xebitîn, divê bi wêneyên tiştan nexşerêz bîr xebitîn.
Beş 1.2. Têgihiştina Dîtinî û Bîr	1.2.13. Cudahiyên di navbera du wêneyên hatine dayîn de nîşan dide.	1.2.13.1. Cudahiyên di navbera du wêneyên tiştan de nîşan dide. 1.2.13.2. Cudahiyên di navbera du wêneyên bûyeran de nîşan dide.	
Beş 1.2. Têgihiştina Dîtinî û Bîr	1.2.14. Tiştên veşartî û şaşiyên di wêneyê de nîşan dide.	1.2.14.1. Tişt/hebûna ku di wêneyê de tevlihev de veşartî ye nîşan dide. 1.2.14.2. Tiştên ku di xêzkirineke tevlihev de hene nîşan dide. 1.2.14.3. Şaşiyên di wêneyê de nîşan dide.	
Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 1.2. Têgihiştina Dîtinî û Bîr	1.2.15. Di wêneyên tiştan ên aidî parçe û tevahiyê de tîkiliya parçe-tevahî datîne.	1.2.15.1. Parçeya ku di wêneyê de kêr hatiye hiştin dibîne. 1.2.15.2. Tiştê di wêneyê de tiştî ya ku nivê wê tê nîşandan de texmîn dike. 1.2.15.3. Parçeyên aidî wêneyê tiştî yê ku tevahiya wî tê dayîn dibîne.	

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		1.2.15.4. Bi hevgirtina parçeyên wêneyeke tiştî tevahiyê ava dike. 1.2.15.5. Bi hevgirtina parçeyên wêneyeke kirin/bûyerê tevahiyê ava dike.	
Beş 1.2. Têgihiştina Dîtinê û Bîr	1.2.16. Navên tiştan an bûyerên di tişt û wêneyên ku piştî nîşandanê tên girtin an veşartin de dibêje.	1.2.16.1. Piştî ku tiştên li pey hev tên nîşandan tên veşartin/girtin, navên tiştan dibêje. 1.2.16.2. Piştî ku wêneyên tiştan ên li pey hev tên nîşandan tên veşartin/girtin, navên tiştên di wêneyan de hene dibêje. 1.2.16.3. Piştî ku wêneyê ku bûyerên cûrbecûr tê de hene tên nîşandan û tê veşartin/girtin, tişt û bûyerên ku di wêneyê de dîtine dibêje.	Dema armanca 1.2.16. tê xebitîn, divê bi du tiştan were destpêkirin û hejmara tiştan were zêdekirin.

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 1.3. Têgihiştina Taktîl û Bîr	1.3.1. Tiştên ku dest lê dide hevber dike.	1.3.1.1. Ji nav tiştên ku dest lê dide, tiştên ku heman mezinahî ne hevber dike. 1.3.1.2. Ji nav tiştên ku dest lê dide, tiştên ku heman teşe ne hevber dike. 1.3.1.3. Ji nav tiştên ku dest lê dide, tiştên ku heman taybetmendiya rûyî ne hevber dike.	Dema armanca 1.3.1. tê xebitîn, divê bi bikaranîna taybetmendiyan rûyî yên tiştan (hişk-nerm, xişok-nexişok, pirçdar-bêpirç û hwd.), taybetmendiyan mezinahiyê (mezin, biçûk û hwd.) û taybetmendiyan teşeyê (sêgoşe, xelek, çargoşe û hwd.) xebatên hevberkirinê bên kirin.
Beş 1.3. Têgihiştina Taktîl û Bîr	1.3.2. Tiştên ku dest lê dide ji hev cuda dike.	1.3.2.1. Ji nav tiştên bi mezinahiyên cuda yên ku dest lê dide, tiştê bi mezinahiya tê xwestin ji hev derdixe. 1.3.2.2. Ji nav tiştên bi teşeyên cuda yên ku dest lê dide, tiştê bi teşeya tê xwestin ji hev derdixe. 1.3.2.3. Ji nav tiştên bi taybetmendiyan rûyî yên cuda yên ku dest lê dide, tiştê xwedî taybetmendiya rûyî ya tê xwestin ji hev derdixe.	Di bidestxistina armanca 1.3.2. de divê bi sê tiştên ku dudo ji wan heman in were destpêkirin, bi zêdekirina hejmara tiştan xebitîn berdewam bike. Divê bi bikaranîna taybetmendiyan rûyî yên tiştan (hişk-nerm, xişok-nexişok, pirçdar-bêpirç û hwd.), taybetmendiyan mezinahiyê (mezin, biçûk û hwd.) û taybetmendiyan teşeyê (sêgoşe, xelek, çargoşe û hwd.) xebatên ji hev cudakirinê bên kirin.
Beş 1.3. Têgihiştina Taktîl û Bîr	1.3.3. Tiştan li gorî taybetmendiyan wan ên taktîl kom dike.	1.3.3.1. Tiştên ku dest lê dide û heman mezinahî ne kom dike. 1.3.3.2. Tiştên ku dest lê dide û heman teşe ne kom dike. 1.3.3.3. Tiştên ku dest lê dide û heman taybetmendiya rûyî ne kom dike.	
Beş 1.3. Têgihiştina Taktîl û Bîr	1.3.4. Tiştên ku dest lê dide bi rêza tê xwestin dibêje.	1.3.4.1. Tiştên ku dest lê dide ji destpêkê berbi dawiyê ve bi rêza ku dest lê daye dibêje. 1.3.4.2. Tiştên ku dest lê dide ji dawiyê berbi destpêkê ve bi rêzê dibêje.	Di bidestxistina armanca 1.3.4. de divê bi du tiştan were destpêkirin, bi zêdekirina hejmara tiştan xebitîn berdewam bike.
Beş 1.3. Têgihiştina Taktîl û Bîr	1.3.5. Taybetmendî û navê tiştê ku dest lê dide dibêje.	1.3.5.1. Taybetmendiyan tiştên ku dest lê dide dibêje. 1.3.5.2. Navê tiştê ku dest lê dide dibêje.	

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 1.4. Şiyanên Kognîtîf ên Zû	1.4.1. Tişt an kesê ku di derdorê de winda dibe digere.	Kêmdîtîn: 1.4.1.1. Dema tiştê ku bi çavên xwe dişopîne winda dibe, 2-3 saniyeyan li cihê ku tişt winda bûye dinêre. 1.4.1.2. Diyar dike ku tişt an kesên nas dike nas kiriye. 1.4.1.3. Dema kesê nas ji derdorê diçe, li pey wî dinêre. 1.4.1.4. Tiştê ku li ber çavên wî tê veşartin digere. 1.4.1.5. Dema kesê ku di derdorê de nîne tê pirsîn, bi nêrînên xwe wî kesî digere. 1.4.1.6. Dema tiştê ku dixwaze nabîne, tiştî li zêdetirî cihekî digere. Kor: 1.4.1.7. Dema tiştê ku dest lê daye winda dibe, tiştî bi awayekî taktîl digere. 1.4.1.8. Diyar dike ku tişt an kesên nas dike nas kiriye. 1.4.1.9. Dema kesê nas ji derdorê diçe, bertek nîşan dide. 1.4.1.10. Dema tiştê ku dest lê daye tê veşartin, tiştî digere. 1.4.1.11. Dema kesê ku di derdorê de nîne tê pirsîn, diyar dike ku li kes digere. 1.4.1.12. Dema tiştê ku dixwaze nabîne, tiştî li zêdetirî cihekî digere.	Di tevgera armanckirî ya 1.4.1.2. de divê were hêvîkirin ku bi hewldana dirêjbûnê û bi dengderxistinê diyar bike ku tişt/kes nas kiriye. Di tevgera armanckirî ya 1.4.1.8. de, di diyarkirina wê yekê ku kesên kor tişt an kesên nas dikin nas kirine, divê bertekên fizîkî yên kes bi baldarî bîn temaşekirin; divê were nêrîn ka bi tevgerên wek guhertina hilm û berdana wî, berêkirina bi laşê xwe berbi tişt/kes ve, guh badan, keniyîn û hwd. diyar dike an na. Di tevgera armanckirî ya 1.4.1.9. de, di bertek nîşandana wî ya dema kesê nas ji derdorê diçe, divê tevgerên kes ên wek bang li kes kirin, guh badan, hewldana gerînê, girîn û hwd. bi baldarî bîn temaşekirin. Di tevgera armanckirî ya 1.4.1.10. de, ji bo tevgera gerîna kes a li tiştê dema dest lê daye tê veşartin, dibe ku ne tenê bi destê xwe gerîn were hêvîkirin. Hin kesên kor dikarin tiştên winda dibin, dikevin, ji wan dûr dikevin bi lingên xwe jî bigerin.
Beş 1.4. Şiyanên Kognîtîf ên Zû	1.4.2. Têkiliya sedem-encam a di navbera bûyer û kirinan de datîne.	1.4.2.1. Tiştên ku têkiliya sedem-encam heye li gorî fonksiyona wan bi kar tîne. 1.4.2.2. Di navbera kirinên ku li ser tiştan pêk tîne û encamên wan de têkiliyê datîne. 1.4.2.3. Têkiliya sedem-encam a berbi bûyerên jiyana wî ya rojane ve datîne.	Ji bo tevgera armanckirî ya 1.4.2.1. divê bi mînakên wek pêlêkirina miftayê ji bo vêxistina ronahiyê, pêlêkirina bişkokê ji bo xebitandina pêlîstokê were xebitîn. Ji bo tevgera armanckirî ya 1.4.2.2. hewl dide ku mekanîzmaya ku dihele pêlîstokeke burxandî deng derxe bixebitîne. Di tevgera armanckirî ya 1.4.2.3. de divê were hêvîkirin ku di rewşên wek birçîbûn, di baranê de şilbûn, nexweşbûn de ji pirsên wek “Tu çima şil bûyî?” re bersivên wek “Ji ber ku baran barî.” bide.
Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 1.4. Şiyanên Kognîtîf ên Zû	1.4.3. Ji bo diyarkirina eleqe û daxwazên xwe bi mezinî re bala hevpar datîne.	Kêmdîtîn 1.4.3.1. Ji bo parvekirina eleqe an bala xwe, nêrîna xwe di navbera tişt û mezinî de diguherîne. 1.4.3.2. Di derdoreke bideng de guhdariya axaftina kesê ku li ser hûr bûye dike. 1.4.3.3. Ji bo ragihandina daxwazên xwe jistan bi kar tîne. 1.4.3.4. Digel mezinî demeke diyar li pirtûk an wêneyan dinêre. 1.4.3.5. Li tişteki dûr ê ku mezin nîşan dide an îşaret dike dinêre. Kor	Di tevgera armanckirî ya 1.4.3.3. de divê li jêstên wek îşaretkirin, dirêjbûn, nîşandan were nêrîn. Divê neyê jibîrkirin ku jêstên kesên kor jî hene. Kesên kor bi giştî jêstên bi naveroka destlêdanê, jêstên wek berêkirina bi laşê xwe nîşan didin.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		1.4.3.6. Ji bo parvekirina eleqe an bala xwe, bi rêzê dest li tiştê di destê xwe de û li mezinî dide. 1.4.3.7. Di derdoreke bideng de guhdariya axaftina kesê ku li ser hûr bûye dike. 1.4.3.8. Ji bo ragihandina daxwazên xwe jistan bi kar tîne. 1.4.3.9. Digel mezinî demeke diyar pirtûkên pirhestî, pirtûkên tiştî û pirtûkên taktîl lêkolîn dike. 1.4.3.10. Berbi tiştê ku mezin dide dest lê dan ve diçe an jî bala xwe dide dengê ku îşaret dike.	
Beş 1.4. Şiyanên Kognîtîf ên Zû	1.4.4. Peyv, mîmîk, jest, tevger û axaftinan teqlîd dike.	1.4.4.1. Tevger an dengên ku bi xwe dike dubare dike. 1.4.4.2. Tevgerên hêsan ên dest an laşî teqlîd dike. 1.4.4.3. Peyv, mîmîk û jistan teqlîd dike. 1.4.4.4. Tevgerên yek-qonaxî yên ku bi tiştan tên kirin teqlîd dike. 1.4.4.5. Deng/peyv/ hevokên cuda teqlîd dike. 1.4.4.6. Tevger/axaftinên ku berê dîtine piştî demekê teqlîd dike.	Di tevgera armanckirî ya 1.4.4.2. de divê were hêvîkirin ku kesê kor jistên ku bi destlêdana laşê wî tên kirin teqlîd bike. Mesele dikare were hêvîkirin ku lîstika “çûkek danî yekî girt yekî girtiye” ya ku di nav lepê de tê kirin li destê mezinî bike. Di tevgera armanckirî ya 1.4.4.4. de dikare destê kesê kor li ser destê mezinî were girtin û pêl bişkoka vekirin-girtinê ya pêlîstokê were kirin. Paşê dikare were nêrîn ka kes teqlîd dike an na.
Beş 1.4. Şiyanên Kognîtîf ên Zû	1.4.5. Bi tiştî an bêyî tiştî lîstikên cûrbecûr dilîze.	1.4.5.1. Bi tiştan lîstikên ne fonksiyonel dilîze. 1.4.5.2. Lîstikên guncaw bi fonksiyona tiştan re dilîze. 1.4.5.3. Lîstikên sembolîk dilîze.	Di tevgera armanckirî ya 1.4.5.1. de wek mînaka lîstika ne fonksiyonel dikare were hêvîkirin ku tirimbêleke lîstokî bihejîne, lê bide an biavêje. Di tevgera armanckirî ya 1.4.5.2. de wek mînaka lîstika fonksiyonel dikare were hêvîkirin ku firaqên bi mezinahiyên cuda bi ceribandinan têxe hev. Di tevgera armanckirî ya 1.4.5.3. de wek mînaka lîstika sembolîk dikare were hêvîkirin ku wek ku tişteki tune hebe lîstikê bilîze.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 1.5. Amadebûn ji bo Fêrbûnê	1.5.1. Hişmendî bi têkiliyên dîtinî yên di navbera tiştan de peyda dike.	1.5.1.1. Ji nav tiştan ya mezin an biçûk nîşan dide. 1.5.1.2. Ji nav tiştan ya dirêj an kurt nîşan dide. 1.5.1.3. Ji nav tiştan ya stûr an zirav nîşan dide. 1.5.1.4. Tiştan li gorî taybetmendiyên wan ên dîtinî berhev dike.	Di tevgera armanckirî ya 1.5.1.4. de divê were hêvîkirin ku bi kirina berhevdana têkildarî tiştan, tiştê “mezintir/biçûktir/dirêjtir/kurttir/stûrtir/ziravtir” û/an wêneyê wî nîşan bide.
Beş 1.5. Amadebûn ji bo Fêrbûnê	1.5.2. Tiştan li gorî taybetmendiyên wan ên cuda hevber dike.	1.5.2.1. Tiştên ku heman in hevber dike. 1.5.2.2. Tiştan bi wêneyên wan re hevber dike. 1.5.2.3. Teşeyên geometrîk hevber dike. 1.5.2.4. Rengan hevber dike. 1.5.2.5. Dengên heywanan bi wêneyên wan re hevber dike.	Ji bo tevgerên armanckirî yên 1.5.2.1. û 1.5.2.2. divê li gorî asta kognîtîf a kes hejmara tiştan were zêdekirin. Di tevgera armanckirî ya 1.5.2.2. de divê ji bo kesên kor were hêvîkirin ku bi wêneyên taktîl tiştan hevber bike. Divê tevgera armanckirî ya 1.5.2.4. bi kesên kêmdîtin re were xebitîn.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 1.5. Amadebûn ji bo Fêrbûnê	1.5.3. Tiştan li gorî taybetmendiyan wan ên cuda polîn dike.	1.5.3.1. Tiştan li gorî teşeyên wan polîn dike. 1.5.3.2. Tiştan li gorî rengên wan polîn dike. 1.5.3.3. Tiştan li gorî taybetmendiyan wan ên taktîl polîn dike. 1.5.3.4. Tiştan li gorî mezinahiyên wan polîn dike.	Ji bo tevgera armanckirî ya 1.5.3.3. taybetmendiyan taktîl ev in; xîşok-nexîşok, nerm-hîşk û hwd. Ji bo tevgera armanckirî ya 1.5.3.4. divê ji kes were hêvîkirin ku tiştan; wek mezin-biçûk, dirêj-kurt, stûr-zirav û hwd. polîn bike.
Beş 1.5. Amadebûn ji bo Fêrbûnê	1.5.4. Hişmendî bi têkiliyan cihê yê di navbera tiştan de peyda dike.	1.5.4.1. Li gorî cihê tiştan têgehên “li ser/li bin” bi kar tîne. 1.5.4.2. Li gorî cihê tiştan têgehên “li jor/li jêr” bi kar tîne. 1.5.4.3. Li gorî cihê tiştan têgehên “li pêş/li paş” bi kar tîne. 1.5.4.4. Li gorî cihê tiştan têgehên “li rastê/li çepê” bi kar tîne.	
Beş 1.5. Amadebûn ji bo Fêrbûnê	1.5.5. Li gorî taybetmendiyan tiştan nexşerêz ava dike.	1.5.5.1. Bi nêrîn/destlêdana modelê heman nexşerêzeke hêsan çêdike. 1.5.5.2. Nexşerêzê ji cihê ku maye didomîne. 1.5.5.3. Parçeya kêma nexşerêzekê temam dike. 1.5.5.4. Bi awayekî serbixwe nexşerêz ava dike.	Di tevgerên armanckirî yê 1.5.5.2., 1.5.5.3. û 1.5.5.4. de divê bi du tiştan were destpêkirin û hejmara tiştên di nexşerêzê de were zêdekirin.
Beş 1.5. Amadebûn ji bo Fêrbûnê	1.5.6. Hêjmara tiştan texmîn dike.	1.5.6.1. Ji nav komên tiştan koma ku kêma e nîşan dide. 1.5.6.2. Ji nav komên tiştan koma ku zêde ye nîşan dide. 1.5.6.3. Ji nav herî kêma sê komên tiştan koma “herî zêde” nîşan dide. 1.5.6.4. Ji nav herî kêma sê komên tiştan koma “herî kêma” nîşan dide.	Di armanca 1.5.6. de divê bi komên tiştên heman dest bi xebitîna were kirin û bi komên tiştên cuda berdewam bike.
Beş 1.5. Amadebûn ji bo Fêrbûnê	1.5.7. Tiştan li gorî taybetmendiyan wan ên fîzîkî yê ne dîtinî ji hev cuda dike.	1.5.7.1. Ji nav tiştan ya giran nîşan dide. 1.5.7.2. Ji nav tiştan ya sivik nîşan dide. 1.5.7.3. Ji nav herî kêma sê tiştan koma “herî giran” nîşan dide. 1.5.7.4. Ji nav herî kêma sê tiştan koma “herî sivik” nîşan dide. 1.5.7.5. Ji nav tiştan ya hîşk nîşan dide. 1.5.7.6. Ji nav tiştan ya nerm nîşan dide. 1.5.7.7. Ji nav herî kêma sê tiştan koma “herî hîşk” nîşan dide. 1.5.7.8. Ji nav herî kêma sê tiştan koma “herî nerm” nîşan dide.	
Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 1.5. Amadebûn ji bo Fêrbûnê	1.5.8. Şiyanên jimartinê bi kar tîne.	1.5.8.1. Dema jê tê xwestin ku yek an dudo nîşan bide, yek an du tiliyan xwe radike. 1.5.8.2. Bi qasî hêjmara tê xwestin tiştan dide. 1.5.8.3. Bi herî zêde avêtina sê hejmaran ji 1'ê heta 10'ê yek bi yek bi rîtim dijmêre. 1.5.8.4. Tiştên ku herî zêde heta pêncan in yek bi yek	Di tevgerên armanckirî yê 1.5.8.4. û 1.5.8.5. de divê hejmarên tiştan di navbera 3 û 5 de bin.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		dijmêre. 1.5.8.5. Bi nêrîn/destlêdana tiştên ku herî zêde pênc heb in, bêtî jîmartinê texmîn dike ka çend heb in.	
Beş 1.5. Amadebûn ji bo Fêrbûnê	1.5.9. Amûrên pîvandîna yê hêsan ên ne standard bi kar tîne.	1.5.9.1. Hêjmara tiştan bi bikaranîna amûrên ne standard dipîve. 1.5.9.2. Dirêjahiya tiştan bi bikaranîna amûr û teknîkên ne standard dipîve. 1.5.9.3. Giraniya tiştan bi bikaranîna amûr û teknîkên ne standard dipîve. 1.5.9.4. Germahiya tiştan bi bikaranîna amûr û teknîkên ne standard dipîve. 1.5.9.5. Cihên tiştan ên li gorî hev bi bikaranîna amûr û teknîkên ne standard dipîve.	Di tevgera armanckirî ya 1.5.9.1. de divê were hêvîkirin ku wek amûra pîvandîna ya ne standard amûrên "iskan, kevçî, hesk û hwd." bi kar bîne. Di tevgera armanckirî ya 1.5.9.2. de divê were hêvîkirin ku wek amûra pîvandîna ya ne standard amûrên "bost, ling, gav û hwd." bi kar bîne. Di tevgera armanckirî ya 1.5.9.3. de divê were hêvîkirin ku wek amûra pîvandîna ya ne standard amûrên "dest, poşet û hwd." bi kar bîne. Di tevgera armanckirî ya 1.5.9.4. de divê were hêvîkirin ku wek amûra pîvandîna ya ne standard germahiyê "bi destlêdanê" bipîve. Di tevgera armanckirî ya 1.5.9.5. de dikarin beşên laş ên wek "di bilindahiya mîlî de" bên bikaranîn. Herwiha ji bo kesên ku gopalê bi kar tînin divê were hêvîkirin ku gopal jî wek amûra pîvandîna bi kar bînin.
Beş 1.5. Amadebûn ji bo Fêrbûnê	1.5.10. Têgehên têkildarî demê bi kar tîne.	1.5.10.1. Navê perçeyên demê yê cuda yê rojê dibêje. 1.5.10.2. Rojên hefteyê bi rêzê dibêje. 1.5.10.3. Peyvên duh, îro, sibe di konteksta guncaw de bi kar tîne. 1.5.10.4. Rojên dawîya hefteyê û nav hefteyê ji hev cuda dike.	
Beş 1.5. Amadebûn ji bo Fêrbûnê	1.5.11. Der barê xwe û derdora xwe de zanîna dide.	1.5.11.1. Xwe û malbata xwe dide nasîn. 1.5.11.2. Hevşewetî û cudahiya fizîkî yê di navbera kesên de rave dike. 1.5.11.3. Navê dibistan û pola xwe dibêje. 1.5.11.4. Taybetmendiyên fizîkî yê bingehîn ên derdora mal û dibistanê rave dike. 1.5.11.5. Tiştên di derdora mal û dibistanê de vedibêje. 1.5.11.6. Çalakiyên di derdora mal û dibistanê de vedibêje.	
Beş 1.5. Amadebûn ji bo Fêrbûnê	1.5.12. Beşdarî bûyerên rojane dibe.	1.5.12.1. Beşdarî aktivîteyên di nav rojê de tên kirin dibe. 1.5.12.2. Berpirsiyariyên kesane yê ku jê re tên dayîn bi cih tîne. 1.5.12.3. Beşdarî çalakiyên komê dibe. 1.5.12.4. Di çalakiyên komê de berpirsiyariyên hêsan bi cih tîne.	

2. Navê Modulê	ŞIYANÊN ZIMAN Î RAGIHANDINÊ
2. Armanca Modulê	Di vê modulê de tê armanckirin ku kesên bi kêmasiya dîtinê ji şiyane ziman û ragihandinê şiyane dema berî peyvê û dema peyvê bi dest bixin.
2. Beşên Modulê	Dema Berî Peyvê, Dema Peyvê Ravekirinê Giştî yê Têkildarî Modulê

Ravekirinê Giştî yê Têkildarî Modulê

- Kesên bi kêmasiya dîtinê, her çend rewşeke astengiyeke zêde ya wan tunebe jî, ji ber kêmasiya jiyanê û nepeydakirina ezmûna têrê dike, dikarin hin pirsgerêkên ziman û ragihandinê yê wek ekolalî, axaftina dereng, verbalîzmê bijîn. Ev pirsgerêkên ku kesên bi kêmasiya dîtinê nîşan didin dikarin di mezinbûnê de jî berdewam bikin. Bi vê armancê, modula şiyane ziman û ragihandinê ji kesên bi kêmasiya dîtinê re tê pêşniyarkirin.
- Armanca Ravekirinê Têvgerê Armanckirî

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 2.1 Dema Berî Peyvê	2.1.1. Dengê xwe bi armanç bi kar tîne.	2.1.1.1. Dengên cuda derdixe. 2.1.1.2. Bi tonên cuda dengdanan dike. 2.1.1.3. Ji bo peyvên tîn dayîn peyveke cuda berhem tîne. 2.1.1.4. Dengên dişibin dengê tî dayîn derdixe. 2.1.1.5. Bi dengdanê daxwazên xwe îfade dike.	Di tevgera armanckirî ya 2.1.1.1. de derxistina dengên di pêvajoya pêşketinê de yên wek gîgîldan/agûlandinê tî armanckirin. Di bidestxistina tevgera armanckirî ya 2.1.1.5. de, tî armanckirin ku kes bi bikaranîna dengê xwe wek amûra ragihandinê daxwazên xwe bi awayekî bi armanç îfade bike.
Beş 2.1 Dema Berî Peyvê	2.1.2. Ji kesê ku pê re di ragihandinê de ye re bertek dide.	2.1.2.1. Ji dangan re bertek dide. 2.1.2.2. Ji navê xwe re bertek dide. 2.1.2.3. Bala xwe berbi kesê diaxive ve dibe. 2.1.2.4. Bi jest û mîmîkên xwe diyar dike ku guhdariya kesê diaxive dike.	Di bidestxistina tevgera armanckirî ya 2.1.2.1. de, divê rewşa bertekdana ji dengên kesên ku pê re di ragihandinê de ye re were berçavgirtin. Pêşî bertekdana ji dengên kesên nas, paşê ji dengên kesên ne nas re tî armanckirin.
Beş 2.1 Dema Berî Peyvê	2.1.3. Li gorî rêwerzan tevdigere.	2.1.3.1. Rêwerzên ku yek kirinê diyar dikin bi cih tîne. 2.1.3.2. Rêwerzên ku du kirinan diyar dikin bi cih tîne. 2.1.3.3. Rêwerzên ku sê û zêdetir kirinan diyar dikin bi cih tîne.	Ji bo armanca 2.1.3. şiyana pêşmerc pêkhatina destketiya “Ji kesê ku pê re di ragihandinê de ye re bertek dide.” ye.
Beş 2.1 Dema Berî Peyvê	2.1.4. Di ragihandinê de dor digire.	2.1.4.1. Bi dayîna berteka bi deng dor digire. 2.1.4.2. Bi bikaranîna jestê dor digire. 2.1.4.3. Bi bikaranîna peyveke tenê dor digire.	

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 2.1. Dema Berî Peyvê	2.1.5. Bala hevpar datîne.	2.1.5.1. Di dema ragihandina bertekî de eleqeyê bi hêmaneke din a di derdorê de peyda dike. 2.1.5.2. Bi armanca xwestinê bala kesê ku pê re di ragihandinê de ye dikişîne ser hêmanekê. 2.1.5.3. Bi armanca parvekirina eleqeya xwe bala kesê ku pê re di ragihandinê de ye dikişîne ser hêmanekê. 2.1.5.4. Eleqeyê bi hêmaneke ku kesekî din pê re eleqedar dibe peyda dike. 2.1.5.5. Li ser hêmaneke ku kesê pê re di ragihandinê de ye pê re eleqedar dibe hûr dibe. 2.1.5.6. Bi berêkirina bala kesê pê re di ragihandinê de ye ya berbi hêmaneke din ve, bala xwe dibe ser wê hêmanê.	Ji bo armanca 2.1.5. şiyana pêşmerc pêşketina berdewamiya tiştî û têgeha ez e. Ji ber ku di şiyana bala hevpar de dayîna bala xwe ya berbi hêmaneke sêyem ve dibe mijar, pêwîst e ku kes xwe li gorî derdorê û hêmanên di derdorê de li gorî hev bi cih bike, herwiha hişmend be ku di derdorê de ji bîlî wî hebûnên din hene û ew wî nabin. Ji ber vê yekê divê ev armanç bi modula şiyânê kognîtîf re bi hev re were fikirîn. Di dema bidestxistina hemû tevgerên armanckirî yên di armanca 2.1.5. de cih digirin, divê amûra ragihandinê ya ku kes li gorî pêşketin û performansê xwe bi kar tîne (jest, deng, peyv û hwd.) were pejirandin.
Beş 2.1. Dema Berî Peyvê	2.1.6. Tevgerên teqlîdî nîşan dide.	2.1.6.1. Tevgerên zimên teqlîd dike. 2.1.6.2. Tevgerên lêvan teqlîd dike. 2.1.6.3. Dangan teqlîd dike. 2.1.6.4. Kîteyan teqlîd dike. 2.1.6.5. Peyvan teqlîd dike.	Di bidestxistina tevgera armanckirî ya 2.1.6.3. de pêwîst e ku dengên derdorî yên wek dengên heywanan, dengên wesayîtan bî xebitîn.

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 2.1. Dema Berî Peyvê	2.1.7 Bi jestên nîşander xwe îfade dike.	2.1.7.1. Bi destlêdanê tiştî/kesî nîşan dide. 2.1.7.2. Ji dûr ve tiştî/kesî/dengî nîşan dide. 2.1.7.3. Hewl dide bigihîje tiştî/kesî/dengî. 2.1.7.4. Ji bo kişandina balê jestê berhem tîne.	Jest: Ew tevger in ku bi armanca ragihandinê tîn berhemanîn, bi giştî wek bikaranîna tilî, dest û milan tîn zanîn lê taybetmendiya rû (mesele lêv şeqandin ji bo xwarinê) û tevgerên laş jî (mesele bazdan ji bo lîstina hespsiwarîyê) dihevin. Ji ber ku kesên bi kêmasiya dîtinê jistan nabînin an bi sînor dibînin, dikarin di têgihiştin û bikaranîna teşeyên wan de dezavantajê bijîn. Jest li du komên bingehîn tîn dabeşkirin, wek nîşander û temsîlî.
Beş 2.1. Dema Berî Peyvê	2.1.8. Bi jestên temsîlî xwe îfade dike.	2.1.8.1. Bi bikaranîna tiştî peyama ku dixwaze bigihîne sembolîze dike. 2.1.8.2. Bêyî bikaranîna tiştî peyama ku dixwaze bigihîne sembolîze dike. 2.1.8.3. Çepikan lê dide. 2.1.8.4. Pêncan lê dide. 2.1.8.5. “Bay bay” dike. 2.1.8.6. Bi destê xwe “were” dike. 2.1.8.7. Bi tiliya xwe “bêdeng be” dike. 2.1.8.8. Bi wateya na serê xwe berbi rast û çepê ve dihejîne. 2.1.8.9. Bi wateya “erê” serê xwe berbi pêş û paş ve diilivîne.	Jestên temsîlî yên ku di armanca 2.1.8. de tîn îfadekirin, ew jest in ku di sembolîzekirina tiştêkî, rewşekê, bûyerekê, kesekî û hwd. yê diyar de tîn bikaranîn. Mesele çêkirina destê xwe wek îskanekê wek ku av vedixwe, jestek e bi wateya avxwestinê. Di heman demê de lêdana destan bi wateya çûkê, livandina serê xwe berbi pêş û paş ve bi wateya erê an jî hejandina destî bi wateya oxir be, di nav mînakên van jistan de ne. Divê mînakên hemû tevgerên armanckirî yên ku di navbera 2.1.8.3. û 2.1.8.9. de cih digirin cûrbecûr bînin kirin û bînin xebitîn. Mesele wek hejandina milan bi wateya naxwazim, bişkifandina lêva jêrîn bi wateya nizamim.
Beş 2.1. Dema Berî Peyvê	2.1.9. Tevgerên bi armanç ên guncaw bi fonksiyonên ragihandinê re nîşan dide.	2.1.9.1. Tiştî dixwaze. 2.1.9.2. Tiştî red dike. 2.1.9.3. Xizmetê dixwaze. 2.1.9.4. Xizmetê red dike. 2.1.9.5. Zanînê dixwaze. 2.1.9.6. Zanînê red dike. 2.1.9.7. Zanînê dide. 2.1.9.8. Têkiliya civakî datîne.	Divê hemû tevgerên armanckirî yên di armanca 2.1.9. de li gorî amûra ragihandinê ya ku kes xwedî wê ye (jest, deng, peyv û hwd.) bînin xebitîn.
Beş 2.1. Dema Berî Peyvê	2.2.1. Bi peyvan xwe îfade dike.	2.2.1.1. Bi bikaranîna peyveke tenê xwe îfade dike. 2.2.1.2. Bi bikaranîna hevoka ku ji du peyvan pêk tê xwe îfade dike. 2.2.1.3. Bi bikaranîna hevoka ku ji sê û zêdetir peyvan pêk tê xwe îfade dike.	

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 2.2. Dema Peyvê	2.2.2. Cureyên peyvan di cih de bi kar tîne	2.2.2.1. Peyvên ku navî diyar dikin di cih de bi kar tîne. 2.2.2.2. Peyvên ku kirinê diyar dikin di cih de bi kar tîne. 2.2.2.3. Rengdêran di cih de bi kar tîne. 2.2.2.4. Cînavan di cih de bi kar tîne. 2.2.2.5. Peyvên ku demê diyar dikin di cih de bi kar tîne. 2.2.2.6. Peyvên pirsê di cih de bi kar tîne.	Peyvên ku di tevgera armanckirî ya 2.2.2.5. de tîn îfadekirin; divê wek sibê, nîvro, êvar, şev, roj, berê, niha, paşê, piştî demeke kurt, duh, îro, sibe û hwd. bînin fikirîn.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		2.2.2.7. Peyvên ku xwedîtiyê diyar dîkin di cih de bi kar tîne. 2.2.2.8. Peyvên ku cih diyar dîkin di cih de bi kar tîne. 2.2.2.9. Gîhanekan di cih de bi kar tîne. 2.2.2.10. Daçekan di cih de bi kar tîne.	
Beş 2.2. Dema Peyvê	2.2.3. Paşgiran di cih de bi kar tîne.	2.2.3.1. Paşgirên demê di cih de bi kar tîne. 2.2.3.2. Paşgirên pirsê di cih de bi kar tîne. 2.2.3.3. Paşgirên neyînîtiyê di cih de bi kar tîne. 2.2.3.4. Paşgirên pirjimariyê di cih de bi kar tîne. 2.2.3.5. Paşgirên xwedîtiyê di cih de bi kar tîne.	
Beş 2.2. Dema Peyvê	2.2.4. Peyvan li gorî wateya wan bi kar tîne.	2.2.4.1. Ji bo tiştên dixwaze bibêje peyva/peyvên guncaw bi kar tîne. 2.2.4.2. Ji bo bersivdanê peyva/peyvên guncaw bi kar tîne. 2.2.4.3. Peyva ku wateya wê fêr bûye di hevokê de di cihê rast de bi kar tîne. 2.2.4.4. Hevokên guncaw bi mijara tê axaftin re datîne.	Verbalîzm, bi taybetî bikaranîna peyvan e ji aliyê kesên kor ve bêyî ku wateya wan bizanin. Ev rewş, rewşa bikaranîna peyvên ku wateya wan nizanin di ragihandina devkî de ye, her çend kesên bi kêmasiya dîtinê bi hestên xwe ezmûn nekiribin jî. Mesele kesekî kor dikare behsa potaya basketbolê bike. Heta dikare bi peyvên rast wesif bike lê belê dibe ku qet jiyanê wî bi potaya basketbolê re çênebûye.
Beş 2.2. Dema Peyvê	2.2.5. Pêkhatayên hevokê bi kar tîne.	2.2.5.1. Hevokên bi pêkhataya hêsan bi kar tîne. 2.2.5.2. Hevoka rêzkişî bi kar tîne. 2.2.5.3. Hevoka bi pêkhataya hevedudanî bi kar tîne.	
Beş 2.2. Dema Peyvê	2.2.6. Hevokên guncaw bi fonksiyonên ragihandinê yên pêşketî re datîne.	2.2.6.1. Bi armanca etîketkirinê hevokê datîne. 2.2.6.2. Bi armanca xwestina xizmetê hevokê datîne. 2.2.6.3. Bi armanca xwestina zanînê hevokê datîne. 2.2.6.4. Bi armanca texmînkirinê hevokê datîne. 2.2.6.5. Bi armanca vegerandinê hevokê datîne.	
Beş 2.2. Dema Peyvê	2.2.7. Sohbetê dike.	2.2.7.1. Sohbetê dide destpêkirin. 2.2.7.2. Sohbata guncaw bi mijara sohbetê re didomîne. 2.2.7.3. Beşdarî sohbetê ku berê dest pê kiriye dibe. 2.2.7.4. Bi bikaranîna hevdem a zimanê devkî û jêstana sohbetê dike. 2.2.7.5. Sohbetê di dema guncaw de diqedîne.	
Beş 2.2. Dema Peyvê	2.2.8. Der barê mijareke diyarkirî de diaxive.	2.2.8.1. Rojeke xwe vedibêje. 2.2.8.2. Bûyer/ lîstik/filmê ku dîtiye/jiyaye û hwd. vedibêje. 2.2.8.3. Ramanên xwe der barê mijareke hatiye dayîn de vediguhêze.	

3. Navê Modulê	XWENDIN Û NIVÎSANDIN
3. Armanca Modulê	Di vê modulê de tê armanckirin ku kesên kêmdîtîn û kor şiyarên xwendin-nivîsandinê bi dest bixin.
3. Beşên Modulê	Xwendin-Nivîsandina Zû, Xwendin û Nivîsandina Pêşîn, Xwendina Herikbar û Têgihiştina Xwendinê, Têgihiştina Bihîstinê, Vegotina Nivîskî, Rêziman Ravekirinên Giştî yên Têkildarî Modulê

Ravekirinên Giştî yên Têkildarî Modulê

- Di beşa xwendin-nivîsandina zû de wek rêbaza hînkirinê dikare rêbaza hînkirina rasterast were hilbijartin. Divê bi lîstik û çalakiyên xweş jî tevgerên armanckirî bi awayekî bibandor û mayînde bîn pêşxistin. Herwiha divê bi hînkirina fersendê tevgerên armanckirî yên têkildarî şiyaran têxin nav rûtînên rojane (xwarin, dema serbest, xwendina pirtûkê û hwd.) û dubare bîn kirin. Beşa rêzimanê li gorî mijaran hatiye polînkirin. Rêzeke ji hêsan berbi zehmet ve nehatiye şopandin. Mamoste dikare li gorî bernameya dersê û performansa kes armancan hilbijêre. Ji bo tevgerên armanckirî yên ku polînkirin û rêzîkirinê pêwîst dîkin divê şema bîn bikaranîn. Di beşa têgihiştina xwendinê de dikarin pirsên têgihiştina nivîsê bi sê cureyan ji kes bîn pirsîn. Ev in; pirsên ku bersiva wan di nivîsê de heye, pirsên encamdanînê, pirsên zanîn û ezmûnê. Pirsên ku di nivîsê de hene: Ew pirs in ku bersiva wan di nivîsê de bi hevokekê bi awayekî eşkere hatiye îfadekirin. Pirsên encamdanînê: Ew pirs in ku bersiva wan di nivîsê de di nav hevokekê de bi eşkerî nayê îfadekirin, pêwîst dîkin ku xwendevan beşên cûrbecûr ên nivîsê bi kar bîne û di navbera bûyeran de tîkiliyê deyne. Pirsên ku xwe dispêrin zanîn û ezmûnan: Ew pirs in ku pêwîst dîkin xwendevan zanîn û ezmûnên xwe bi bûyerên di nivîsê de re bigire hev û bersiv bide. Ji bo kesên kêmdîtîn divê di materyalên xwendin û nivîsandinê de rêkxistinên wek pûnto, cureyê nivîsê, kontrast û hwd. bîn kirin. Mezinahî û karakterê nivîsê: Dema kes tê nîrxandin an hînkirin tê kirin, divê mezinahî û karakterê nivîsê yê guncaw bi dîtina kes re were hilbijartin. Pêwîst e ku mezinahiya nivîsê ya ku kes dikare bixwîne were diyarkirin û materyalên nivîskî bi vê mezinahiyê bîn amadekirin. Wekî din kes dê nikaribe weşanên wek pirtûk, test, nota tîn dayîn bixwîne. Kontrastbûn: Kontrast; bi awayekî bingeîn cudahiya rengî ya di navbera tişt û zemînê de ye. Divê dîtbarên ku kes bi rehetî dikare hilbijêre û teşeyê ji hev derxe bîn bikaranîn. Pêwîst e ku dîtbar bi qasî gengaz sade, dûrî tevlihevbûnê, guncaw bi berevajîtiya zemîn-teşe û rengî re bin. Rêza rûniştinê, ronahîkirin: Hin kesên kêmdîtîn tercîh dîkin ku derdora ku tê de ne ronî be, hinên din jî ronahîkirineke tarîtir dixwazin. Sedema vê tercîhê cudahiya nexweşiyên çav û astên dîtînê ye. Pêwîst e ku cureyê ronahîkirinê yê ku kes çêtir dibîne û xwe rehetir hîs dike were diyarkirin û derdorên tîn bikaranîn li gorî van pîvanan bîn rêkxistin. Divê kesê kêmdîtîn li şûna cihê ronî yê polê, bi awayekî ku tîrêjên rojê ji paş ve bîn, bi paş ve li pencereyê were rûniştandin.
- Pirtûkên dersê, defter-qelem, rêza rûpelê, xebatên xwendin-nivîsandinê: Dibe ku kesên kêmdîtîn bixwazin materyala dixwînin nêzîkî çavên xwe bikin da ku çêtir bibînin. Ya herî girîng a ku divê li vir bala mirov lê be ew e ku ne serî li ser rûpelê were xwarkirin, lê belê rûpel nêzîkî çavî were kirin. Xebitîna bi xwarbûna li ser rûpelê hem westandinê di stû û piştê de peyda dike hem jî ji ber ku siya serî dikeve ser rûpelê dîtînê zehmet dike. Bi armanca nêzîkkirina materyala dê were xwendin bo çavî, dikare ji stendên xwendinê an jî ji dosyayên stûr sûd were wergirtin. Rêza rûpelê ya pirtûkên dersê, dikare bi awayekî be ku ji bo kes tevlihevbûna dîtînê çêbike. Di van rewşan de dikare rêya girtina beşên ji bilî beşên ku kes lê dixebite bi kaxezekê were girtin. Ger kes dema dixwîne gelek caran rêzê winda dike an jî li şûna ku li rêza jêrîn xwendinê berdewam bike vedigere serê rêzê, dikare pencereyê xwendinê ya ku dê ji kartona fonê ya bi rengê tarî were

amadekirin bê bikaranîn. Divê deftera ku kes bi kar aniye bi xêzên bi rengên tarî hatibe diyarkirin. Ji bo ku dema dinivîse tiştên nivîsandine bibîne û bikaribe bixwîne, divê qelema kursanî ya B an 2B ya ku bi rengê tarî dinivîse, carinan qelema keçeyî (temaşekirina mamoste) were dayîn bikaranîn. Ji bo ku qelemê ji cihê guncaw û rehetir bigire, divê girtokên bi rengên biriqok bên dayîn bikaranîn. Ji bo hêsanî nivîsandinê pêwîst e ku li şûna deftera çargoşeyî, deftera xêzdar an jî ya ku rêzên wê bi xêzên bi rengê tarî hatine diyarkirin were bikaranîn. Dibe ku li gorî hevsalên wî xebateke amadekariya nivîsandinê ya zêdetir pêwîst be. Dayîna cih ji van xebatan re bi qasî pêwîst, dihêle ku dema kes derbasî nivîsandinê dibin nivîsa wan xwendinbar be. Pêşkêşkirina tişt û dîtbaran û mesafe: Pêwîst e ku dîtbar guncaw bi qada dîtina kes re û di dûrahiya ku kes dibîne de bên bicihkirin. Adaptekirinên di amûrên xwendin-nivîsandinê de: Girîng e ku rengê karakterê nivîsê bi zemînê re berevajîtiyê ava bike. Herwiha ji bo ku nivîs bi rehetî bên xwendin, pêwîst e ku valahiyên hundirîn ên tîpan û valahiyên di nav peyvê de asayî bên kirin, navberên rêzan bi awayekî bin ku şopandinê hêsan bikin, xêz û xalên rêzên vala yên ku tê xwestin di nav çalakîyê de nivîs bên nivîsandin stûr bên kirin. Herwiha di materyala nivîsandinê de jî pêwîst e ku rêz stûr bên kirin, ger pêwîst be dibe ku pêwîst be du rêz wek rêzeke tenê bên bikaranîn. Divê tîp û peyvên ku di tevgerên armanckirî yên di bin sernavê kor de tên bikaranîn bi alfabeya Braille bên nivîsandin.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 3.1. Xwendin-Nivîsandina Zû	3.1.1. Taybetmendiyên dengî yê peyvên ji hev cuda dike.	Kêmdîtin/Kor 3.1.1.1. Dîbêje ka cotên peyvên tîn gotin heman in/cuda ne. 3.1.1.2. Dîbêje ka peyvên tîn gotin qafiyedar in (gotina wan hevşêwe ye) an na. 3.1.1.3. Ji nav peyvên tîn gotin yê qafiyedar (gotina wan hevşêwe) dîbêje. 3.1.1.4. Bi peyveke tî gotin re peyveke qafiyedar (gotina wê hevşêwe) berhem tîne.	Wek çawa dikare berbi hemû tevgerên armanckirî yê di armanca 3.1.1. de hînkirina rasterast were kirin, divê bi lîstik û çalakiyên xweş jî ev şîyan bi awayekî bibandor û mayînde bîn pêşxistin. Herwiha divê bi hînkirina fersendê armancên têkildarî şîyanên hatine armanckirin tîxin nav rûtinên rojane (xwarin, dema serbest, xwendina pirtûkê û hwd.) û dubare bîn kirin. Divê ji bo pêşxistina hişmendiya qafiyeyê ji helbest/zûgotinok/mamik/stranên ku peyvên qafiyedar di hewînî sûd were wergirtin, peyvên qafiyedar bîn tekezîkirin û dubare bîn kirin. Di armanca 3.1.1. de dema bi helbest/zûgotinok/stranan berbi van tevgeran ve hînkirin tî kirin; 1. Divê helbest/zûgotinok/stran bi kesan re bi hev re bîn gotin. 2. Divê piştî ku hûn dîbêjin, ji kes were xwestin ku dubare bike. 3. Divê ji kes were xwestin ku bi awayekî serbixwe bibêje. 4. Divê ji kes were xwestin ku peyvên qafiyedar bi rîtim bibêje. 5. Divê ji kes were xwestin ku peyvên ku gotina wan dişibe peyvên qafiyedar berhem bîne. 6. Divê ji kes were xwestin ku dengê tî tekezîkirin ê di peyvên qafiyedar de bibêje. Hûn dikarin vê armancê bi çîrokên ku peyvên qafiyedar tî de hene jî bisepînin. Divê peyvên qafiyedar wek peyvên ku gotina wan hevşêwe ye bîn pênasîkirin. Divê bala mirov li ser wê be ku peyvên qafiyedar bi herî kêr 2 dengan bişibin hev. Peyvên kurt jî bo xebitîna qafiyeyê guncawtir in. Ji bo tevgera armanckirî ya 3.1.1.1. divê ji kes re cotên peyvên ku bi hev re heman in (bing-bing) an jî hevşêwe lê cuda ne (bing-ding) bîn dayîn. Ev peyv dikarin peyvên bi wate bin (çok-koç), herwiha dikarin peyvên bêwate jî bîn (pit-nit). Ji bo tevgera armanckirî ya 3.1.1.2. divê bi du peyvên xebat were kirin. Ji bo tevgera armanckirî ya 3.1.1.3. sê peyv tîn dayîn. Ji van dudo bi hev re qafiyedar in û yek ne qafiyedar e. Divê were hêvîkirin ku kes jî hev derxe ka

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
			kîjan dudo qafiyedar in. Ji bo tevgera armanckirî ya 3.1.1.4. divê peyvên guncaw ji bo berhevanîna peyva qafiyedar bîn bikaranîn û bala mirov li ser wê be ku peyvên kurt bin (mesele baş-taş-kaş-yaş û hwd.).
Beş 3.1. Xwendin-Nivîsandina Zû	3.1.2. Taybetmendiyên kîteyî yê peyvan ji hev cuda dike.	Kêmdîtin/Kor 3.1.2.1. Peyvên tîn gotin li kîteyên wan dabeş dike. 3.1.2.2. Kîteya pêşîn a peyveke tîn gotin dibêje. 3.1.2.3. Kîteya dawî ya peyveke tîn gotin dibêje.	Wek çawa dikare berbi hemû tevgerên armanckirî yê di armanca 3.1.2. de hînkirina rasterast were kirin, bi lîstik û çalakiyên xweş jî ev şîyan dikarin bi awayekî bibandor û mayînde bîn pêşxistin. Herwiha divê bi hînkirina fersendê armancên tîkildarî şîyanên hatine armanckirin tîxin nav rûtînên rojane (xwarin, dema serbest, xwendina pirtûkê û hwd.) û dubare bîn kirin. Ji bo tevgera armanckirî ya 3.1.2.1. divê di destpêkê de bi peyvên kurt xebat bîn kirin. Di dema xebatan de girîng e ku pêşî modelbûn were kirin. Dema li kîteyan tîn dabeşkirin, divê di her kîteyekê de di heman demê de bi çepikan, bi lêdana destî li masê an jî bi lêdana lingî li erdê kîte bîn tekezkirin.
Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 3.1. Xwendin-Nivîsandina Zû	3.1.3. Taybetmendiyên yekîneya dengî yê peyvan ji hev cuda dike.	Kêmdîtin/Kor 3.1.3.1. Dibêje ka du peyvên tîn gotin bi heman dengî dest pê dikin an na. 3.1.3.2. Dibêje ka du peyvên tîn gotin bi heman dengî diqedin an na. 3.1.3.3. Ji nav sê peyvên tîn gotin peyvên ku bi heman dengî dest pê dikin dibêje. 3.1.3.4. Ji nav peyvên tîn gotin peyvên ku bi heman dengî diqedin dibêje. 3.1.3.5. Peyveke ku bi heman dengî bi peyva tîn gotin re dest pê dike dibêje. 3.1.3.6. Dengê pêşîn ê peyva tîn gotin dibêje. 3.1.3.7. Peyveke ku bi heman dengî bi peyva tîn gotin re diqede dibêje. 3.1.3.8. Dengê dawî yê peyva tîn gotin dibêje. 3.1.3.9. Bi avêtina dengê pêşîn an dawî yê peyveke tîn gotin, ya dimîne dibêje. 3.1.3.10. Peyva nû ya ku bi zêdekirina dengê li serî an dawiya peyveke tîn gotin ava kiriye dibêje. 3.1.3.11. Peyva nû ya ku bi guhertina dengê di peyva tîn gotin de bi dengê din ava kiriye dibêje. 3.1.3.12. Peyveke kurt a ku bi dabeşkirina li dengên wê tîn gotin dibêje. 3.1.3.13. Peyveke kurt a tîn gotin li dengên wê dabeş dike.	Wek çawa dikare berbi hemû tevgerên armanckirî yê di armanca 3.1.3. de hînkirina rasterast were kirin, bi lîstik û çalakiyên xweş jî ev şîyan dikarin bi awayekî bibandor û mayînde bîn pêşxistin. Herwiha divê bi hînkirina fersendê armancên tîkildarî şîyanên hatine armanckirin tîxin nav rûtînên rojane (xwarin, dema serbest, xwendina pirtûkê û hwd.) û dubare bîn kirin. Di hînkirina hemû tevgerên armanckirî yê di armanca 3.1.3. de, ji bo ku kes naveroka erka ku ji wan tîn hevîkirin fam bikin, divê beriya her tiştî bi rastî modelbûn were kirin. Dema tîn nixandî jî divê li ser maddeyên mînak were ravekirin ka di maddeya tîkildar de çî tîn xwestin. Di hînkirin û nixandina hemû tevgerên armanckirî yê di armanca 3.1.3. de pêwîst e ku bi peyvên ku kes bi wan nas in were xebitîn. Peyvên ku wateya wan nizanin, dibin asteng li ber famkirina erkê û hûrbûna li ser taybetmendiyên dengî yê peyvan. Di hemû tevgerên armanckirî yê di armanca 3.1.3. de divê mirov hişmend be li cudahiya di navbera deng û tîpê de. Dema tîn hînkirin û tîn nixandî, ne tîp, lê belê deng tîn tekezkirin. Herwiha hin tîp xwedî zêdetirî yek dengî ne. Mesele tîpa “k” wek ku di peyvên “kar û kel” de heye bi awayekî cuda tîn dengdan. Bi heman awayî tîpa “g” wek ku di peyvên “gel û gol” de heye bi awayekî cuda tîn dengdan. Di hemû tevgerên armanckirî yê di armanca 3.1.3. de divê pêşî bi peyvên yek-kîteyî paşê jî bi peyvên du-kîteyî were xebitîn. Divê bi peyvên sê û zêdetir

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
			kîteyî neyê xebitîn. Dema tê xebitîn divê di rêza pêşîn de bi dengên tîpên bêdeng xebat bên kirin. Ji bo tevgerên armanckirî yên 3.1.3.3. û 3.1.3.4. sê peyvên tîpên dayîn. Ji van dudo bi heman dengî dest pê dikin/diqedin û yek bi dengekî cuda dest pê dike/diqede. Divê were hêvîkirin ku kes ji hev derxe ka kîjan dudo bi heman dengî dest pê dikin/diqedin. Ji bo tevgera armanckirî ya 3.1.3.9. di gotina ya dimîne bi avêtina dengê pêşîn de mînak "taş-aş"; di gotina ya dimîne bi avêtina dengê dawî de jî mînak "taş-ta" dikare were dayîn. Ji bo tevgera armanckirî ya 3.1.3.10. ji bo ku bi zêdekirina dengekî li serê peyvê peyveke nû ava bike mînakên "aç-taç; ev-dev; çim-içim" dikarin bên dayîn, ji bo ku bi zêdekirina dengekî li dawiyê peyvê peyveke nû ava bike jî mînakên "su-sus; bu-bul; dev-deve; gez-gezi" dikarin bên dayîn. Herwiha di vê tevgera armanckirî de ji bo ku peyva tê hêvîkirin were avakirin jî peyveke bi wate be, divê dengê dê were zêdekirin jî digel peyvê were dayîn. Ji bo tevgera armanckirî ya 3.1.3.11. divê di rêza pêşîn de guhertina dengên pêşîn, paşê guhertina dengên dawî û li dû wê guhertina dengên navîn were pêşdebirin. Wek mînak "baş-taş; baş-bal; baş-beş" dikare were dayîn. Herwiha di vê tevgera armanckirî de ji bo ku peyva tê hêvîkirin were avakirin jî peyveke bi wate be, divê dengê ku tê xwestin were guhertin digel dengê ku dê li şûna wî were danîn bi hev re bên dayîn.
Beş 3.1. Xwendin-Nivîsandina Zû	3.1.4. Peyva nivîskî ya tê nîşandan dibêje.	Kêmdîtî 3.1.4.1. Nivîsa bi wêne ya tê dayîn, bi peyva nivîskî re hevber dike. 3.1.4.2. Wêneyê tê dayîn, bi peyva nivîskî re hevber dike. 3.1.4.3. Ji nav peyvên nivîskî yên tîpên dayîn peyva nivîskî ya tê xwestin nîşan dide. 3.1.4.4. Peyva nivîskî ya tê nîşandan dibêje. Kor 3.1.4.5. Nivîsa Braille ya ku bi sembola taktîl hatiye hevberkirin, bi peyva nivîskî ya Braille re hevber dike. 3.1.4.6. Tîştê/wêneyê bilind ê tê dayîn, bi peyva nivîskî ya Braille re hevber dike. 3.1.4.7. Ji nav peyvên nivîskî yên Braille yên tîpên dayîn peyva tê xwestin nîşan dide. 3.1.4.8. Peyva nivîskî ya Braille ya tê dayîn dibêje.	Ji bo tevgera armanckirî ya 3.1.4.5. du set tîpên amadekirin ku têkildarî mijarekê ne (mesele fêkî, cil û hwd.), yek ji wêne/nivîs/tîştî û ya din tenê ji nivîsê (ji nivîsa Braille) pêk tê. Divê hejmara kartên di van setan de li gorî taybetmendiyan kognîtîf ên kes were rêxistin. Divê ji kes were xwestin ku nivîsan bi peyva nivîskî ya bi wêne ya guncaw re hevber bike.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 3.1. Xwendin-Nivîsandina Zû	3.1.5. Taybetmendiyên nivîsê ji hev cuda dike.	Kêmdîtin/Kor 3.1.5.1. Aliyê nivîsê yê ji çepê berbi rastê ve nîşan dide. 3.1.5.2. Aliyê herikîna rêzên di nivîsê de yê berbi jêr ve nîşan dide. 3.1.5.3. Hejmara peyvan a di hevokeke ku bi nivîskî tê dayîn û 2-5 peyvan dihevwîne de dibêje. 3.1.5.4. Tîpan, ji nav teşeyên din ên dişibin tîpan nîşan dide. 3.1.5.5. Hejmara tîpan a di peyveke ku bi nivîskî tê dayîn û 2-6 tîpan dihevwîne de dibêje. 3.1.5.6. Di nav nivîsê de tîpeke girdek nîşan dide. 3.1.5.7. Di nav nivîsê de tîpeke hûrdek nîşan dide. 3.1.5.8. Hejmara hevokan a di nav nivîseke kurt a ku bi nivîskî tê dayîn û 2-4 hevokan dihevwîne de dibêje. 3.1.5.9. Di nav nivîsê de nîşanên xalbendiyê yê bingehîn nîşan dide. 3.1.5.10. Ji nav peyvên ku bi nivîskî tên pêşkêşkirin peyva ku bi peyva tê nîşandan re heman e nîşan dide. 3.1.5.11. Di nav peyvê de tîpên ku heman in nîşan dide. 3.1.5.12. Peyva tê gotin ji nav rewşa nivîskî ya peyvên bi dirêjahiyên cuda nîşan dide.	Divê mînakên peyv û tîpan ên ku ji bo hemû tevgerên armanckirî yê di armanca 3.1.5. de tên bikaranîn, ji bo kesên kor bi alfabeya Braille bîna pêşkêşkirin. Wek çawa dikare berbi hemû tevgerên armanckirî yê di armanca 3.1.5. de hînkirina rasterast were kirin, bi lîstik û çalakîyên xweş jî ev şîyan dikarin bi awayekî bibandor û mayînde bîna pêşxistin. Herwiha divê bi hînkirina fersendê armancên têkildarî şîyanên hatine armanckirin têxin nav rûtînen rojane (xwarin, dema serbest, xwendina pirtûkê û hwd.) û dubare bîna kirin. Ji bo hemû tevgerên armanckirî yê di armanca 3.1.5. de girîng e ku kes gelek caran rastî materyalên nivîskî werin û bikaribin bigihîjin wan. Divê di hemû çalakîyan de û bi taybetî di dema çalakîyên xwendina pirtûkê de bi tekezkirina li taybetmendiyên nivîsê hişmendiya nivîsê were pêşxistin (mesele bi nîşandana nivîsa di rûpelê de û bi gotina “Ez ji vir dest bi xwendinê dikim.” û bi şopandina nivîsê bi tiliyê demekê, dikare aliyê nivîsê yê ji çepê berbi rastê ve were tezekkirin). Ji bo kesên kor divê bi rastî pirtûkên tiştî/pirtûkên taktîl ên ku bi Braille hatine nivîsandin û guncaw in bi astên kognîtîf ên kesên re bîna amadekirin Ji bo tevgera armanckirî ya 3.1.5.3. şopandina bi tiliyê carinan li ser materyalên nivîskî û nîşandana rewşa nivîskî ya peyva tê gotin bi tiliyê, ji bo pêşxistina têgeha peyvê ya kesên girîng e. Ji bo tevgera armanckirî ya 3.1.5.4. divê bi pêşkêşkirina 3-4 dîtbaran ku yek tîp e û yê din teşeyên dişibin tîpê ne (?, <, ±, ∞, j, † û hwd.) nîrxandin were kirin. Ji bo kesên kor, ji ber ku hemû jimarên xalan tîpekê temsîl dikin, dikare ji wan were xwestin ku ji nav teşeyên ku bi awayekî taktîl bilind kirî ne tîpan ji hev derxin. Divê tevgerên armanckirî yê 3.1.5.6. û 3.1.5.7. ji bo kesên kor bîna bêparhiştin (Di alfabeya Braille de wek tîpa girdek semboleke cuda tê bikaranîn. Ji ber ku hînkirina van sembolan di dema xwendin-nivîsandina zû de nayê kirin, divê cudakirina tîpa girdek û hûrdek ji kesên neyê hêvîkirin). Ji bo tevgera armanckirî ya 3.1.5.10. divê bi pêşkêşkirina 2-3 peyvên ku nivîsandina wan dişibe peyva armanckirî (mesele kömür) lê cuda ne (kemer, körük, küme û hwd.) digel heman peyva armanckirî, ji kesên were xwestin ku peyva heman ji hev derxe. Ji bo kesên kor divê peyvên ku jimarên xalên Braille yê wan dişibin hev bîna

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
			bikaranîn. Ji bo tevgera armanckirî ya 3.1.5.12. ji kes re peyveke ku dengdana wê dirêj (mesele sandalye) an kurt (mesele su) e tê gotin û jê tê pirsîn ka ev peyv dikare kîjan ji 2-3 peyvên ku jê re tên nîşandan be. Wek mînak ji kes re du kartên ku peyvên “sandalye” û “su” li ser hatine nivîsandin tên nîşandan û bi dayîna rêwerzeke wek “Li gorî te di kîjanê de sandalye hatiye nivîsandin?” tê nirxandin ka kes hişmend e an na ku divê rewşa nivîskî ya peyveke ku dengdana wê dirêj e jî dirêj be.
Beş 3.1. Xwendin-Nivîsandina Zû	3.1.6. Nav û dengên tîpan dibêje.	Kêmdîtî 3.1.6.1. Tîpa ku jê re tê gotin, ji nav çar tîpên girdek nîşan dide. 3.1.6.2. Tîpa ku jê re tê gotin, ji nav çar tîpên hûrdek nîşan dide. 3.1.6.3. Navê tîpa girdek a ku jê re tê nîşandan dibêje. 3.1.6.4. Navê tîpa hûrdek a ku jê re tê nîşandan dibêje. 3.1.6.5. Dengê ku jê re tê gotin, ji nav çar tîpên girdek nîşan dide. 3.1.6.6. Dengê ku jê re tê gotin, ji nav çar tîpên hûrdek nîşan dide. 3.1.6.7. Dengê tîpa girdek a ku jê re tê nîşandan dibêje. 3.1.6.8. Dengê tîpa hûrdek a ku jê re tê nîşandan dibêje. Kor 3.1.6.9. Tîpa ku jê re tê gotin, ji nav çar tîpan nîşan dide. 3.1.6.10. Navê tîpa ku dest lê dide dibêje. 3.1.6.11. Dengê ku jê re tê gotin, ji nav çar tîpan nîşan dide. 3.1.6.12. Dengê tîpa ku dest lê dide dibêje.	Di armanca 3.1.6. de divê çalakiyên zaniyara tîpan û hişmendiya dengnasî bi hev re bîr pêşkêşkirin. Dema bi hev re tên pêşkêşkirin hem hişmendiya dengnasî hem jî zaniyara tîpan zûtir pêş dikeve, pêvajoya fêrbûna xwendinê ya paşê jî bi awayekî serkeftîtir tê domandin. Pêşkêşkirina bi hev re pêwîst dike ku hem li navên tîpan hem jî li dengên wan tekez were kirin. Wek çawa dikare berbi hemû tevgerên armanckirî yên di armanca 3.1.6. de hînkirina rasterast were kirin, bi listik û çalakiyên xweş jî ev şîyan dikarin bi awayekî bibandor û mayînde bîr pêşxistin. Herwiha divê bi hînkirina fersendê armancên têkildarî şîyanên hatine armanckirin têxin nav rûtînen rojane (xwarin, dema serbest, xwendina pirtûkê û hwd.) û dubare bîr kirin. Ji bo hemû tevgerên armanckirî yên di armanca 3.1.6. de girîng e ku kes gelek caran rastî materyalên nivîskî werin û bikaribin bigihîjin wan. Divê di hemû çalakiyan de û bi taybetî di dema çalakiyên xwendina pirtûkê de bi tekezkirina li tîpan zaniyara tîpan were pêşxistin (mesele bi gotina “Binêre di vê rûpelê de gelek tîpên ‘s’ hene. Ka em bijmêrin. Ka em niha jî tenê yên hûrdek bijmêrin.” zaniyara tîpan tê piştgirîkirin). Ji bo kesên kor divê bi rastî pirtûkên tiştî/pirtûkên taktîl ên ku bi Braille hatine nivîsandin û guncaw in bi astên kognîtîf ên kesan re bîr amadekirin.
Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 3.2. Xwendin û Nivîsandina Pêşîn	3.2.1. Amûra guncaw a xwendin-nivîsandinê bi kar tîne.	3.2.1.1. Di karên xwe yên rojane de hesta destlêdanê bi kar tîne. 3.2.1.2. Di karên xwe yên rojane de hesta bihîstinê bi kar tîne. 3.2.1.3. Di karên xwe yên rojane de hesta dîtinê bi kar tîne. 3.2.1.4. Wek amûra xwendin-nivîsandinê nivîsa çapkirî bi kar tîne. 3.2.1.5. Wek amûra xwendin-nivîsandinê nivîsa Braille bi kar tîne.	Ji bo tevgerên armanckirî yên di armanca 3.2.1. de divê bi armanca diyarkirina wê yekê ka kes kîjan kanala hestî serdesttir bi kar tîne, forma temaşekirina kanalên hestî were bikaranîn.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 3.2. Xwendin û Nivîsandina Pêşîn	3.2.2. Dengê tê nasandin ji hev cuda dike.	Kêmdîtîn 3.2.2.1. Dîtbarên peyvên ku bi dengê tê nasandin dest pê dikin nîşan dide. 3.2.2.2. Dengê ku peyvên bi dengê tê nasandin dest pê dikin pê dest pê dikin dibêje. 3.2.2.3. Dîtbarên peyvên ku bi dengê tê nasandin diqedin nîşan dide. 3.2.2.4. Dengê ku peyvên bi dengê tê nasandin diqedin pê diqedin dibêje. Kor 3.2.2.5. Sembolên taktîl ên peyvên ku bi dengê tê nasandin dest pê dikin nîşan dide. 3.2.2.6. Dengê ku peyvên bi dengê tê nasandin dest pê dikin pê dest pê dikin dibêje. 3.2.2.7. Sembolên taktîl ên peyvên ku bi dengê tê nasandin diqedin nîşan dide. 3.2.2.8. Dengê ku peyvên bi dengê tê nasandin diqedin pê diqedin dibêje.	Tevgerên armanckirî yên 3.2.2.1., 3.2.2.3, 3.2.2.5. û 3.2.2.6. dikarin bi şîyanên hevberkirin û ji hev cudakirina dangan bîr pîkanîn. Divê pêşî bi hevberkirinê were destpêkirin. Ji bo kirandina hevberkirinê, mesele divê bi nîşandana dîtbarên (sembolên taktîl ên) du peyvên ku bi dengê tê nasandin dest pê dikin/diqedin û peyvên ku bi dengê cuda dest pê dikin/diqedin, gotina peyvên, li dû wê ji kes were xwestin ku yê bi heman dengî dest pê dikin/diqedin (bi dengê tê nasandin) nîşan bide. Ji bo ji hev cudakirinê jî divê ji kes re seta ku ji dîtbara (sembola taktîl a) du peyvên bi heman dengî dest pê dikin/diqedin û ji dîtbareke (sembola taktîl a) peyveke ku bi dengê tê nasandin dest pê dike/ diqede pêk tê were pêşkêşkirin. Ji bo her sepandinekê divê peyvên ku ji herî kêr çar setan pêk tên û dîtbarên wan (sembolên taktîl) bîr bikaranîn. Ji bo tevgerên armanckirî yên 3.2.2.5. û 3.2.2.7. divê rêwerz, bi derxistina dengê tê nasandin, "Ya ku bi ... dest pê dike nîşan bide!" (ji hev cudakirin) "Yên ku bi ... dest pê dikin nîşan bide!" (hevberkirin), ji bo ji hev cudakirinê jî "Kîjan peyv bi ... dest pê nake? Nîşan bide!" be. Ev tevgerên armanckirî dikarin li gorî asta kognîtîf a kes wek hîlbijartina ji sê dîtbaran an ji çar dîtbaran bîr rêxistin (Divê were hêvîkirin ku kesê bi kêmasiya dîtinê nivîsa Braille bi destlêdanê lêkolîn bike û paşê nîşan bide.). Ji bo tevgerên armanckirî yên 3.2.2.6. û 3.2.2.8. divê peyv ji kes re bi dîtbarên wan (bi tişt an sembolên taktîl ên wan) re bîr pêşkêşkirin û bîr gotin. Dema tê gotin divê li dengê dê were hînkirin tekez were kirin. Her çend rêza hînkirinê ya koman dangan di bernameya hînkirinê de tê diyarkirin jî, divê di rêzkirina dengên dê bîr nasandin de dengên ku kes dikare derxe bîr berçavgirtin.
Beş 3.2. Xwendin û Nivîsandina Pêşîn	3.2.3. Pozîsyona xwendinê saz dike.	Kêmdîtîn 3.2.3.1. Bi awayekî rast rûdine. 3.2.3.2. Materyala ku dê bixwîne guncaw bi mesafeya xwendinê û hewcedariya xwe re bi cih dike. Kor 3.2.3.3. Bi awayekî rast rûdine. 3.2.3.4. Kaxezê rast û bi awayekî ku bi her du destan şopandina rêzê bike digire.	Ji bo tevgera armanckirî ya 3.2.3.4. kes bi serê tiliya destekî xwe xalên Braille nas dike û bi serê tiliya destê din tîpên dê werin ên di heman rêzê de dişopîne.
Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 3.2. Xwendin û Nivîsandina Pêşîn	3.2.4. Dengê tê nasandin dixwîne.	Kêmdîtîn 3.2.4.1. Tîpa hûrdek a dengê tê nasandin dixwîne. 3.2.4.2. Tîpa girdek a dengê tê nasandin dixwîne. Kor 3.2.4.3. Dengê tê nasandin dixwîne. 3.2.4.4. Jimarên xalan ên tîpa dengê tê nasandin dibêje.	Digel xebatên ku ji bo hemû tevgerên armanckirî yên di armanca 3.2.4. de tên kirin, divê bala mirov li ser wê be ku kes dema dixwîne rast rûdine û pirtûkê/defterê di dûrahiya guncaw bi mesafeya dîtina xwe re digire. Dema deng tê nasandin, divê bi rastî bi tiştên di qonaxa ji hev cudakirina dengê tê nasandin de hatine kirin re têkilî were danîn.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		3.2.4.5. Dibêje ku tîpa ku bi bikaranîna nîşana tîpa girdek hatiye nivîsandin tîpeke girdek e.	Ji bo tevgera armanckirî ya 3.2.4.5. dema di nivîsa çapkirî de ji bo nivîsandina girdek û hûrdek a tîpan sembolên cuda tên bikaranîn, di nivîsa Braille de bi armanca diyarkirina wê yekê ku tîp girdek e beriya tîpê sembolek (xala 6.) tê nivîsandin. Bi vî awayî kes fam dike ku tîp wek girdek hatiye nivîsandin. Divê ji kes were hêvîkirin ku bibêje ka tîp girdek hatiye nivîsandin an hûrdek.
Beş 3.2. Xwendin û Nivîsandina Pêşîn	3.2.5. Dengê tê nasandin ji nav tîpên din nîşan dide.	Kêmdîtîn 3.2.5.1. Tîpa hûrdek a dengê tê nasandin ji nav dengên din nîşan dide. 3.2.5.2. Tîpa hûrdek a dengê tê nasandin di nav peyvan de nîşan dide. 3.2.5.3. Tîpa girdek a dengê tê nasandin ji nav dengên din nîşan dide. 3.2.5.4. Tîpa girdek a dengê tê nasandin di nav peyvan de nîşan dide. Kor 3.2.5.5. Tîpa dengê tê nasandin ji nav tîpên din nîşan dide. 3.2.5.6. Tîpa dengê tê nasandin di nav peyvan de nîşan dide. 3.2.5.7. Dengên ku bi nîşana tîpa girdek hatine nivîsandin ji nav tîpên hûrdek nîşan dide. 3.2.5.8. Dengên ku bi nîşana tîpa girdek hatine nivîsandin di nav peyvan de nîşan dide.	Ji bo hemû tevgerên armanckirî yên di armanca 3.2.5. de bikaranîna we ya rewşên tîp/peyvan ên ku bi karakterên cuda hatine nivîsandin jî xizmeta giştîkirinê dike (bikaranîna bi karakterê cuda dikare ji bo kesên kêmdîtîn were bikaranîn).
Beş 3.2. Xwendin û Nivîsandina Pêşîn	3.2.6. Pozîsyona nivîsandinê saz dike.	Kêmdîtîn 3.2.6.1. Bi awayekî rast rûdine. 3.2.6.2. Kaxez û qelemê bi awayekî guncaw ji bo nivîsandinê digire. Kor 3.2.6.3. Bi awayekî rast rûdine. 3.2.6.4. Bi vekirina tableta Braille kaxezê datîne. 3.2.6.5. Qelema Braille (bizmarê) bi awayekî guncaw digire. 3.2.6.6. Dema bi destekî xwe qutîkan dişopîne, bi destê din xwe amade dike ku ji rastê berbi çepê ve binivîse. 3.2.6.7. Kaxezê datîne daktîloyê. 3.2.6.8. Tiliyên xwe bi awayekî guncaw li ser bişkokên daktîloyê datîne.	Ji bo hemû tevgerên armanckirî yên di armanca 3.2.6. de li tu pêşmerc an rêza pêşînahiyê nehatiye nêrîn. Divê li gorî hewcedariya kes berêkirin berbi bikaranîna tableta Braille û/an daktîloya wê ve were kirin.
Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 3.2. Xwendin û Nivîsandina Pêşîn	3.2.7. Dengê tê nasandin dinivîse.	Kêmdîtîn 3.2.7.1. Tîpa hûrdek a dengê tê nasandin bi nêrîna li modelê dinivîse. 3.2.7.2. Tîpa girdek a dengê tê nasandin bi nêrîna li	Ji bo hemû tevgerên armanckirî yên di armanca 3.2.7. de divê bal bê kişandin ku kes dema dinivîse bi awayekî rehet ber bi deftera xwe ve xwar bibe û rûne û defterê di dûriya guncaw a dîtîn û nivîsandina xwe de bigire (Ji bo koran divê bal li ser pozîsyona nivîsandinê ya li ser tablet an daktîloya braille bê kişandin.).

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		modelê dinivîse. 3.2.7.3. Dema dengê tê nasandin tê gotin dinivîse. Kor 3.2.7.4. Tîpa dengê tê nasandin bi destlêdana modelê dinivîse. 3.2.7.5. Dengê tê nasandin bi destlêdana modela wî ya ku bi nîşana tîpa girdek hatiye nivîsandin dinivîse. 3.2.7.6. Dema dengê hatiye nasandin tê gotin dinivîse.	Ji bo tevgera armanckirî 3.2.7.2 û 3.2.7.3. divê li gorî pêdiviya kes çend caran model bê bûn ku tîpa jê tê xwestin binivîse çawa tê nivîsandin. Çiqas girîng be ku kes tîpê rast di navbera rêzikan de binivîse, ewqas jî girîng e ku tîpê li gorî alî û rêzikên nivîsandinê binivîse. Ji ber vê yekê dema model tê bûn divê her carê xêzkirina tîpê bi devkî bê vegotin. Piştî divê tîpa ku ji kes tê xwestin di defterê de binivîse wek nimûneyekê bê nivîsandin. Divê ji kes bê xwestin ku li vê modelê binêre û binivîse. Ger kes piştî modelbûnê tîpê di navbera rêzikan de bi cih neke, bi alîyê şaş binivîse, cihên destpêk û dawîyê rast neke, divê nîşaneyên dîtinê wek berçavkirina xêza rêzikê ji bo nivîsandina tîpê, çûyîna li ser xalên tîpê, diyarkirina xalên destpêk û dawîyê, bi tîr diyarkirina alî bîr bikaranîn. Herwiha ji bo kesên kêmdîtin divê di materyalên nivîsandinê de guncandinên wek kontrast û firehiya navbera rêzikan jî bîr kirin. Ji bo tevgera armanckirî 3.2.7.4. û 3.2.7.5. divê ji kes bê xwestin ku destê xwe bide tîpa bi nivîsa braille hatiye nivîsandin û bi baldarî bikole, paşê wê tîpê bi xwe li ser tabletê binivîse. Dema kes hejmarên xalan tevlihev bike divê jê bê xwestin ku dîsa li modelê binêre û dema pêwîst be dema li ser tabletê dinivîse piştgirî bê dayîn. Divê tîpên kes rast nivîsandine bîr nîşandan û bi gotina "Te pir xweş nivîsandiye!" bîr xurtkirin, li ser tîpên şaş nivîsandine nebe sekinîn. Ji bo tevgera armanckirî 3.2.7.5. ger kes dema dengê gotin nikaribe binivîse, divê sembola dengê hatiye gotin bo demeke kurt bê nîşandan, paşê bê girtin û deng ji nû ve bê gotin û jê bê xwestin ku binivîse. Piştî ku nivîsand jî divê tîpa nivîsandiye bi modela hatiye nîşandan bê berhevdan.
Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 3.2. Xwendin û Nivîsandina Pêşîn	3.2.8. Dengê hatiye nasandin di nav kîr û peyvê de dixwîne.	Kêmdîtin 3.2.8.1. Kîrên ji dengên hatine nasandin hatine çêkirin dixwîne. 3.2.8.2. Peyvên ji kîrên ku dengên hatine nasandin tê de ne pêk tên dixwîne. 3.2.8.3. Wêneyên peyvên dixwîne nîşan dide. Kor 3.2.8.4. Kîrên ji dengên hatine nasandin hatine çêkirin dixwîne. 3.2.8.5. Peyvên ji kîrên ku dengên hatine nasandin tê de ne pêk tên dixwîne. 3.2.8.6. Sembolên taktîl ên peyvên dixwîne nîşan dide.	Ji bo tevgera armanckirî 3.2.8.1. û 3.2.8.4. dema kîrên tên xwendin, dirêjkirina dengê hatiye nasandin û girêdana wê bi dengê din re stratejiyeke ku hilanînê hêsan dike. Ji bo tevgera armanckirî 3.2.8.1. û 3.2.8.2. divê dengê hatiye nasandin bi dengên berê hatine dayîn re bê girêdan û bi qasî ku pêkan e kîr û peyvên watedar bîr çêkirin, bîr xwendin û bîr nivîsandin. Ji bo tevgera armanckirî 3.2.8.2. dema peyvên tên xwendin divê qonaxên li kîtan parvekirin-xwendin-girêdan-xwendin bîr şopandin. Mînak divê jê bê xwestin ku peyva ji kîrên dizane hatiye çêkirin (lale, ela hwd.) bixwîne.

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
			Ji bo tevgera armanckirî 3.2.8.3. û 3.2.8.6. hevberkirina peyvên tîn xwendin bi wêneyên wan (sembolên taktîl) re, amadekariyek e ji bo şiyana têgihiştina xwendinê.
Beş 3.2. Xwendin û Nivîsandina Pêşîn	3.2.9. Dengê hatiye nasandin di nav kîr û peyvê de dinivîse.	Kêmdîtî/Kor 3.2.9.1. Kîrên ji dengên hatine nasandin hatine çêkirin bi nihêrîn/bi destdanê dinivîse. 3.2.9.2. Kîrên ji dengên hatine nasandin hatine çêkirin dema tîn gotin dinivîse. 3.2.9.3. Peyvên ji kîrên ku dengên hatine nasandin tî de ne pêk tîn bi nihêrîn/bi destdanê dinivîse. 3.2.9.4. Peyvên ji kîrên ku dengên hatine nasandin tî de ne pêk tîn dema tîn gotin dinivîse.	Ji bo tevgera armanckirî 3.2.9.2. û 3.2.9.4 nivîsandina dema tî gotin, qonaxê girîng e di hilanîna dangan ya kes de. Divê ev qonax neyê derbaskirin. Ji bo tevgera armanckirî 3.2.9.1. û 3.2.9.3. gotina “bi nihêrîn dinivîse” ji bo kesên kor tî wateya ku destê xwe dide modela bi braille hatiye nivîsandin û dengê/tîpa/hevoka nîmûne dinivîse.
Beş 3.2. Xwendin û Nivîsandina Pêşîn	3.2.10. Dengî di nav hevok û nivîsê de dixwîne.	Kêmdîtî/Kor 3.2.10.1. Hevokên ji dengên hatine nasandin hatine çêkirin dixwîne. 3.2.10.2. Nivîsên ji dengên hatine nasandin hatine çêkirin dixwîne.	Ji bo hemû tevgerên armanckirî yê di armanca 3.2.10. de divê ji peyvên ku dengê hatiye nasandin û dengên berê hatine dayîn tî de ne, hevok û nivîs bîr çêkirin. Ji bo ku hevok û nivîs watedar bin, ji bo peyvên ji dengên kes hê fêr nebûye pêk tîn dikare wêne (sembolên taktîl û tîşt) bî bikaranîn. Ji bo tevgera armanckirî 3.2.10.2. bi dubarekirin xwendina nivîsan hem ji pêşxistina leza xwendinê re hem jî ji têgihiştina xwendinê re xizmet dike.
Beş 3.2. Xwendin û Nivîsandina Pêşîn	3.2.11. Dengî di nav hevokê de dinivîse.	Kêmdîtî/Kor 3.2.11.1. Hevokên ku dengên hatine nasandin tî de ne bi nihêrîn/bi destdanê dinivîse. 3.2.11.2. Hevokên ku dengên hatine nasandin tî de ne dema tîn gotin dinivîse.	Ji bo hemû tevgerên armanckirî yê di armanca 3.2.11. de divê di dema hînkirinê de bala kes bî kîşandin ser rêzikên nivîsandinê, kîjan rêzika nivîsandinê ye û bi çî armancê tî bikaranîn bî hînkirin. Di tevgera armanckirî 3.2.11.1. de gotina “bi nihêrîn” ji bo kesên kor tî wateya “bi destdanê”.
Beş 3.2. Xwendin û Nivîsandina Pêşîn	3.2.12. Bi rêkûpêk dinivîse.	Kêmdîtî 3.2.12.1. Bi şopandina rêzikê dinivîse. 3.2.12.2. Bi hiştina valahiya guncaw di navbera peyvên de hevokê dinivîse. 3.2.12.3. Bi hiştina valahiya guncaw di navbera tîpan de peyvê dinivîse. 3.2.12.4. Bi hiştina valahiya guncaw di navbera hevokan de nivîsê dinivîse. Kor 3.2.12.5. Bi şopandina rêzikê dinivîse. 3.2.12.6. Li ser tablet/daktîloya braille bi hiştina valahiya qutîkekê di navbera peyvên de dinivîse. 3.2.12.7. Li ser tablet/daktîloya braille bêyî ku qutîkê derbas bike di navbera tîpan de dinivîse. 3.2.12.8. Bi hiştina valahiya guncaw di navbera hevokan de nivîsê dinivîse.	Ji bo hemû tevgerên armanckirî yê di armanca 3.2.12. de dikare rêkxistinê defterê (diyarkirina rêzikan bi sor, parvekirina rêzikekê li duyan û rengkirina wê hwd.) bîr kirin. Dema ev tevgerên armanckirî tî hînkirin divê pêşî nîmûneyên nivîsa xweş ji kes re bîr nîşandan, kes bîr handan û model bîr bîr ka wê çawa binivîse (Ji bo kesên kêmdîtî ev guncandin dikarin bîr kirin.).

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 3.2. Xwendin û Nivîsandina Pêşîn	3.2.13. Bersiva pirsên li ser hevok û nivîsa ku dengê hatiye nasandin tê de ye tîrên pirsîn dide.	Kêmdîtî/Kor 3.2.13.1. Piştî ku hevokên dengên hatine nasandin tê de ne dixwîne, bersiva pirsên hêsan ên li ser hevokê dide. 3.2.13.2. Piştî ku nivîsên dengên hatine nasandin tê de ne dixwîne, bersiva pirsên hêsan ên li ser nivîsê dide.	Di tevgera armanckirî 3.2.13.1. de ji bo têgihiştina hevokê divê pirsên hûn ê bipirsîn li gorî her hêmaneke hevokê bîr amadekirin. Ji bo tevgera armanckirî 3.2.13.2. hebûna wêneyekî ku nivîsê vedibêje û axaftina li ser wêneyî berî ku nivîsê bibe xwendin, têgihiştinê hêsan dike (Ji bo kesên kor dikare tiştek an wêneyên bilind ên tîkildarî nivîsê bibe kolandin.). Divê pirs li ser kirdar, kes û tiştên di nivîsê de derbas dibin bîr çêkirin û ber bi yekeya agahiyê ya di nivîsê de ve bin. Ji bo armanca ku hevok û nivîs watedar bin, ji bo peyvên ji dengên kes hê fêr nebûye pêk tîr dikare wêne bibe bikaranîn.
Beş 3.2. Xwendin û Nivîsandina Pêşîn	3.3.1. Nivîsê rast û herikbar bi deng dixwîne.	3.3.1.1. Bêyî kîtkirin dixwîne. 3.3.1.2. Peyvên di nivîsê de cih digirin rast dixwîne. 3.3.1.3. Herikbar dixwîne.	Ji bo tevgera armanckirî 3.3.1.1. xwendina bêyî kîtkirin, xwendina bêyî sekinîna li ser deng û kîtan e. Ji bo diyarkirina hejmara peyvên rast ên bêyî kîtkirin tîr xwendin divê yekeyî "hejmara peyvên di hemû nivîsê de bêyî kîtkirin tîr xwendin" be. Ji bo tevgera armanckirî 3.3.1.3. xwendina herikbar sê pêkhate hene: xwendina rast, leza xwendinê û xwendina bi girankirin û tonlandinê (prozodî). Ji bo kesên bêyî kîtkirin û rast dixwînin dikare xwendina herikbar û xwendina bi girankirin û tonlandinê jî bibe armanckirin. Ji bo diyarkirina performansa xwendina herikbar divê yekeyî "hejmara peyvên di deqeyekê de tîr xwendin" be. Ji bo armanca 3.3.1. teknîka xwendina modelî-xwendina dubarekirî yan jî xwendina modelî-xwendina dubarekirî-rastkirina şaşiyên dikare wek pakêta stratejiyê an jî bi hîlbijartina ji nav van stratejiyan bibe bikaranîn da ku tevgerên armanckirî yê di vê armancê de cih digirin bîr pêşxistin.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 3.3. Xwendina Herikbar û Têgihiştina Xwendinê	3.3.2. Hêmanên di avahiyên nivîsê de diyar dike.	Kêmdîtî/Kor 3.3.2.1. Karakterê/karakterên sereke yê nivîsa xeyalî diyar dike. 3.3.2.2. Karakterên alîkar ên nivîsa xeyalî diyar dike. 3.3.2.3. Cihê ku bûyer tê de qewimiye di nivîsa xeyalî de diyar dike. 3.3.2.4. Dema ku bûyer tê de qewimiye di nivîsa xeyalî de diyar dike. 3.3.2.5. Bûyerên sereke yê di nivîsa xeyalî de diyar dike. 3.3.2.6. Beşên ku pênase tê de tê kirin di nivîsa agahîdar de diyar dike. 3.3.2.7. Beşên ku tîkiliya sedem-encam tê de heye di nivîsa agahîdar de diyar dike. 3.3.2.8. Beşên ku berhevdan tê de tê kirin di nivîsa agahîdar de diyar dike. 3.3.2.9. Beşên ku rêzkirin tê de tê kirin di nivîsa agahîdar	Nivîsa xeyalî; cureyên wek fabl, çîrok, efsane, roman hwd. dihevwîne. Nivîsa agahîdar; nivîsên di pirtûkên dersê de cih digirin (pênasekirin, sedem-encam, pîrgirêk-çareserî, berhevdan, rêzkirin), gotar, nivîsên quncikê hwd. dihevwîne. Ji bo armanca 3.3.2. divê ji bo ku xwendekar bikaribe hêmanên avahiya nivîsê diyar bike, hînkirina avahiya nivîsê bibe kirin. Di hînkirina avahiya nivîsê de divê tenê cureyek bibe hînkirin, paşê derbasî cureyeke din a nivîsê bibe. Di hînkirina avahiya nivîsê de; divê beşên nivîsê di şemayeke li gorî cureya nivîsê de bîr nasandin, nivîsek bibe xwendin û hêmanên nivîsê di şemayê de bîr tîjîkirin, kara bicihkirina di şemayê de li ser çend nivîsên heman cureyî di rûniştinê cuda de bibe dubarekirin, paşê dîsa nivîseke heman cureyî bibe dayîn û ji bo ku xwendekar şemayê tîjî bike jê re rêber bibe bîr. Divê ev pêvajoyê bi çend rûniştinan bi nivîsê cuda yê heman cureyî bibe domandin. Divê ev hînkirin heta ku xwendekar di kara tîjîkirina şemayê de serbixwe bibe, bersiva pirsên têgihiştinê rast bide yan jî nivîsê bi rêz û bi awayekî ku hemû yekeyên agahiyê yê girîng bihevwîne vebêje bibe domandin. Di dawiya rûniştinê tîr kirin de divê pirsên têgihiştina

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		de diyar dike. 3.3.2.10. Beşên pirsgirêk-çareserî yên di nivîsa agahîdar de diyar dike.	nivîsê ji xwendekar bîn pirsîn. Di hînkirina avahiya nivîsê de herwiha divê bi dayîna nivîsên cureyên cuda ji xwendekar re bê ferkin ku nivîsa avahiya wê hatiye hînkirin ji kîjan cureyî ye.
Beş 3.3. Xwendina Herikbar û Têgihiştina Xwendinê	3.3.3. Stratejiyên têgihiştina nivîsê yên berî xwendinê pêk tîne.	Kêmdîtin/Kor 3.3.3.1. Berî xwendinê armanca xwendinê diyar dike. 3.3.3.2. Bi rêya wêneyê di nivîsê de li ser naveroka nivîsê texmînan dike. 3.3.3.3. Bi rêya sernavê nivîsê li ser naveroka nivîsê texmînan dike.	Têgihiştina nivîsê pêvajoyeke dînamîk e. Divê stratejiyên berî xwendinê, di dema xwendinê de û piştî xwendinê bi hev re bîn bikaranîn (bnr. armanca 3.3.3., 3.3.4. û 3.3.5.). Divê şiroveyên ji bo van armancan hatine nivîsandin bîn xwendin û pêvajoyê bê pêkanîn. Piştî ku pêvajoyê hate pêkanîn divê pirsên têgihiştina nivîsê ji kes bîn pirsîn. Ji bo tevgera armanckirî 3.3.3.1. divê bi kes re bê nîqaşkirin ku nivîs wê bi çî armancê bê xwendin (mînak zanîna li ser şêran, derxistina kurteyê, dayîna bersiva pirsan, fêrbûna çawaniya kirina karekî hwd.). Bi vî awayî hûn dikarin xwendina bi armanc a kes peyda bikin. Ev, li stîla xwendinê ya kes tesîr dike. Ji bo tevgera armanckirî 3.3.3.2. û 3.3.3.3. divê bi rêya dîmenî (wêneyê bilind/sembola taktîl) û sernavî li ser nivîsa wê bê xwendin, bi 1-2 deqeyan berçavdayîna nivîsê texmînen kes bîn wergirtin. Berçavdayîna divê bi rêya xwendina sernavên di nivîsê de ger hebin û xwendina hevokên destpêkê yên nivîsê bê kirin. Divê texmînen ji kes werdigirin bîn nivîsandin û dema derbasî xwendina nivîsê bû bi tiştên di nivîsê de ne bîn berhevdan. Ji bo tevgera armanckirî 3.3.3.2. ji kes re tê vegotin ku di wêneyê têkildarî nivîsê de çî hene, bi betimandinê. Mînak kesek li ser giyayan rûniştîye, destê xwe li serê kûçikê li kêleka wî razayî dixê. Piştî vegotinê jê tê xwestin ku bi rêya van tiştên hatine vegotin li ser naveroka nivîsê texmînekê bike. Di tevgera armanckirî 3.3.3.2. de piştî ku wêneyê di nivîsê de tê betimandin, kes bi rêya betimandinê li ser naveroka nivîsê texmînan dike. Bi rêya wêneyê bilind ê di nivîsê de kes li ser naveroka nivîsê texmînan dike.
Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 3.3. Xwendina Herikbar û Têgihiştina Xwendinê	3.3.4. Stratejiyên têgihiştina nivîsê yên di dema xwendinê de pêk tîne.	Kêmdîtin/Kor 3.3.4.1. Agahiyên girîng ên di nivîsê de ji agahiyên negirîng vediqetîne. 3.3.4.2. Piştî ku her paragrafêkê dixwîne li ser naveroka paragrafa dûre texmînekê dike. 3.3.4.3. Beşên jê fêr nake bi hêdîkirina xwendina xwe ji nû ve dixwîne.	Ji bo tevgera armanckirî 3.3.4.1. mebest ji agahiya girîng, li gorî cureya nivîsê diguhere. Yekeyên agahiyê yên girîng avahiya nivîsê pêk tînin. Mînak yekeyên agahiyê yên girîng ên nivîsên cureya çîrokê; cih, dem, karakter, pirsgirêk, hewldanên ji bo çareserkirina pirsgirêkê tên kirin, encam û bersiva lehengî li hember bûyerê ye. Ji bo ku kes bikaribe agahiyên girîng ji agahiyên negirîng vebiqetîne divê hişmendiya avahiya nivîsê hebe. Herwiha divê mamoste bi deng bilind bifikire û model be ka agahiyên girîng çawa tên diyarkirin. Dema agahiyên girîng tên diyarkirin divê an bin wan bîn xêzkirin an jî di şemayeke li gorî avahiya nivîsê de (şemaya çîrokê, şemaya berhevdanê, şemaya têgehê, şemaya herikîna hwd.) bîn bicihkirin.

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
			Ji bo kesên kor dikare jê bê xwestin ku agahiyên girîng not bigire. Ji bo tevgera armanckirî 3.3.4.2. di her paragrafa nivîsê de berî ku derbasî paragrafa dûre bibe wergirtina texmînên kes û berhevdana wan bi texmînên berê re, di girêdana agahiyên pêşîn ên kes bi tiştên di nivîsê de ne û ji ber vê yekê di têgihiştina nivîsê de rolekê dilîze. Ji ber vê yekê, divê stratejiyên berî xwendinê, di dema xwendinê de û piştî xwendinê bi hev re bên bikaranîn. Ji bo tevgera armanckirî 3.3.4.3. ji bo ku ev tevgera armanckirî ji kes re bê qezenckirin divê model û rêber bê bûn. Di heman demê de divê mamoste diyar bike ka çima vê dike.
Beş 4.3. Hejmar	4.3.2. Tiştan/wêneyên tiştan, deng û tevgeran dijmêre.	4.3.2.1. Tiştên/wêneyên tiştan ên di navbera 1-10 de yên li kêleka hev bi rêz in yek bi yek dijmêre. 4.3.2.2. Tiştên/wêneyên tiştan ên di navbera 1-10 de yên bi tevlihevî hatine rêzkirin yek bi yek dijmêre. 4.3.2.3. Hejmara dengekî diyar ê di navbera 1-10 de dubare dibe (wek dengê daholê, lêdana zengilê, çepikê) dibêje. 4.3.2.4. Hejmara tevgerê diyar a di navbera 1-10 de dubare dibe (wek bazdan, gav) dibêje.	Di tevgera armanckirî 4.3.2.1. û 4.3.2.2. de ji bo kesên kor divê li şûna wêneyên tiştan bi kartên taktîl ên ku tişt tê de bi awayekî bilindkirî hatine amadekirin bê xebitîn. Bi kesên kêmdîtî re wê bi her duyan re jî xebat bê kirin. Ji bo armanca 4.3.2. divê stratejiyên jimartinê yên wek destdana yek bi yek li tişt yan wêneyan, veguhastina tiştan ji cihekî bo cihekî din, xêzkirina ser wêneyên tiştan her ku tên jimartin, şopandina rêzeke stûnî yan berwarî hwd. ji kesan re bî hînkirin.
Beş 4.3. Hejmar	4.3.3. Pirraniya ku li hember hejmarekê heta 10'ê tê wek dane diyar dike.	4.3.3.1. Hejmara 1-10 dane tişt/wêneyê tiştî bêyî jimartin dibêje. 4.3.3.2. Komeke tiştan dijmêre û hejmara wan dibêje. 4.3.3.3. Tiştên di wêneyî de dijmêre û hejmara wan dibêje. 4.3.3.4. Ji nav komeke tiştan bi hejmara tê xwestin tiştan dijmêre û vediqetîne. 4.3.3.5. Dibêje ku dema 1-10 dane tişt/wêneyê tiştî bi awayekî cuda tên bicihkirin hejmara tiştî/wêneyê tiştî naguhere. 4.3.3.6. Dema tu tişt tune be dibêje ku hejmara tiştan sifir e.	Di hemû tevgerên armanckirî yên ku di armanca 4.3.3. de gotina wêneyên tiştan tê de derbas dibe, ji bo kesên kor divê bi kartên taktîl ên ku tişt tê de bi awayekî bilindkirî hatine amadekirin bê xebitîn. Bi kesên kêmdîtî re wê hem bi tiştan hem jî bi wêneyên tiştan xebat bê kirin. Ji bo tevgera armanckirî 4.3.3.1 gotina "bêyî jimartin", tê wateya ku kes bêyî ku serî li şiyana jimartinê bide di cih de bibêje hejmara tiştan çend dane ye. Piştî ku ev şiyana hate qezenckirin divê gotina hejmara 5-10 dane tişt/wêneyê tiştî bêyî jimartin bê xebitandin. Kevirên domînoyê yên xalên wan di rêzeke diyar de ne, zar û kubên hejmarê yên wek zarê, materyalên dîtinî yên guncaw in ku wê ji bo pêşxistina şiyana bi yek nihêrînê û bêyî jimartin têgihiştina hejmara tiştan (subitîzasyon) bî bikaranîn. Tevgera armanckirî 4.3.3.4. ber bi prensîba parastina hejmarê ve ye. Dema tişt û wêneyên tiştan tên jimartin tê girankirin ku hejmara herî dawî tê gotin mîqdara tiştan diyar dike.
Beş 4.3. Hejmar	4.3.4. Reqeman dixwîne û dinivîse.	4.3.4.1. Reqeman dixwîne. 4.3.4.2. Reqema tê xwestin ji nav reqemên din nîşan dide. 4.3.4.3. Reqeman bi nihêrîna li modelê/piştî destdanê dinivîse. 4.3.4.4. Reqemeke di navbera 0-9 de tê gotin dinivîse.	Ji bo armanca 4.3.4. wê bi kesên kor re bi braille û bi kesên kêmdîtî re bi nivîsa çapkirî bê xebitîn. Ji bo kesên kêmdîtî divê punto ya li gorî taybetmendiyên dîtinê yên kes, ji bo kesên kor jî li gorî pêşketina wan amûrên wek qasa kubkevîran, daktîloya braille bî bikaranîn. Di hînkirina reqeman a bi nivîsa çapkirî de divê ji 1'ê bê destpêkirin, herî dawî reqema sifirê bê hînkirin. Divê bal li aliyê nivîsandina reqeman bê kişandin. Di reqemên braille de li gorî wekheviya sembolan ev rêz dikare biguhere.
Beş 4.3. Hejmar	4.3.5. Hejmaran bi sembolan diyar dike.	4.3.5.1. Hejmara komeke tiştan a heta 4'ê bi reqem dinivîse. 4.3.5.2. Ji bo diyarkirina hejmareke di navbera 1-4 de bi qasî wê hejmarê tişt/şekl/wêne nîşan dide/xêz dike.	Ji bo tevgera armanckirî 4.3.5.2. divê bi kesên kor re bi bikaranîna tiştan bê xebitîn. Bi kesên kêmdîtî re divê hem bi bikaranîna tiştan hem jî bi xêzkirinê bê xebitîn.
Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 4.3. Hejmar	4.3.6. Hejmarên ji 1'ê heta 4'ê rêz dike.	4.3.6.1. Hejmarên ji 1'ê heta 4'ê bi awayekî birêz dinivîse. 4.3.6.2. Hejmara piştî hejmareke di navbera 1-4 de tê dayîn tê dinivîse.	Di armanca 4.3.6. de divê bi kesên kêmdîtî re nivîsa bi punto mezin, bi kesên kor re nivîsa braille bê bikaranîn.

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		4.3.6.3. Hejmara berî hejmareke di navbera 1-4 de tê dayîn tê dinivîse. 4.3.6.4. Hejmara kêr ji hejmarên birêz ên ji 1'ê heta 4'ê tên dayîn dinivîse. 4.3.6.5. Hejmarên ji 1'ê heta 4'ê yên bi rêza tevlihev tên dayîn rêz dike. 4.3.6.6. Hejmara/hejmarên kêr hatine hiştin ên di rêzhejmara ji 1'ê heta 4'ê tê dayîn de bi hejmarên tên dayîn temam dike. 4.3.6.7. Hejmara/hejmarên kêr hatine hiştin ên di rêzhejmara ji 1'ê heta 4'ê tê dayîn de dinivîse.	Di hînkirina tevgera armanckirî 4.3.6.2., 4.3.6.3., 4.3.6.4. û 4.3.6.7. de divê ji kes bê hêvîkirin ku binivîse. Lê belê li ba kesê ku ne xwedî şîyanên nivîsandinê ye divê tevgera gotinê bê xebitandin.
Beş 4.3. Hejmar	4.3.7. Bi hev kirina yek bi yek a du komên tiştan, di navbera hejmarên tiştan ên koman de berhevdanê dike.	4.3.7.1. Du komên tiştan ên bi heman hejmarê yên di navbera 1-4 de yek bi yek hev dike û dibêje ku wekhev in. 4.3.7.2. Bi alîkariya hev kirina yek bi yek a du komên tiştan ên bi hejmara cuda yên di navbera 1-4 de dibêje ku komeke tiştan ji ya din kêmtir e. 4.3.7.3. Bi alîkariya hev kirina yek bi yek a du komên tiştan ên bi hejmara cuda yên di navbera 1-4 de dibêje ku komeke tiştan ji ya din bêtir e.	Di hemû tevgerên armanckirî de du komên tiştan (mînak serpoşên gazozê û fasûlye) yek bi yek tên hev kirin. Bi kirina xebatên hev kirinê yên bi du komên tiştan divê têgehên “bêtir”, “kêmtir” û “wekhevî” bên xebitandin. Di dema xebatên hev kirinê de divê bê peyda kirin ku kes encama berhevdana du komên tiştan û wêneyên tiştan wek “4 qelem, ji 2 qeleman bêtir e.” yan jî “1 kulîlk, ji 3 kulîlkan kêmtir e.” diyar bikin. Di xebatên hev kirinê de divê bi awayekî ku cudahiya di navbera du komên tiştan de yek yan du be, li ser gotinên yek bêtir/du bêtir, yek kêmtir/du kêmtir bê xebitîn.
Beş 4.3. Hejmar	4.3.8. Du hejmarên di navbera 1-4 de berhev dike.	4.3.8.1. Du hejmarên di navbera 1-4 de berhev dike û dibêje ku her du hejmar wekhev in. 4.3.8.2. Du hejmarên di navbera 1-4 de berhev dike û ya mezin dibêje. 4.3.8.3. Du hejmarên di navbera 1-4 de berhev dike û ya piçûk dibêje.	Ji bo armanca 4.3.8. divê bi kesên kor re bi reqemên braille û bi kesên kêmdîtin re bi nivîsa çapkirî bê xebitîn.

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 4.4. Têkiliya Parçe-Tevahî	4.4.1. Têkiliya parçe-tevahî datîne.	4.4.1.1. Tiştê/wêneyê tevahî nîşan dide. 4.4.1.2. Tiştê/wêneyê nîvî nîşan dide. 4.4.1.3. Tiştê/wêneyê çaryek nîşan dide. 4.4.1.4. Tevahiyeke li du parçeyên wekhev veqetîne. 4.4.1.5. Bi girêdana du nîvan tevahiyeke çêdike. 4.4.1.6. Dibêje ku yek ji du parçeyên wekhev ên tevahiyeke nîv e. 4.4.1.7. Dibêje ku du nîv tevahiyeke pêk tînin. 4.4.1.8. Dibêje ku tevahiyeke ji du nîvan pêk tê. 4.4.1.9. Tevahiyeke li çar parçeyên wekhev veqetîne. 4.4.1.10. Bi girêdana 4 çaryekan tevahiyeke çêdike. 4.4.1.11. Dibêje ku yek ji 4 parçeyên wekhev ên tevahiyeke çaryek e.	Di hînkirina armanca 4.4.1. de divê bi kesên kor re tenê bi bikaranîna tiştan bê xebitîn. Divê hemû tevgerên armanckirî bi armanç û tevgerên armanckirî yên li ser têkiliya parçe-tevahî yên di modula Piştgiriya Fêrbûnê de hene re bên xebitandin.

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		4.4.1.12. Dibêje ku tevahiyeke ji 4 çarçekan pêk tê. 4.4.1.13. Ji du çarçekan nîvekê çêdike. 4.4.1.14. Dibêje ku du çarçekan nîvekê pêk tînin.	
Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 4.5. Komkirin û Kêmkirina Zû	4.5.1. Bi hejmarên ku komjimara wan ji 4'ê derbas nabe kirina komkirinê dike.	4.5.1.1. Li koma tiştan bi qasî hejmara tê diyarkirin tişt zêde dike. 4.5.1.2. Dibêje ku hejmara koma tişt lê zêde kiriye zêde bûye/pirtir bûye. 4.5.1.3. Kirinên komkirinê yên ku komjimara wan ji 4'ê derbas nabe bi tiştên rastîn model dike û dike. 4.5.1.4. Kirinên komkirinê yên ku komjimara wan ji 4'ê derbas nabe ji ber xwe dike. 4.5.1.5. Pirsgirêkên devkî yên ku kirina komkirinê ya komjimara wan ji 4'ê derbas nabe dixwazin bi tiştan/wêneyên tiştan model dike û çareser dike. 4.5.1.6. Pirsgirêkên devkî yên ku kirina komkirinê ya komjimara wan ji 4'ê derbas nabe dixwazin bi komkirina ji ber xwe çareser dike.	Ji bo armanca 4.5.1 divê wateyên kirina komkirinê yên anîna tiştên heman cureyî bal hev, zêdekirin, pirtirbûn, zêdebûn bi kirina xebatên modelkirinê bîn ferkin. Ji bo tevgera armanckirî 4.5.1.4. divê bi kesên kor re tenê bi bikaranîna tiştan bê xebitîn. Herwiha dema li ser vê tevgera armanckirî tê xebitîn divê xwendina kirinê ji kes re bê dayîn. Mînak divê gotinên bi awayê “2, 3 din çend dike?”, “Ger em 2 û 3'ê kom bikin çend dike?”, “Ger em li 2'yê 3 zêde bikin çend dike?” bîn bikaranîn. Di qezenckirina tevgerên armanckirî de dema komkirinê tê kirin û pirsgirêkên tî çareserkirin divê mînak ji jiyana rojane bîn dayîn. Di dema çareserkirina pirsgirêkê de divê peyvên mifteyî yên li ser kirina komkirinê yên wek “zêde bû”, “pirtir bû”, “zêdekirin”, “komjimar” hwd. bîn bikaranîn. Divê stratejiyên komkirinê yên wek temamkirina bo 3'ê, temamkirina bo 4'ê hwd. bîn hînkirin.
Beş 4.5. Komkirin û Kêmkirina Zû	4.5.2. Kirina kêmkirinê dike.	4.5.2.1. Navê tiştekî ku ji koma tiştan a ji bi kêmanî sê tiştên cuda pêk tê hatiye derxistin dibêje. 4.5.2.2. Ji komeke ku heman tişt tê de hene bi qasî hejmara tê diyarkirin tişt vediqetîne. 4.5.2.3. Dibêje ku hejmara koma tişt jê derxistiye kêmkirî/bûye/kêmtir bûye. 4.5.2.4. Bi tiştên rastîn ên ku li hember hejmarên di navbera 1-4 de tînin model dike û kirina kêmkirinê dike. 4.5.2.5. Bi hejmarên di navbera 1-4 de kirina kêmkirinê ya ji ber xwe dike. 4.5.2.6. Pirsgirêkên devkî yên ku bi hejmarên di navbera 1-4 de kirina kêmkirinê dixwazin bi tiştan/wêneyên tiştan model dike û çareser dike. 4.5.2.7. Pirsgirêkên devkî yên ku bi hejmarên di navbera 1-4 de kêmkirinê dixwazin bi kêmkirina ji ber xwe çareser dike.	Piştî ku li ser tevgera armanckirî 4.5.2.3. hate xebitîn divê rewşên ku bi zêdekirin û derxistina bi qasî hejmara tê diyarkirin tişt ji heman koma tiştan hejmara tiştan naguhêre jî bîn xebitandin. Ji bo tevgera armanckirî 4.5.2.6 di dema çareserkirina pirsgirêkê de divê peyvên mifteyî yên li ser kirina kêmkirinê yên wek “kêmkirî”, “derket”, “ya paşve dimîne”, “mayî”, “ma” hwd. bîn bikaranîn.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 4.6. Geometrî	4.6.1. Şeklên geometrîk cuda dike.	4.6.1.1. Şeklên geometrîk hev dike. 4.6.1.2. Ji nav şeklên geometrîk şeklê geometrîk ê tê xwestin nîşan dide. 4.6.1.3. Navê şeklê geometrîk ê tê nîşandan dibêje.	Di armanca 4.6.1. de şeklên geometrîk ên çargoşe, dorge, sêgoşe, dirêjgoşe pêşîn in. Divê çalakiyên ber bi danîna têkiliyê di navbera tiştên rastîn/wêneyên tiştan û şeklên geometrîk de bên kirin. Bi kesên kêmdîtin re divê tişt û wêneyên tiştan, bi kesên kor re divê tişt bên bikaranîn.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 4.7. Pîvandîn	4.7.1. Bi amûrên pîvandîne yê ne-standard pîvanê dike.	4.7.1.1. Ji bo pîvandîna dirêjahiyekê amûra pîvandîne ya ne-standard a guncaw hildibijêre. 4.7.1.2. Ji bo pîvandîna giraniyekê amûra pîvandîne ya ne-standard a guncaw hildibijêre. 4.7.1.3. Ji bo pîvandîna mîqdara şilekê amûra pîvandîne ya ne-standard a guncaw hildibijêre. 4.7.1.4. Bi amûrên pîvandîne yê ne-standard dirêjahiya tê diyarkirin dipîve. 4.7.1.5. Bi amûrên pîvandîne yê ne-standard giraniya tê diyarkirin dipîve. 4.7.1.6. Bi amûrên pîvandîne yê ne-standard mîqdara şileka tê diyarkirin dipîve. 4.7.1.7. Dirêjahiyekê, ji aliyê yekeyên ne-standard ve texmîn dike. 4.7.1.8. Giraniyekê, ji aliyê yekeyên ne-standard ve texmîn dike. 4.7.1.9. Mîqdara şilekê, ji aliyê yekeyên ne-standard ve texmîn dike. 4.7.1.10. Encamên pîvandîne bi encamên texmîn kirine re berhev dike.	Ji bo armanca 4.7.1. divê dema pîvandînê tê kirin bal bê kişandin ku xaleke destpêkê bê girtin, yeke di heman rasteyê de, bi awayekî ku di navbera wan de valahî nemîne û li ser hev nekevin bên bicihkirin. Wek amûrên pîvandîne yê ne-standard divê materyalên wek ta, qelem, lego, pirtûk, kevir, îskan, kevçî û amûrên pîvandîne yê xwezayî yê wek gav, pê, bask, tîlik, tilî, çeng bên bikaranîn. Di dema hînkirinê de divê bê girankirin ku dirêjahî, giranî û çewhera van amûran esas tê girtin.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 4.8. Dane	4.8.1. Cuda dike ku dem taybetmendiyeke tê pîvandîn e.	4.8.1.1. Bûyerên bi demeke kurt û dirêj ên di nav rojê de dibêje. 4.8.1.2. Bûyerên/wêneyên bûyeran ên xwedî demên cuda kom dike. 4.8.1.3. Du bûyerên/wêneyên bûyeran ên cuda li gorî kurt yan dirêjbûna wan berhev dike. 4.8.1.4. Bûyerên/wêneyên bûyeran ên xwedî demên cuda rêz dike.	Ji bo armanca 4.8.1. li ba koran divê berhevdana demê ya di navbera bûyerên tîndiyarkirin de bê xebitandin. Di vê armancê de divê bê peyda kirin ku kes dema dema di bûyeran de derbas dibe diyar dike tîgehên "kurt" û "dirêj" bi kar bîne. Ji bo bûyerên/wêneyên bûyeran ên xwedî demên cuda divê mînakên wek bi bisiklêtê çûna dibistanê, xwarina şîva êvarê, firçekirina diranan bên dayîn. Divê berhevdan bi awayê "Xwarina şîva êvarê, ji firçekirina diranan demeke dirêjtir digire." bê kirin.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 4.8. Dane	4.8.2. Tîgehên demê diyar dikin di nav axaftîne de li gorî çarçoveyê bi kar tîne.	4.8.2.1. Tîgehên ku beşên rojekê diyar dikin (sibe, nîvro, êvar, şev, roj hwd.) di nav axaftîne de li gorî çarçoveyê bi kar tîne.	Ji bo tevgera armanckirî 4.8.2.1 bi gotina "li gorî çarçoveyê" tê vegotin ku divê peyvên demê diyar dikin bi hember-wateya xwe ya di jiyana rastîn de bên bikaranîn. Mînak bikaranîna "Bi şev ez diçim dibistanê." yan jî "Duh ez ê biçim

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		4.8.2.2. Têgehên “Duh”, “Îro” û “sibê” di nav axaftinê de li gorî çarçoveyê bi kar tîne. 4.8.2.3. Gotinên ku demê diyar dikin (berê, niha, paşê, hinek din hwd.) di nav axaftinê de li gorî çarçoveyê bi kar tîne.	dibistanê.” ne li gorî çarçoveyê ye.
Beş 4.8. Dane	4.8.3. Tabloyên hêsan ên xwedî herî zêde du komên daneyan dixwîne.	4.8.3.1. Tabloyên hêsan ên bi bikaranîna sembolan hatine çêkirin dixwîne. 4.8.3.2. Tabloyên hêsan ên bi bikaranîna reqeman hatine çêkirin dixwîne. 4.8.3.3. Bersiva pirsên li ser tabloyên hêsan ên xwedî herî zêde du komên daneyan tên pirsîn dide.	Ji bo armanca 4.8.3. divê di xebatên xwendina tabloyê de tabloyên wek tabloya xwarina rojane, tevgerê, rêzikê, çalakiyê yên ku kes pir bi wan re rû bi rû dimînin bên bikaranîn. Divê sembol (stêrk, rûyê bişirîn hwd.) bên bikaranîn. Ji bo kesên kor divê tabloyên taktîl bên amadekirin. Divê dane bi hejmarên 1-4 bên sînardarkirin.
Beş 4.8. Dane	4.8.4. Tabloyên hêsan ên xwedî herî zêde du komên daneyan çêdike.	4.8.4.1. Tabloyên tevger/çalakiyê yên bi wêne bi bikaranîna sembolan tijî dike. 4.8.4.2. Tabloyên tevger/çalakiyê yên bi wêne bi bikaranîna reqeman tijî dike. 4.8.4.3. Bersiva pirsên li ser tabloyên hêsan ên xwedî herî zêde du komên daneyan ên çêkirine tên pirsîn dide.	Ji bo armanca 4.8.4. divê di xebatên çêkirina tabloyê de tabloyên wek tabloya xwarina rojane, tevgerê, rêzikê, çalakiyê yên ku kes pir bi wan re rû bi rû dimînin bên bikaranîn. Ji bo kesên kor divê tabloyên taktîl bên amadekirin. Wek sembol divê stêrk, rûyê bişirîn, tişt, wêne bên bikaranîn. Divê dane bi hejmarên 1-4 bên sînardarkirin.

5. Navê Modulê	MATEMATÎK
5. Armanca Modulê	Bi vê modulê tê armanckirin ku kesên bi kêmasiya dîtinê û kesên kêmdîtin di dema dibistanê de şiyarên herf bingehîn ên matematîkê fêr bibin û di şiyarên matematîkê yên pêşketî de serkeftî bin.
5. Beşên Modulê	Hejmar û Kirin, Geometrî, Pîvandî, Xebata Daneyan Şiroveyên Giştî yên li ser Modulê

Şiroveyên Giştî yên li ser Modulê

- Ev modul li ser bingeha Bernameya Hînkirinê ya Dersa Matematîkê ya MEB hatiye çêkirin. Di modulê de çar beş hene: “Hejmar û Kirin, Geometrî, Pîvandî û Xebata Daneyan” û armancên van beşan. Têvgerên armanckirî jî di çar astên cuda de hatine çêkirin: Ast 1, Ast 2, Ast 3, Ast 4. Tabloya rêzkirina stûnî ya astan a di nav xwe de û rêzkirina berwarî ya di navbera astan de di dawiya modulê de cih digire. Bi berçavgirtina performansên kesên li ser şiyarên matematîkê û astên di modulê de divê ji bo kesên armancên hînkirinê bîr diyarkirin. Divê kes piştî ku armanc û tevgerên armanckirî yên asteke pêk anîn derbasî asta pêş bibin. Ji bo kesên kor di xwendin û nivîsandina reqeman de divê tablet/daktîloya braille û qasa kubkevîran bîr bikaranîn. 3. Divê sembolen gotinên matematîkî yên wek komkirin, kêmkirin, carkirin, dabeşkirin, wekhev e, beşik, zaviye, xêza rast, parçeya xêza rast û tîrêj ên di nivîsa braille de bîr hînkirin. Ji bo van sembolan dikare “Rêbera Matematîkê ya Braille (MEB, 2017)” bîr bikaranîn. Ji bo kesên kor divê xêza hejmaran, wek bilind û taktîl bîr amadekirin. Ji bo kesên kor divê cih ji dubarekirinê bes re bîr dayîn.
- Armanç Şirove Têvgerên Armanckirî

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.1. Rîtmîk dijmêre.	Ast 1 5.1.1.1. Ji 1'ê heta 100'ê ber bi pêş ve yek bi yek rîtmîk dijmêre. 5.1.1.2. Bi destpêkirina ji hejmareke di navbera 1-20 de tê dayîn ber bi pêş ve yek bi yek rîtmîk dijmêre. 5.1.1.3. Ji 1'ê heta 100'ê ber bi pêş ve deh bi deh rîtmîk dijmêre. 5.1.1.4. Ji 1'ê heta 100'ê ber bi pêş ve pênc bi pênc rîtmîk dijmêre. 5.1.1.5. Heta 20'ê ber bi pêş ve du bi du rîtmîk dijmêre. 5.1.1.6. Bi destpêkirina ji 20'ê ber bi paş ve yek bi yek rîtmîk dijmêre. 5.1.1.7. Bi destpêkirina ji 20'ê ber bi paş ve du bi du rîtmîk dijmêre. Ast 2 5.1.1.8. Ji 100'ê ber bi paş ve du bi du rîtmîk dijmêre. 5.1.1.9. Ji 1'ê heta 30'ê ber bi pêş ve sê bi sê rîtmîk dijmêre. 5.1.1.10. Ji 30'ê heta 1'ê ber bi paş ve sê bi sê rîtmîk dijmêre. 5.1.1.11. Ji 1'ê heta 40'ê ber bi pêş ve çar bi çar rîtmîk dijmêre. 5.1.1.12. Ji 40'ê heta 1'ê ber bi paş ve çar bi çar rîtmîk dijmêre. 5.1.1.13. Bi destpêkirina ji hejmareke di navbera 1-30 de tê dayîn ber bi pêş ve sê bi sê rîtmîk dijmêre. 5.1.1.14. Bi destpêkirina ji hejmareke di navbera 1-30 de tê dayîn ber bi paş ve sê bi sê rîtmîk dijmêre. 5.1.1.15. Bi destpêkirina ji hejmareke di navbera 1-40 de tê dayîn ber bi pêş ve çar bi çar rîtmîk dijmêre. 5.1.1.16. Bi destpêkirina ji hejmareke di navbera 1-40 de tê dayîn ber bi paş ve çar bi çar rîtmîk dijmêre. Ast 3 5.1.1.17. Ji 1'ê heta 60'ê ber bi pêş ve şeş bi şeş rîtmîk dijmêre. 5.1.1.18. Ji 1'ê heta 70'ê ber bi pêş ve heft bi heft rîtmîk dijmêre. 5.1.1.19. Ji 1'ê heta 80'ê ber bi pêş ve heşt bi heşt rîtmîk dijmêre. 5.1.1.20. Ji 1'ê heta 90'ê ber bi pêş ve neh bi neh rîtmîk dijmêre. 5.1.1.21. Ji 100'ê heta 1000'ê ber bi pêş ve sed bi sed rîtmîk dijmêre.	Di hemû xebatên jimartina rîtmîk de divê cih ji pêkanînen hînkirinê yên bi rîtim û tevgera fizîkî yên wek çepikdan, tiliyçirtandin, hejandina marakasê hwd. re bê dayîn. Ji bo tevgera armanckirî 5.1.1.5. divê jimartina rîtmîk a du bi du ya ber bi pêş ve heta 100'ê bê firehkirin. Di xebatên jimartinê de divê xêza hejmaran, şerîdên hejmaran, tabloyên sedî bîn bikaranîn.

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		5.1.1.22. Ji 1000'ê ber bi paş ve sed bi sed rîtmîk dijmêre. 5.1.1.23. Bi destpêkirina ji hejmareke di navbera 1-1000 de tê dayîn ber bi pêş ve deh bi deh rîtmîk dijmêre. 5.1.1.24. Bi destpêkirina ji hejmareke di navbera 1-1000 de tê dayîn ber bi pêş ve sed bi sed rîtmîk dijmêre. Ast 4 5.1.1.25. Heta 10.000'ê hezar bi hezar rîtmîk dijmêre.	
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.2. Tiştan/wêneyên tiştan dijmêre.	Ast 1 5.1.2.1. Tiştên/wêneyên tiştan ên bi hejmara di navbera 1-20 de yên li kêleka hev bi rêz in yek bi yek dijmêre. 5.1.2.2. Tiştên/wêneyên tiştan ên bi hejmara di navbera 1-20 de yên bi tevlihevî hatine rêzêkirin yek bi yek dijmêre. Ast 2 5.1.2.3. Tiştên/wêneyên tiştan ên di komeke ku hejmara tiştan heta 100'ê ye de yek bi yek dijmêre. 5.1.2.4. Tiştên/wêneyên tiştan ên di komeke ku hejmara tiştan heta 100'ê ye de deh bi deh dijmêre. 5.1.2.5. Tiştên/wêneyên tiştan ên di komeke ku hejmara tiştan heta 100'ê ye de pênc bi pênc dijmêre. 5.1.2.6. Tiştên/wêneyên tiştan ên di komeke ku hejmara tiştan heta 100'ê ye de du bi du dijmêre. 5.1.2.7. Tiştên/wêneyên tiştan ên di komeke ku hejmara tiştan heta 30'ê ye de sê bi sê dijmêre. 5.1.2.8. Tiştên/wêneyên tiştan ên di komeke ku hejmara tiştan heta 40'ê ye de çar bi çar dijmêre.	Divê hînkirina armanca 5.1.2. û 5.1.3. bi hev re bê kirin. Bi taybetî di Asta 1'ê de divê bê peydakirin ku kes têbigihîjin ku dema tiştên di komên tiştan ên bi hejmareke diyar de dijmêrin, hejmara herî dawî tê gotin hejmara tiştan a di koma tiştan de ye. Ji bo kesên kor divê li şûna wêneyên tiştan wêneyên taktîl bînin bikaranîn. Di tevgera armanckirî 5.1.2.1. û 5.1.2.2. de divê stratejiyên jimartinê yên wek destdana yek bi yek li tişt yan wêneyan, veguhastina tiştan ji cihekî bo cihekî din, xêzkirina ser wêneyên tiştan her ku tên jimartin, şopandina rêzeke stûnî yan berwarî dema tên jimartin ji kesan re bînin hînkirin. Di qezenckirina tevgera armanckirî 5.1.2.4., 5.1.2.5., 5.1.2.6., 5.1.2.7. û 5.1.2.8. de divê pêşî kes bi xwe tiştan/wêneyên tiştan/wêneyên taktîl kom bike paşê bi tiştên/wêneyên tiştan/wêneyên taktîl ên wek komkirî tên dayîn bê xebitîn.
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.3. Pirraniya ku li hember hejmarekê heta 100'ê tê wek dane diyar dike.	Ast 1 5.1.3.1. Komeke tiştan a di navbera 1-20 de dijmêre û hejmara wan dibêje. 5.1.3.2. Komeke tiştan a di navbera 1-20 de ya di wêneyî de dijmêre û hejmara wan dibêje. 5.1.3.3. Ji nav komeke tiştan a di navbera 1-20 de bi hejmara tê xwestin tiştan dijmêre û vediqetîne. 5.1.3.4. Du komên tiştan ên di navbera 1-10 de dijmêre. Ast 2 5.1.3.5. Komeke tiştan a di navbera 20-100 de ya di wêneyî de dijmêre û hejmara wan dibêje.	Dema li ser armanca 5.1.3. tê xebitîn divê cudahiya di navbera reqem û hejmarê de bê girankirin. Divê di jimartina tişt û wêneyên tiştan de bê girankirin ku hejmara herî dawî tê gotin mîqdara tiştan diyar dike.
Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.4. Hejmarên xwezayî dinivîse.	Ast 1 5.1.4.1. Dibêje ku pirraniya ji 10 hebûnên heman cureyî pêk tê destek e.	Reqem, di Modula Matematîka Zû de wek armanç cih digirin. Ji ber vê yekê di vê modulê de hejmarên xwezayî wek 10 û jor hatine armanckirin. Di rewşa ku pêdiviya kes bi reqeman hebe divê pêşî xebatên xwendin û nivîsandina

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		5.1.4.2. Dibêje ku pirraniya ji 12 hebûnên heman cureyî pêk tê dûzîneyek e. 5.1.4.3. Komeke tiştan/wêneyên tiştan a di navbera 10-20 de (10 û 20 tê de) li dehik û yekikên wê vediqetîne. 5.1.4.4. Hejmara dehik û yekikên komeke tiştan/wêneyên tiştan a di navbera 10-20 de dibêje. 5.1.4.5. Hejmara ku li hember koma tiştan a di navbera 10-20 de ya li dehik û yekikên wê veqetandiye tê dinivîse. 5.1.4.6. Hejmara ku li hember koma tiştan a di navbera 10-20 de ya li dehik û yekikên wê veqetandiye tê dixwîne. 5.1.4.7. Hejmarên di navbera 1-20 de dixwîne. 5.1.4.8. Hejmareke di navbera 1-20 de ya tê gotin bi reqem dinivîse. Ast 2 5.1.4.9. Pirraniyeke ku hejmara tiştan ji 100'ê kêmtir e bi bikaranîna modelê li dehik û yekikên wê vediqetîne. 5.1.4.10. Hejmara dehik û yekikên pirraniya ku li komên dehik û yekikan veqetandiye dibêje. 5.1.4.11. Hejmara ku li hember pirraniyeke di navbera 20-100 de ya li dehik û yekikên wê veqetandiye tê dinivîse. 5.1.4.12. Hejmara ku li hember pirraniyeke di navbera 20-100 de ya li dehik û yekikên wê veqetandiye tê dixwîne. 5.1.4.13. Hejmarên xwezayî yên du payeyî dixwîne. 5.1.4.14. Hejmarên xwezayî yên du payeyî yên tîn gotin bi reqem dinivîse. Ast 3 5.1.4.15. Pirraniyeke ku hejmara tiştan 100-1000 e bi bikaranîna modelê li sedik, dehik û yekikên wê vediqetîne. 5.1.4.16. Hejmara sedik, dehik û yekikên pirraniya ku li sedik, dehik û yekikan veqetandiye dibêje. 5.1.4.17. Hejmara ku li hember pirraniyeke di navbera 100-1000 de ya li sedik, dehik û yekikên wê veqetandiye tê dinivîse. 5.1.4.18. Hejmara ku li hember pirraniyeke di navbera 100-1000 de ya li sedik, dehik û yekikên wê veqetandiye tê dixwîne. 5.1.4.19. Hejmarên xwezayî yên sê payeyî dixwîne. 5.1.4.20. Hejmarên xwezayî yên sê payeyî yên tîn gotin bi reqem dinivîse. Ast 4 5.1.4.21. Hejmarên xwezayî yên 4, 5 û 6 payeyî dixwîne. 5.1.4.22. Hejmarên xwezayî yên 4, 5 û 6 payeyî yên tîn gotin bi reqem dinivîse.	reqeman bîn kirin. Di hînkirina reqeman de divê reqem bi hejmarê re bîn girêdan û bîn xebitandin. Dema li ser armanca 5.1.4. tê xebitîn divê wek model blokên bingeha dehikî û dîmenên blokên bingeha dehikî bîn bikaranîn. Di armanca 5.1.4. de dema ji bo kesên kor tê xebitîn divê guncandinên pêwîst (mezindahiya punto ya reqeman hwd.) bîn kirin, cih ji bikaranîna materyalên guncaw re bê dayîn (tablet/daktîloya braille û qasa kubkevîran), dubarekirinên bes bîn kirin.

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.5. Navên payeyan û nîrxên payeyan ên hejmarên xwezayî dinivîse.	Ast 2 5.1.5.1. Navên payeyan ên hejmarên xwezayî yên ji 100'ê piçûktir li ser modelan dinivîse. 5.1.5.2. Nîrxên payeyan ên hejmarên xwezayî yên ji 100'ê piçûktir dinivîse. Ast 3 5.1.5.3. Navên payeyan ên hejmarên sê payeyî li ser modelan dinivîse. 5.1.5.4. Nîrxên payeyan ên hejmarên sê payeyî li ser modelan dinivîse. 5.1.5.5. Hejmarên sê payeyî hildiweşîne. Ast 4 5.1.5.6. Navên payeyan ên hejmarên xwezayî yên 4, 5 û 6 payeyî dinivîse. 5.1.5.7. Nîrxên payeyan ên hejmarên xwezayî yên 4, 5 û 6 payeyî dibêje/dinivîse. 5.1.5.8. Hejmarên 4, 5 û 6 payeyî li koman vediqetîne. 5.1.5.9. Hejmarên 4, 5 û 6 payeyî hildiweşîne.	Dema li ser armanca 5.1.5. tê xebitîn divê wek model blokên bingeha dehişkî û dîmenên blokên bingeha dehişkî bîr bîkaranîn. Di hînkirina tevgera armanckirî 5.1.5.1., 5.1.5.2., 5.1.5.3., 5.1.5.4., 5.1.5.5. û 5.1.5.6. de divê ji kes bê hêvîkirin ku binivîse. Lê belê li ba kesê ku ne xwedî şîyanên nivîsandinê ye divê tevgera gotinê bê xebitandin.
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.6. Hejmarên xwezayî rêz dike.	Ast 1 5.1.6.1. Hejmarên ji 1'ê heta 20'ê bi awayekî birêz dinivîse. 5.1.6.2. Hejmara piştî hejmareke di navbera 1-20 de tê dayîn tê dinivîse. 5.1.6.3. Hejmara berî hejmareke di navbera 1-20 de tê dayîn tê dinivîse. 5.1.6.4. Hejmarên ji 1'ê heta 20'ê yên bi rêza tevlihev tînin dayîn li gorî rêza jimartinê rêz dike. 5.1.6.5. Hejmara/hejmarên kêr hatine hiştin ên di rêzhejmara ji 1'ê heta 20'ê de dayîn de dinivîse. Ast 2 5.1.6.6. Hejmara piştî hejmareke di navbera 1-100 de tê dayîn tê dinivîse. 5.1.6.7. Hejmara berî hejmareke di navbera 1-100 de tê dayîn tê dinivîse. 5.1.6.8. Herî zêde 4 hejmarên xwezayî yên di navbera 1-100 de bi rêza tevlihev tînin dayîn li gorî rêza jimartinê rêz dike. 5.1.6.9. Hejmarên kêr hatine hiştin ên di rêzhejmareke bi hejmarên xwezayî yên ji 100'ê piçûktir hatiye çêkirin de dinivîse.	Dema li ser armanca 5.1.6. tê xebitîn divê bi bîkaranîna gotinên “berê”, “paşê” û “di navbera” têgihiştina tîkiliya li pey hev a di navbera hejmaran de bê peyda kirin. Di hînkirina tevgera armanckirî 5.1.6.2., 5.1.6.3., 5.1.6.5., 5.1.6.6., 5.1.6.7. û 5.1.6.9. de divê ji kes bê hêvîkirin ku binivîse. Lê belê li ba kesê ku ne xwedî şîyanên nivîsandinê ye divê tevgera gotinê bê xebitandin.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.7. Bi hev kirina yek bi yek a du komên tiştan, di navbera hejmarên tiştan ên koman de berhevdanê dike.	Ast 1 5.1.7.1. Du komên tiştan ên bi heman hejmarê yên di navbera 1-20 de yek bi yek hev dike û dibêje ku wekhev in. 5.1.7.2. Du komên tiştan ên bi hejmara cuda yên di navbera 1-20 de yek bi yek hev dike û dibêje ku komeke tiştan ji ya din kêmtir e. 5.1.7.3. Du komên tiştan ên bi hejmara cuda yên di navbera 1-20 de hev dike û dibêje ku komeke tiştan ji ya din bêtir e.	Di hînkirina hemû tevgerên armanckirî de divê du komên tiştan (mînak serpoşên gazozê û fasûlye) yek bi yek bî hev kirin. Bi kirina xebatên hevkinê yên bi du komên tiştan divê têgehên “bêtir”, “kêmtir” û “wekhevî” bî xebitandin. Di dema xebatên hevkinê de divê bê peyda kirin ku kes encama berhevdana du komên tiştan û wêneyên tiştan wek “12 qelem, ji 5 qeleman bêtir e.” yan jî “8 kulîlk, ji 11 kulîlkan kêmtir e.” diyar bikin.
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.8. Hejmarên xwezayî berhev dike.	Ast 1 5.1.8.1. Du hejmarên di navbera 10-20 de berhev dike û dibêje ku her du hejmar wekhev in. 5.1.8.2. Du hejmarên di navbera 10-20 de berhev dike û ya mezin dibêje. 5.1.8.3. Du hejmarên di navbera 10-20 de berhev dike û ya piçûk dibêje. Ast 2 5.1.8.4. Herî zêde çar hejmarên xwezayî yên ji 100'ê piçûktir berhev dike û ya mezin/ya herî mezin dibêje. 5.1.8.5. Herî zêde çar hejmarên xwezayî yên ji 100'ê piçûktir berhev dike û ya piçûk/ya herî piçûk dibêje. 5.1.8.6. Herî zêde çar hejmarên xwezayî yên ji 100'ê piçûktir ji mezin ber bi piçûk/ji piçûk ber bi mezin rêz dike. Ast 3 5.1.8.7. Herî zêde pênc hejmarên xwezayî yên ji 1000'ê piçûktir berhev dike û dibêje kîjan mezin/herî mezin e. 5.1.8.8. Herî zêde pênc hejmarên xwezayî yên ji 1000'ê piçûktir berhev dike û dibêje kîjan piçûk/herî piçûk e. 5.1.8.9. Herî zêde pênc hejmarên xwezayî yên ji 1000'ê piçûktir bi bikaranîna sembolên “>” û “<” ji mezin ber bi piçûk/ji piçûk ber bi mezin rêz dike. Ast 4 5.1.8.10. Hejmarên xwezayî yên herî zêde şeş payeyî bi bikaranîna sembola mezin/piçûk rêz dike.	Dema li ser tevgera armanckirî 5.1.8.1., 5.1.8.2. û 5.1.8.3. tê xebitîn dikare cih ji berhevdana hejmarên di navbera 1-20 de jî bê dayîn. Dema li ser tevgera armanckirî 5.1.8.6. tê xebitîn divê di rêz kirinê hejmaran de sembolên mezinahî-piçûkahiyê neyên bikaranîn, divê bi bikaranîna bêhnokê di navbera hejmaran de rêz kirin bê kirin. Ji bo kesên kor divê di qasa kubkevîran de bi hiştina valahiya qutîkekê rêz kirin bê kirin. Dema li ser tevgera armanckirî 5.1.8.10. tê xebitîn divê pêşî bi hejmarên xwezayî yên çar payeyî, paşê bi hejmarên xwezayî yên pênc payeyî û şeş payeyî bi bikaranîna sembolê xebatên rêz kirinê bî kirin. Herî dawî divê hejmarên çar, pênc û şeş payeyî bi tevlihevî bî dayîn û xebatên rêz kirinê bî kirin. Di armanca 5.1.8. de dema bi kesên kor re tê xebitîn divê guncandinên pêwîst (mezinahiya punto ya reqeman hwd.) bî kirin, cih ji bikaranîna materyalên guncaw re bê dayîn (tablet/daktîloya braille û qasa kubkevîran), ji bo kes dubare kirinê bes bî kirin.
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.9. Hejmaran bi armanca diyarkirina rêzê bi kar tîne.	Ast 1 5.1.9.1. Rêza tiştên/wêneyên tiştan ên di nav rêzeke rêz kirî de dibêje. 5.1.9.2. Tiştê/wêneyê tiştî yê ku rêza wî di nav rêzeke rêz kirî de tê gotin nîşan dide. 5.1.9.3. Hejmara ku rêzê diyar dike dixwîne. 5.1.9.4. Hejmara ku rêzê diyar dike dinivîse.	Dema li ser armanca 5.1.9. tê xebitîn divê rêzeke rêz kirî ji tiştên/wêneyên tiştan ên di navbera 1-20 de pêk were. Wek rêzhejmarekê divê dîmenên di çarçoveyê wateyî de hatine rêz kirin (pêşbaziya erebeyan, pêşbaziya bezê hwd.) / wêneyên taktîl bî bikaranîn.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.10. Li gorî rêzikeke diyar patrona hejmaran a zêde/kêm dibe çêdike.	Ast 2 5.1.10.1. Rêzika patrona hejmaran a ku cudahiya di navbera wan de sabit e dibêje. 5.1.10.2. Hêmana kêman hatiye hiştin a patrona hejmaran a ku cudahiya di navbera wan de sabit e dinivîse. Ast 3 5.1.10.3. Patrona hejmaran a ku cudahiya di navbera wan de sabit e herî zêde 4 gavan didomîne. 5.1.10.4. Li gorî rêzikeke diyar patrona hejmaran a yek-rêzikî ya zêde yan kêman dibe çêdike. Ast 4 5.1.10.5. Li gorî rêzikeke diyar patrona hejmaran a du-rêzikî ya zêde yan kêman dibe çêdike. 5.1.10.6. Rêzîkên patrona hejmaran a li gorî du rêzikan çêkiriye dibêje.	Berî ku li ser patronên hejmaran ên di armanca 5.1.10. de bê xebitîn divê armancên patronê yên di beşa Têgihîştina Dîtinê û Bîrê ya modula Piştigiriya Fêrbûnê de cih digirin û armancên li ser patronên geometrîk ên di beşa Geometriyê ya modula Matematîkê de (Asta 1. û 2.) bînin xebitandin. Dema xebatên li ser patronên hejmaran tên kirin divê bê peydakirin ku kes di patronêke ku cudahiya di navbera wan de sabit e û zêde yan kêman dibe de her terîmekê (hêmanekê) bi hejmara gavê re girê bide. Mînak di patrona 2, 5, 8, 11 ... de terîma yekem 2, terîma duyem 5 hwd. Dema li ser tevgera armanckirî 5.1.10.1. û 5.1.10.2. tê xebitîn divê ji bo ku rêzik di patronan de bê dîtin ji destpêkê ve bi kêmanî 3 hêman bînin dayîn. Mînak wek 5, 10, 15, ..., 25, ..., 35. Ji bo tevgera armanckirî 5.1.10.2. divê patronên hejmaran ên ku herî zêde du hêmanên wan nayên dayîn bînin bikaranîn. Di hînkirina tevgera armanckirî 5.1.10.2. de divê ji kes bê hêvîkirin ku binivîse. Lê belê li ba kesê ku ne xwedî şîyanên nivîsandinê ye divê tevgera gotinê bê xebitandin.
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.11. Hejmarên xwezayî ber bi dehik/sedik/hezarika herî nêzik ve gilover dike.	Ast 2 5.1.11.1. Dehika ku hejmareke xwezayî ya ji 100'ê piçûktir jê re nêzik e dibêje. 5.1.11.2. Hejmareke xwezayî ya ji 100'ê piçûktir ber bi dehika jê re nêzik ve gilover dike. Ast 3 5.1.11.3. Dehika/sedika ku hejmareke xwezayî ya sê payeyî jê re nêzik e dibêje. 5.1.11.4. Hejmareke xwezayî ya sê payeyî ber bi dehika/sedika jê re nêzik ve gilover dike. Ast 4 5.1.11.5. Dehika/sedika/hezarika ku hejmareke xwezayî ya çar payeyî jê re nêzik e dibêje. 5.1.11.6. Hejmareke xwezayî ya çar payeyî ber bi dehika/sedika/hezarika jê re nêzik ve gilover dike.	
Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.12. Hejmarên xwezayî li gorî fer yan cot bûna wan cuda dike.	Ast 3 5.1.12.1. Tiştan/wêneyên tiştan kom dike û dibêje ku hejmara tiştan fer yan cot e. 5.1.12.2. Dibêje ku hejmarên tên dayîn fer yan cot in. 5.1.12.3. Dibêje ku komjimara du hejmarên xwezayî yên fer cot e. 5.1.12.4. Dibêje ku komjimara du hejmarên xwezayî yên	Divê kirina komkirinê ya di çarçoveya tevgera armanckirî 5.1.12.3., 5.1.12.4. û 5.1.12.5. de tê kirin bi modelan (tişt, blokên dehikî hwd.) bê kolandin.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		cot cot e. 5.1.12.5. Dibêje ku komjimara du hejmarên xwezayî yên fer û cot fer e.	
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.13. Hejmaran bi reqemên Romî diyar dike.	Ast 3 5.1.13.1. Reqemên Romî yên heta 20'ê dixwîne. 5.1.13.2. Hejmarên heta 20'ê bi reqemên Romî dinivîse.	Di armanca 5.1.13. de ji bo kesên kor divê sembolên braille yên reqemên Romî bên bikaranîn.
Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.14. Bi hejmarên xwezayî kirina komkirinê dike.	Ast 1 5.1.14.1. Li koma tiştan bi qasî hejmara tê diyarkirin tişt zêde dike û dibêje ku hejmara komê zêde bûye/pirtir bûye. 5.1.14.2. Kirinên komkirinê yên ku komjimara wan ji 20'ê derbas nabe bi tiştên rastîn/wêneyên tiştan model dike û dike. 5.1.14.3. Kirina komkirinê ya ku komjimara wê ji 20'ê derbas nabe û bi tiştan/wêneyên tiştan tê nîşandan diguherîne hejmaran û dike. 5.1.14.4. Sembola wekhev e bi kar tîne. 5.1.14.5. Sembola kirina komkirinê (+) bi kar tîne. 5.1.14.6. Bi hejmarên ku komjimara wan ji 20'ê derbas nabe kirina komkirinê dike. 5.1.14.7. Bi sê hejmarên yek payeyî yên ku komjimara wan ji 20'ê derbas nabe kirina komkirinê dike. 5.1.14.8. Dibêje ku dema di kirina komkirinê de cihên kombûyiyan diguherin komjimar naguhere. 5.1.14.9. Kombûyiya nayê dayîn a di kirina komkirinê ya bi hejmarên ku komjimara wan ji 20'ê derbas nabe de dinivîse. 5.1.14.10. Bi hejmarên ku komjimara wan ji 20'ê derbas nabe kirina komkirinê ya ji ber xwe dike. Ast 2 5.1.14.11. Bi du hejmarên ku komjimarên wan ji 100'ê derbas nabin kirina komkirinê ya bêyî hilgirtinê dike. 5.1.14.12. Bi du hejmarên ku komjimarên wan ji 100'ê derbas nabin kirina komkirinê ya bi hilgirtinê dike. 5.1.14.13. Kombûyiya nayê dayîn a di komjimara du hejmarên ku komjimarên wan ji 100'ê derbas nabin de dibîne. 5.1.14.14. Komjimara du hejmarên ku komjimarên wan ji 100'ê derbas nabin texmîn dike. 5.1.14.15. Texmîna xwe ya di komjimara du hejmarên ku komjimarên wan ji 100'ê derbas nabin de bi encama kirinê re berhev dike.	Di armanca 5.1.14. de di asta yekem de divê kirinên komkirinê pêşî li kêleka hev, paşê li binê hev bên kirin. Di kirina komkirinê ya li binê hev tê kirin de divê bê girankirin ku xêza kirinê bi nîşana wekhev re heman wateyê hildigire. Piştî ku li ser kirinên komkirinê yên ku komjimara wan ji 10'ê derbas nabe bes hate xebitîn, divê li ser kirinên komkirinê yên ku komjimara wan ji 20'ê derbas nabe bê xebitîn. Bi peydakirina ku kes bi xwe kirina komkirinê çêbike (bi sembolan) divê xebatên komkirinê yên bi hilgirtinê/bêyî hilgirtinê bên kirin. Dema li ser armanca 5.1.14. tê xebitîn divê wateyên kirina komkirinê yên anîna tiştên heman cureyî (yên tên komkirin) bal hev, zêdekirin, pirtirkirin û zêdebûn bi xebatên modelkirinê bên ferkirin û bi rewşên jiyana rojane re bal li têgihiştina têgehê bê kişandin. Di tevgera armanckirî 5.1.14.2 û 5.1.14.3. de ji bo kesên kor divê tenê bi tiştan bê xebitîn. Divê tevgera armanckirî 5.1.14.4., 5.1.14.5. û 5.1.14.6. di hînkirinê de bi hev re bên hilgirtin. Di vê qonaxê de divê bê peydakirin ku kes kirina komkirinê ya kiriye bi awayekî bi deng bixwîne (ji bo 2+3=5 wek “Komjimara 2 û 3'ê bi 5'ê re wekhev e.”, “Dema em li 2'yê 3 zêde bikin bi 5'ê re wekhev e.”). Divê wateyên terîmên “kombûyî”, “komjimar” û “komkirin” bên girankirin. Ji bo tevgera armanckirî 5.1.14.4. û 5.1.14.5. divê xebat di pîvanên nîşandan, gotin û nivîsandina sembola têkildar de bên kirin. Ji bo tevgera armanckirî 5.1.14.6. divê cih ji kirina komkirinê ya bi 0'ê re bê dayîn. Divê bê peydakirin ku kes cudahiya komkirina bi 0'ê ji komkirina bi hejmarên din fêm bike û sedema wê diyar bike. Ji bo tevgera armanckirî 5.1.14.9. divê kirina kêmkirinê neyê kirin, divê bi zêdekirina li ser bigihîje encamê. Di hînkirina tevgera armanckirî 5.1.14.9. de divê ji kes bê hêvîkirin ku binivîse. Lê belê li ba kesê ku ne xwedî şîyanên nivîsandinê ye divê tevgera gotinê bê xebitandin.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		5.1.14.16. Bi du hejmarên ku komjimarên wan ji 100'ê derbas nabin kirina komkirinê ya ji ber xwe dike. Ast 3 5.1.14.17. Bi du hejmarên ku komjimarên wan ji 1000'ê derbas nabin kirina komkirinê ya bêyî hilgirtinê dike. 5.1.14.18. Bi du hejmarên ku komjimarên wan ji 1000'ê derbas nabin kirina komkirinê ya bi hilgirtinê dike. 5.1.14.19. Kombûyiya nayê dayîn a di komjimara du hejmarên ku komjimarên wan ji 1000'ê derbas nabin de dibîne. 5.1.14.20. Komjimara du hejmarên ku komjimarên wan ji 1000'ê derbas nabin texmîn dike. 5.1.14.21. Texmîna xwe ya di komjimara du hejmarên ku komjimarên wan ji 1000'ê derbas nabin de bi encama kirinê re berhev dike. 5.1.14.22. Du hejmarên ku komjimarên wan ji 1000'ê derbas nabin ji ber xwe kom dike. Ast 4 5.1.14.23. Bi hejmarên herî zêde çar payeyî kirina komkirinê ya bi hilgirtinê/bêyî hilgirtinê dike. 5.1.14.24. Komjimara du hejmarên ku komjimarên wan herî zêde çar payeyî ne texmîn dike. 5.1.14.25. Texmîna xwe ya di komjimara du hejmarên ku komjimarên wan herî zêde çar payeyî ne de bi encama kirinê re berhev dike. 5.1.14.26. Hejmarên herî zêde çar payeyî bi qatên 100'ê re ji ber xwe kom dike.	Dema li ser tevgera armanckirî 5.1.14.10. tê xebitîn divê stratejiyên komkirinê yên wek temamkirina bo 10'ê, cotên hejmaran (wek 4+4), zêdekirina li ser, yek bêtir/du bêtir hwd. bên hînkirin. Di çarçoveya tevgera armanckirî 5.1.14.12. de divê wateya hilgirtinê ya di kirina komkirinê de bi tiştên rastîn, blokên bingeha 10'î û dîmenên blokên bingeha dehikî hwd. bê modelkirin û bê şirovekirin. Di çarçoveya tevgera armanckirî 5.1.14.13. de dema kombûyiya nayê dayîn tê dîtin divê stratejiya jimartina li ser, jimartina ber bi paş ve yan jî kirina kêmkirinê bê bikaranîn. Ji bo tevgera armanckirî 5.1.14.18 û 5.1.14.20. divê bê peydakirin ku kes stratejiyên texmînê (giloverkirin, cotên hejmaran (wek 50+50), nixrên payeyan, zêdekirina li ser û parçekirina hejmaran) bi kar bîne. Ji bo tevgera armanckirî 5.1.14.20. divê kirinên komkirinê yên ji ber xwe yên du hejmarên du payeyî yên ku komjimarên wan ji 100'ê derbas nabin, du hejmarên sê payeyî û yek payeyî, du hejmarên qata 100'ê û 10'ê bên kirin.
Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.15. Pirsgirêkên ku kirina komkirinê dixwazin çareser dike.	Ast 1 5.1.15.1. Pirsgirêkên ku bi hejmarên ku komjimara wan ji 20'ê derbas nabe kirineke komkirinê dixwazin çareser dike. 5.1.15.2. Li gorî tiştên tîr dayîn, pirsgirêkên ku bi hejmarên ku komjimara wan ji 20'ê derbas nabe kirineke komkirinê dixwazin datîne. Ast 2 5.1.15.3. Pirsgirêkên ku bi hejmarên ku komjimarên wan ji 100'ê derbas nabin herî zêde du kirinan dixwazin çareser dike. 5.1.15.4. Li gorî tiştên tîr dayîn, pirsgirêkên ku bi hejmarên ku komjimara wan ji 100'ê derbas nabe du kirinan dixwazin datîne. Ast 3 5.1.15.5. Pirsgirêkên ku bi hejmarên sê payeyî yên ku komjimarên wan ji 1000'ê derbas nabin herî zêde sê	Di armanca 5.1.15. de di pêvajoya çareserkirina pirsgirêkê de divê pirsgirêk bi şemayan yan jî bi xêzkirinên kesên ên xwe bê dîmenîkirin. Ji bo kesên kor divê bi bikaranîna sembolên taktîl/tiştan şemayên pirsgirêkê bîr çêkirin. Di pêvajoya çareserkirina pirsgirêkê de divê di qonaxên xwendina pirsgirêkê ya bi deng bilind, şirovekirina bi hevokên xwe, veguhastina wê bo dîmenekî, texmînkirin, kirina kirinê û kontrolkirina pêvajoyê de ji kesên re model bê bûn. Ji bo kesên kor dema tê veguhastin bo dîmenî divê materyalên taktîl bîr bikaranîn.

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		kirinan dixwazin çareser dike. 5.1.15.6. Li gorî tiştên tîn dayîn, pirsgirêkên ku herî zêde du kirinan dixwazin datîne. Ast 4 5.1.15.7. Pirsgirêkên ku bi hejmarên herî zêde çar payeyî herî zêde çar kirinan dixwazin çareser dike. 5.1.15.8. Li gorî tiştên tîn dayîn, pirsgirêkên ku sê kirinan dixwazin datîne.	
Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.16. Bi hejmarên xwezayî kirina kêmkirinê dike.	Ast 1 5.1.16.1. Ji koma tiştan bi qasî hejmara tê diyarkirin tişt derdixe û dibêje ku hejmara komê kêmbûye/kêmtir bûye. 5.1.16.2. Kirinên kêmkirinê yên bi hejmarên heta 20'ê bi tiştên rastîn/wêneyên tiştan model dike û dike. 5.1.16.3. Kirina kêmkirinê ya bi tiştên/wêneyên tiştan ên di navbera 0-20 de tê nîşandan diguherîne hejmaran û dike. 5.1.16.4. Sembola kirina kêmkirinê (-) bi kar tîne. 5.1.16.5. Bi hejmarên heta 20'ê kirina kêmkirinê dike. 5.1.16.6. Bi hejmarên heta 20'ê kirina kêmkirinê ya ji ber xwe dike. Ast 2 5.1.16.7. Bi hejmarên heta 100'ê bêtîrî şikandina dehikê kirina kêmkirinê dike. 5.1.16.8. Bi hejmarên heta 100'ê bi şikandina dehikê kirina kêmkirinê dike. 5.1.16.9. Kêmbûyîya nayê dayîn a di kirina kêmkirinê ya bi hejmarên heta 20'ê tê kirin de dibîne. 5.1.16.10. Jêkera nayê dayîn a di kirina kêmkirinê ya bi hejmarên heta 20'ê tê kirin de dibîne. 5.1.16.11. Encama kirina kêmkirinê ya bi du hejmarên heta 100'ê tê kirin texmîn dike. 5.1.16.12. Texmîna xwe ya di encama kirina kêmkirinê ya bi du hejmarên heta 100'ê tê kirin de bi encama kirinê re berhev dike. 5.1.16.13. Di nav 100'ê de du hejmarên qata 10'ê ji ber xwe kêmtir dike. Ast 3 5.1.16.14. Bi hejmarên herî zêde sê payeyî bêtîrî şikandina dehikê kirina kêmkirinê dike. 5.1.16.15. Bi hejmarên herî zêde sê payeyî bi şikandina dehikê kirina kêmkirinê dike. 5.1.16.16. Kêmbûyîya nayê dayîn a di kirina kêmkirinê ya bi hejmarên heta 100'ê tê kirin de dibîne. 5.1.16.17. Jêkera nayê dayîn a di kirina kêmkirinê ya bi hejmarên heta 100'ê tê kirin de dibîne.	Ji bo armanca 5.1.16. di asta yekem de divê kirinên kêmkirinê pêşî li kêleka hev paşê li binê hev bên kirin. Di kirina kêmkirinê ya li binê hev tê kirin de divê bê girankirin ku xêza kirinê bi nîşana wekhev re heman wateyê hildigire. Piştî ku li ser kirinên kêmkirinê yên heta 10'ê bes hate xebitîn, divê li ser kirinên kêmkirinê yên heta 20'ê bê xebitîn. Bi peydakirina ku kes bi xwe kirina kêmkirinê çêbike (bi sembolan) divê xebatên kêmkirinê yên bêtîrî şikandina dehikê û bi şikandina dehikê bên kirin. Divê bê girankirin ku kirina kêmkirinê "dîtina kombûyîya nenas" e. Divê tevgera armanckirî 5.1.16.3. û 5.1.16.4. di hînkirinê de bi hev re bên hilgirtin. Di vê qonaxê de divê bê peydakirin ku kes kirina kêmkirinê ya kiriye bi awayekî bi deng bixwîne (ji bo 5-3=2 wek "5 kêmtir 3, bi 2'yê re wekhev e."). Herwiha divê wateyên terîmên "kêmbûyî", "jêker" û "cudahî" bên girankirin. Di çarçoveya tevgera armanckirî 5.1.16.5. de divê cih ji kirinên kêmkirinê yên ku 0 tê de jêker û cudahî ye û ji wateya sifirê ya di kirinê de re bê dayîn. Dema li ser kirinên kêmkirinê yên ji ber xwe tê xebitîn divê stratejiyên wek zêdekirina li ser, parçekirina hejmaran, yek kêmtir/du kêmtir, jimartina ber bi paş ve heta hejmarekê, cotên hejmaran, temamkirina bo 10'ê hwd. bên hînkirin.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		5.1.16.18. Encama kirina kêmkirinê ya bi hejmarên sê payeyî tê kirin texmîn dike. 5.1.16.19. Texmîna xwe ya di encama kirina kêmkirinê ya bi hejmarên sê payeyî tê kirin de bi encama kirinê re berhev dike. 5.1.16.20. Ji hejmareke du payeyî hejmareke du payeyî ya qata 10'ê ji ber xwe kêr dike. 5.1.16.21. Ji hejmareke sê payeyî û qata 100'ê hejmareke du payeyî ya qata 10'ê ji ber xwe kêr dike. Ast 4 5.1.16.22. Bi du hejmarên herî zêde çar payeyî bêyî şikandina dehikê kirina kêmkirinê dike. 5.1.16.23. Bi du hejmarên herî zêde çar payeyî bi şikandina dehikê kirina kêmkirinê dike. 5.1.16.24. Kêmbûyîya nayê dayîn a di kirina kêmkirinê ya bi hejmarên herî zêde çar payeyî tê kirin de dibîne. 5.1.16.25. Jêkera nayê dayîn a di kirina kêmkirinê ya bi hejmarên heta 100'ê tê kirin de dibîne. 5.1.16.26. Encama kirina kêmkirinê ya bi hejmarên herî zêde çar payeyî tê kirin texmîn dike. 5.1.16.27. Texmîna xwe ya di encama kirina kêmkirinê ya bi hejmarên herî zêde çar payeyî tê kirin de bi encama kirinê re berhev dike. 5.1.16.28. Ji hejmareke sê payeyî hejmareke du payeyî ya qata 10'ê ji ber xwe kêr dike. 5.1.16.29. Hejmarên sê payeyî yên qata 100'ê ji ber xwe kêr dike.	
Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.17. Pirsgirêkên ku kirina kêmkirinê dixwazin çareser dike.	Ast 1 5.1.17.1. Pirsgirêkên ku bi hejmarên di navbera 1-20 de kirineke kêmkirinê dixwazin çareser dike. 5.1.17.2. Li gorî tiştên tî dayîn, pirsgirêkên ku bi hejmarên di navbera 1-20 de kirineke kêmkirinê dixwazin datîne. Ast 2 5.1.17.3. Pirsgirêkên herî zêde du kirinî yên ku bi hejmarên di navbera 0-100 de kirina komkirin û kêmkirinê dixwazin çareser dike. 5.1.17.4. Li gorî tiştên tî dayîn, pirsgirêkên herî zêde du kirinî yên ku bi hejmarên di navbera 0-100 de kirina komkirin û kêmkirinê dixwazin datîne. Ast 3	Di armanca 5.1.17. de di pêvajoya çareserkirina pirsgirêkê de divê pirsgirêk bi şemayan yan jî bi xêzkirinên kesên ên xwe bê dîmenîkirin. Ji bo kesên kor divê bi sembolên taktîl/bi tiştan şemayên pirsgirêkê bên çêkirin. Di pêvajoya çareserkirina pirsgirêkê de divê di qonaxên xwendina pirsgirêkê ya bi deng bilind, şirovekirina bi hevokên xwe, veguhastina wê bo dîmenekî, texmînkirin, kirina kirinê û kontrolkirina pêvajoyê de ji kesên re model bê bûn. Ji bo kesên kor divê veguhastina bo dîmenî bi materyalên taktîl/bi tiştan bê peydakirin.

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		5.1.17.5. Pirsgirêkên herî zêde sê kirinî yên ku bi hejmarên di navbera 0-1000 de kirina komkirin û kêmkirinê dixwazin çareser dike. 5.1.17.6. Li gorî tiştên tî dayîn, pirsgirêkên herî zêde du kirinî yên ku bi hejmarên di navbera 0-1000 de kirina komkirin û kêmkirinê dixwazin datîne. Ast 4 5.1.17.7. Pirsgirêkên herî zêde çar kirinî yên ku bi hejmarên herî zêde çar payeyî kirina komkirin û kêmkirinê dixwazin çareser dike. 5.1.17.8. Li gorî tiştên tî dayîn, pirsgirêkên herî zêde sê kirinî yên ku bi hejmarên herî zêde çar payeyî kirina komkirin û kêmkirinê dixwazin datîne.	
Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.18. Bi hejmarên xwezayî kirina carkirinê dike.	Ast 2 5.1.18.1. Kirina carkirinê ya bi hejmarên heta 20'ê bi tiştên rastîn/wêneyên tiştan wek kirina komkirinê ya dubarekirî model dike. 5.1.18.2. Dibêje ku kirina carkirinê kirina komkirinê ya dubarekirî ye. 5.1.18.3. Kirina carkirinê ya bi tiştan/wêneyên tiştan tê nîşandan diguherîne hejmaran. 5.1.18.4. Sembola kirina carkirinê (x) bi kar tîne. 5.1.18.5. Hejmarên heta 10'ê bi 1, 2, 3, 4, 5 û 10'ê re car dike. 5.1.18.6. Tabloya carkirinê ya heta 5'ê (5 tê de) çêdike. Ast 3 5.1.18.7. Hejmarên heta 10'ê bi 5, 7, 8, 9'ê re car dike. 5.1.18.8. Tabloya carkirinê çêdike. 5.1.18.9. Hejmarên heta 100'ê bi hejmarên heta 10'ê re bêtî hilgirtinê car dike. 5.1.18.10. Hejmarên heta 100'ê bi hejmarên heta 10'ê re bi hilgirtinê car dike. 5.1.18.11. Hejmareke du payeyî bi hejmareke du payeyî re car dike. 5.1.18.12. Hejmareke sê payeyî bi hejmareke yek payeyî re car dike. 5.1.18.13. Bi hejmarên 10 û 100'ê heta 1000'ê kirina carkirinê ya bi rêya kurt dike. 5.1.18.14. Dema di kirina carkirinê de yek ji carkeran tê zêdekirin yan tê kêmkirin, guherîna di encamê de dibêje.	Ji bo armanca 5.1.18. divê bê girankirin ku dema cihê carkeran diguhere berhem naguhere. Dema li ser tevgera armanckirî 5.1.18.1. tê xebitîn divê kom bi awayê du bi du, sê bi sê, çar bi çar, pênc bi pênc û deh bi deh bînin çêkirin. Dema du bi du tê xebitîn divê hejmara giştî ya tiştan 20, dema sê bi sê tê xebitîn 30, dema çar bi çar tê xebitîn 40, dema pênc bi pênc tê xebitîn 50 û dema deh bi deh tê xebitîn 100 be. Dema li ser tevgera armanckirî 5.1.18.2. tê xebitîn divê cih ji tiştên rastîn re bê dayîn. Ji bo tevgera armanckirî 5.1.18.1. û 5.1.18.2. divê pêşî cih ji xebatên kirina carkirinê ya li kêleka hev paşê ya li binê hev re bê dayîn. Dema kirina carkirinê tê qezenckirin divê bê peyda kirin ku kes wateya qatî ya kirina carkirinê diyar bikin. Dema li ser wateya qatî tê xebitîn mînak di kirina $4 \times 2 = 8$ de dikare wek “2 qatên 4'ê bi 8'ê re wekhev e.”, “4 qatên 2'yê bi 8'ê re wekhev e.” bê diyarkirin. Herwiha divê komkirina dubarekirî bi wateya qatî re bê girêdan. Ji bo tevgera armanckirî 5.1.18.5. divê bê peyda kirin ku kes cudahiya kirina carkirinê ya bi 1'ê ji carkirina bi hejmarên din fêm bike û bi wateya komkirina dubarekirî ya carkirinê sedema wê diyar bike. Bi heman awayî divê cudahiya carkirina bi 0'ê ji carkirina bi hejmarên din bi sûdwergirtina ji tîkiliya komkirin-carkirinê (mînak $0+0+0=0$, $3 \times 0=0$) bê dayîn.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		Ast 4 5.1.18.15. Hejmarên du payeyî bi hejmarên sê payeyî re car dike. 5.1.18.16. Dibêje ku di kirina carkirinê ya bi sê hejmarên xwezayî de guherîna cihê carkeran, encamê naguherîne. 5.1.18.17. Hejmarên xwezayî yên herî zêde sê payeyî; bi hejmarên ku herî zêde neh qatên 10, 100 û 1000'ê ne re bi rêya kurt car dike. 5.1.18.18. Hejmarên xwezayî yên herî zêde du payeyî bi 5, 25 û 50'yî re bi rêya kurt car dike. 5.1.18.19. Hejmarên herî zêde sê payeyî bi 10, 100 û 1000'ê re ji ber xwe car dike. 5.1.18.20. Berhema hejmareke xwezayî ya herî zêde du payeyî bi hejmareke xwezayî ya yek payeyî re texmîn dike. 5.1.18.21. Texmîna xwe ya di berhema hejmareke xwezayî ya herî zêde du payeyî bi hejmareke xwezayî ya yek payeyî re de bi encama kirinê re berhev dike.	Di tevgera armanckirî 5.1.18.6 û 5.1.18.8. de kesên kor dikarin tabloya carkirinê li ser tablet yan daktîloya braille binivîsin û çêbikin. Dema li ser tevgera armanckirî 5.1.18.14. tê xebitîn divê hejmarên di tabloya carkirinê ya heta 5'ê (5 tê de) bên bikaranîn. Divê bi mînakên bê nîşandan ku her ku yek ji carkeran 1 zêde dibe berhem bi qasî nirxa carkerê din zêde dibe yan jî her ku yek ji carkeran 1 kêr dibe berhem bi qasî nirxa carkerê din kêr dibe.
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.19. Pîrsgirêkên li ser carkirinê çareser dike.	Ast 2 5.1.19.1. Pîrsgirêkên ku bi hejmarên di navbera 1-100 de kirineke carkirinê dixwazin çareser dike. Ast 3 5.1.19.2. Pîrsgirêkên ku bi hejmarên di navbera 1-100 de du kirinan dixwazin, ku yek ji wan kirina carkirinê ye, çareser dike. 5.1.19.3. Pîrsgirêkên ku kirina carkirinê dixwazin datîne. Ast 4 5.1.19.4. Pîrsgirêkên ku bi hejmarên herî zêde sê payeyî herî zêde sê kirinan dixwazin, ku yek ji wan kirina carkirinê ye, çareser dike. 5.1.19.5. Pîrsgirêkên ku bi hejmarên herî zêde sê payeyî herî zêde du kirinan dixwazin, ku yek ji wan kirina carkirinê ye, datîne.	Di armanca 5.1.19. de di pêvajoya çareserkirina pîrsgirêkê de divê pîrsgirêk bi şemayan yan jî bi xêzkirinên kesên ên xwe bê dîmenîkirin. Ji bo kesên kor divê bi sembolen taktîl/bi tiştan şemayên pîrsgirêkê bên çêkirin. Di pêvajoya çareserkirina pîrsgirêkê de divê di qonaxên xwendina pîrsgirêkê ya bi deng bilind, şirovekirina bi hevokên xwe, veguhastina wê bo dîmenekî, texmînkirin, kirina kirinê û kontrolkirina pêvajoyê de ji kesan re model bê bûn.
Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.20. Bi hejmarên xwezayî kirina dabeşkirinê dike.	Ast 2 5.1.20.1. Kirina dabeşkirinê ya bi hejmarên heta 20'ê bi komkirin/parvekirina tiştên rastîn/wêneyên tiştan model dike. 5.1.20.2. Kirina dabeşkirinê ya bi hejmarên heta 20'ê bi komkirin/parvekirina tiştên rastîn/wêneyên tiştan wek kirina kêmkirinê ya li pey hev model dike. 5.1.20.3. Kirina dabeşkirinê ya bêmayî ya bi	Ji bo tevgera armanckirî 5.1.20.1. divê xebatên girêdana kirina dabeşkirinê bi kirinên veqetandina li komên wekhev yan parvekirinê re bên kirin. Divê hejmarên tişt û wêneyên tiştan/wêneyên taktîl herî zêde bi 20'ê bên sîordarkirin. Divê kirin bi awayekî ku herî zêde li 5'ê bêmayî bên dabeşkirin bên plankirin. Dema li ser tevgera armanckirî 5.1.20.2. tê xebitîn divê cih ji modelkirina kirina dabeşkirinê ya bi hejmarên heta 20'ê wek kirina kêmkirinê ya li pey hev bi

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		tiştên/wêneyên tiştan ên di navbera 0-20 de tê nîşandan diguherîne hejmaran. 5.1.20.4. Sembola kirina dabeşkirinê (+) bi kar tîne. 5.1.20.5. Rola 1'ê ya di kirina dabeşkirinê de dibêje. Ast 3 5.1.20.6. Hejmarên heta 100'ê li hejmarên heta 10'ê bîmayî dabeş dike. 5.1.20.7. Hejmarên heta 100'ê li hejmarên heta 10'ê bimayî dabeş dike. 5.1.20.8. Bi hejmarên heta 100'ê hejmareke xwezayî ya ku payeya yekikan a wê sifir e li 10'ê bi rêya kurt dabeş dike. Ast 4 5.1.20.9. Hejmarên xwezayî yên sê payeyî li hejmarên xwezayî yên herî zêde du payeyî dabeş dike. 5.1.20.10. Hejmareke herî zêde çar payeyî, li hejmareke yek payeyî dabeş dike. 5.1.20.11. Hejmarên xwezayî yên herî zêde pênc payeyî yên ku sê payeyên wan ên dawî sifir in li 10, 100 û 1000'ê ji ber xwe dabeş dike. 5.1.20.12. Encama kirineke dabeşkirinê texmîn dike. 5.1.20.13. Texmîna xwe ya di encama kirineke dabeşkirinê de bi encama kirinê re berhev dike. 5.1.20.14. Têkiliya di navbera carkirin û dabeşkirinê de dibêje. 5.1.20.15. Nirxa nayê dayîn a di yekê ji du gotinên matematîkî yên ku têkiliya wekheviyê di navbera wan de heye diyar dike û dibêje ku wekhevî tê peyda kirin. 5.1.20.16. Kirinên ku divê bînin kirin da ku du gotinên matematîkî yên ku têkiliya wekheviyê di navbera wan de tune ye wekhev bibin şirove dike.	komkirin/parvekirina tiştên rastîn/wêneyên tiştan/wêneyên taktîl re jî bê dayîn. Divê tevgera armanckirî 5.1.20.3 û 5.1.20.4. di hînkirinê de bi hev re bînin hilgirtin. Di vê qonaxê de divê bînin peyda kirin ku kes kirina dabeşkirinê ya kiriye bi awayekî bi deng bixwîne (mînak ji bo $20 \div 5 = 4$ wek "20 dabeşî 5, bi 4'ê re wekhev e."). Divê wateyên dabeşbûyî, dabeşker, beşî û xêza dabeşkirinê yên di kirineke dabeşkirinê ya tê dayîn de bînin girankirin. Di heman demê de divê hînkirina sembolên braille bînin kirin. Di Asta 3'yê de divê bînin peyda kirin ku kes dabeşbûyî, dabeşker, beşî û mayî ya di kirina dabeşkirinê de bi rewşên pîrsgirêkê yên guncaw re wek têgehî girê bide. Digel vê, divê bi modelkirin û kirinan bînin nîşandan ku di kirina dabeşkirinê de dabeşbûyî bi komjimara berhema dabeşker û beşî bi mayî re wekhev e. Ji bo tevgera armanckirî 5.1.20.6. û 5.1.20.7. divê ji bilî modelkirinê bi tiştên şênber tînin kirin, modelên wek xêza hejmaran, bingeha dehikî hwd. jî bînin bikaranîn. Herwiha di hînkirina tevgera armanckirî 5.1.20.7. de divê bînin diyarkirin ku dema mayî di kirina dabeşkirinê de ji dabeşkerî piçûktir be kirin nayê domandin.
Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.21. Pîrsgirêkên ku kirina dabeşkirinê dixwazin çareser dike.	Ast 2 5.1.21.1. Bi bikaranîna hejmarên di navbera 1-20 de bi dabeşkirina li 2'yê, 3'ê, 4'ê, herî zêde 5'ê pîrsgirêkên ku kirina dabeşkirinê dixwazin çareser dike. Ast 3 5.1.21.2. Pîrsgirêkên ku bi hejmarên heta 100'ê du kirinan dixwazin, bi awayekî ku yek ji wan dabeşkirin be, çareser dike. 5.1.21.3. Pîrsgirêkên ku bi hejmarên heta 100'ê kirina dabeşkirinê dixwazin datîne. Ast 4 5.1.21.4. Pîrsgirêkên ku bi hejmarên herî zêde çar payeyî herî zêde sê kirinan dixwazin, bi awayekî ku yek ji wan	Di armanca 5.1.21. de di pêvajoya çareserkirina pîrsgirêkê de divê pîrsgirêk bi şemayan yan jî bi xêzkirinê kesan ên xwe bînin dîmenî kirin. Ji bo kesên kor divê bi sembolên taktîl/bi tiştan şemayên pîrsgirêkê bînin çêkirin. Di pêvajoya çareserkirina pîrsgirêkê de divê di qonaxên xwendina pîrsgirêkê ya bi deng bilind, şirovekirina bi hevokên xwe, veguhastina wê bo dîmenekî, texmînkirin, kirina kirinê û kontrolkirina pêvajoyê de ji kesan re model bînin bînin. Ji bo kesên kor divê veguhastina bo dîmenî bi sembolên taktîl/bi tiştan bînin kirin.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		dabeşkirin be, çareser dike. 5.1.21.5. Pirsgirêkên ku bi hejmarên herî zêde çar payeyî du kirinan dixwazin, bi awayekî ku yek ji wan dabeşkirin be, datîne.	
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.22. Bi girêdana modelên tevahî, nîv û çaryekê nîşandana beşikê bi kar tîne.	Ast 1 5.1.22.1. Tiştê/wêneyê tiştî yê tevahî nîşan dide. 5.1.22.2. Tiştê/wêneyê tiştî yê nîvî nîşan dide. 5.1.22.3. Dibêje ku yek ji du parçeyên wekhev ên tevahiyekê nîv e. 5.1.22.4. Tevahiye bi nîvî re girê dide. Ast 2 5.1.22.5. Tiştê/wêneyê tiştî yê çaryek nîşan dide. 5.1.22.6. Dibêje ku yek ji çar parçeyên wekhev ên tevahiyekê çaryek e. 5.1.22.7. Dibêje ku yek ji du parçeyên wekhev ên nîvekê çaryek e. 5.1.22.8. Çaryekê bi nîvî re girê dide. 5.1.22.9. Dibêje ku tevahiyek ji nîvekê û du çaryekan pêk tê. Ast 3 5.1.22.10. Modelên tevahî, nîv û çaryekê bi awayê beşikê nîşan dide. 5.1.22.11. Beşika ku nîv, çaryek û tevahiye diyar dike dibêje. 5.1.22.12. Wateya parçe-tevahî ya beşikê dibêje. Ast 4 5.1.22.13. Beşikê dixwîne.	Di armanca 5.1.22. de dema li ser tevgerên armanckirî yên di Asta 1'ê de tê xebitîn divê têkiliya di navbera nîv û tevahiye de li ser modelan bê kolandin (mînak pêkanîna tevahiyekê ji du nîvan, pêkhatina tevahiyekê ji du nîvan). Di tevgera armanckirî 5.1.22.1., 5.1.22.2. û 5.1.22.3. de divê neyê ketin nav nîşandana beşikê. Herwiha ji bo tevgera armanckirî 5.1.22.3. divê xebatên veqetandina tevahiyekê li du parçeyên wekhev bên kirin. Dema li ser tevgera armanckirî 5.1.22.5. tê xebitîn divê xebatên veqetandina tevahiyekê li çar parçeyên wekhev bên kirin. Di tevgera armanckirî 5.1.22.8. de divê xebatên girêdana çaryekê bi nîvî re bi bikaranîna modelan bên kirin (mînak pêkhatina nîvekê ji du çaryekan). Herwiha ji bo vê tevgera armanckirî divê veqetandina nîvekê li du parçeyên wekhev bê xebitandin. Dema li ser tevgera armanckirî 5.1.22.10. tê xebitîn divê mînak ji bo beşika 1/4 bê diyarkirin ku tevahiyek li 4'ê hatiye dabeşkirin û parçeyek jê hatiye girtin. Divê jorhejmar, binhejmar û xêza beşikê, (divê sembolên braille bên dayîn) li ser mînakên tên bikaranîn bên şirovekirin. Dema li ser tevgera armanckirî 5.1.22.12. tê xebitîn divê têkiliya parçe-tevahî ya di navbera jorhejmar û binhejmarê de bê danîn. Di xwendina nîşandanên beşikê de divê gotinên ku têkiliya parçe-tevahî girankirin bên bikaranîn (mînak divê beşika 1/4 bi awayê "yek ji çaran" bê xwendin).
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.23. Beşikên yekeyî cuda dike.	Ast 3 5.1.23.1. Her yekê ji parçeyên wekhev ên tevahiyekê bi awayê beşikê nîşan dide. 5.1.23.2. Dibêje ku her yek ji parçeyên wekhev ên tevahiyekê beşika yekeyî ye. 5.1.23.3. Beşikên yekeyî yên beşikên ku binhejmara wan 10, 100 e dibêje. 5.1.23.4. Bi qasî beşika yekeyî ya tê diyarkirin a pirraniyekê model dike û dibêje. Ast 4 5.1.23.5. Beşikên yekeyî li gorî têkiliya mezinahî-piçûkahiyê berhev dike. 5.1.23.6. Beşikên yekeyî li gorî têkiliya mezinahî-piçûkahiyê rêz dike.	Di armanca 5.1.23. de divê cih ji xebatên veqetandina tevahiyekê li parçeyên wekhev re bê dayîn. Ji bo kesên kor divê sembolên taktîl/tişt bên bikaranîn, divê sembolên braille bên bikaranîn. Ji bo tevgera armanckirî 5.1.23.5. û 5.1.23.6. divê li ser beşikên ku binhejmara wan herî zêde 20 e xebat bê kirin.

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.24. Beşika hevedudanî û ya bi hejmara temam cuda dike.	Ast 3 5.1.24.1. Beşikên ku jorhejmara wan ji binhejmara wan mezintir e nîşan dide. Ast 4 5.1.24.2. Beşika sade, hevedudanî û ya bi hejmara temam model dike û dibêje.	Ji bo tevgera armanckirî 5.1.24.1. divê li ser kaxiz, blokên beşikê, blokên patronê û xêza hejmaran bê xebitîn.
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.25. Bi qasî beşika sade ya tê diyarkirin a pirranîyekê cuda dike.	Ast 3 5.1.25.1. Beşikên ku jorhejmara wan ji binhejmara wan piçûktir e model dike û dibêje. Ast 4 5.1.25.2. Bi qasî beşika sade ya tê diyarkirin a pirranîyekê model dike û dibêje.	Ji bo tevgera armanckirî 5.1.25.1. divê bi bikaranîna modelên cuda yê wek kaxiz, blokên beşikê, blokên patronê û xêza hejmaran li ser beşikên ku jorhejmara wan ji binhejmara wan piçûktir e bê xebitîn. Ji bo tevgera armanckirî 5.1.25.2. divê xêza hejmaran, modela qadê hwd. bîn bikaranîn. Herwiha di modelkirina bi qasî beşika sade ya tê diyarkirin a pirranîyekê de divê hejmara pirranîyê herî zêde sê payeyî be. Divê neyê ketin nav kirina carkirinê ya hejmareke xwezayî bi beşikê re.
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.26. Beşikan berhev dike.	Ast 3 5.1.26.1. Beşikeke tê dayîn li ser xêza hejmaran nîşan dide. Ast 4 5.1.26.2. Herî zêde sê beşikên ku binhejmarên wan wekhev in li gorî têkiliya mezinahî-piçûkahiyê berhev dike.	Di Asta 4'ê de divê ji bilî modelên dirêjahî û qadê, li ser xêza hejmaran jî xebat bîn kirin. Ji bo armanca 5.1.26. divê beşik li gorî mezinahiyên ku temsîl dikin ji aliyê mezinahî-piçûkahiyê ve bîn berhevdan. Divê xebatên gotina ka kîjan mezin, kîjan piçûk e, gotina hejmara herî mezin, herî piçûk bîn kirin. Di berhevdanê de divê sembolên mezin/piçûk bîn bikaranîn. Divê cih ji xebatên berhevdana beşikeke tê dayîn li ser xêza hejmaran bi sifir, nîv û tevahiyê re bê dayîn.
Beş 5.1. Hejmar û Kirin	5.1.27. Bi beşikên ku binhejmarên wan wekhev in kirinê komkirin û kêmkirinê dike.	Ast 4 5.1.27.1. Bi beşikên ku binhejmarên wan wekhev in kirina komkirin û kêmkirinê dike. 5.1.27.2. Pirsgirêkên ku bi beşikên ku binhejmarên wan wekhev in kirina komkirin û kêmkirinê dixwazin çareser dike.	Dema li ser armanca 5.1.27. tê xebitîn divê sedema kirina komkirina jorhejmaran di nav xwe de dema binhejmarê sabit e, di kirina komkirin û kêmkirinê de bê diyarkirin.

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.2. Geometrî	5.2.1. Şêl û cismên geometrîk cuda dike.	Ast 1 5.2.1.1. Şêklên geometrîk li gorî hejmara goşê û aliyên wan polên dike û nav lê dike. 5.2.1.2. Sêgoşe, çargoşe, dirêjgoşe, dorge û çemberê model dike. 5.2.1.3. Cismên hêsan ên di jiyana rojane de tên bikaranîn li gorî taybetmendiyên wan polên dike û bi şêklên geometrîk re girê dide. Ast 2 5.2.1.4. Wekhevî û cudahiya sêgoşe, çargoşe, dirêjgoşe, dorge û çemberê dibêje. 5.2.1.5. Cismên geometrîk li ser modelan cuda dike. 5.2.1.6. Navê cismê geometrîk ê tê nîşandan dibêje.	Ji bo tevgera armanckirî 5.2.1.1. divê pêşî têgehên “alî” û “goşe” bîn pênasekirin. Divê taybetmendiyên alî û goşeyan ên çember, çargoşe, dirêjgoşe û sêgoşe bîn kolandin. Dema li ser tevgera armanckirî 5.2.1.1. tê xebitîn divê li ser şêklên herî zêde çar alî û çemberê bi modelkirinê bê xebitîn. Divê pêşî xebata polênkirina şêkulan paşê pênasekirin û piştî navlêkirinê bê kirin. Ji bo tevgera armanckirî 5.2.1.2. divê bi bikaranîna amûrên wek textikê geometriyê, ta, lastîk, dar hwd. xebatên modelkirinê bîn kirin. Ji bo tevgera armanckirî 5.2.1.3. divê tiştên wê bîn bikaranîn ji cismên geometrîk (prîzma, kûre hwd.) bîn hilbijartin. Divê bîyî ku cismên geometrîk

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		Ast 3 5.2.1.7. Rû, goşe û kevîyên cismên geometrîk dibêje. 5.2.1.8. Wekhevî û cudahiyên kub, prîzmaya çargoşe û prîzmaya dirêjgoşe dibêje. 5.2.1.9. Bi bikaranîna xêzikê çargoşe, dirêjgoşe û sêgoşe xêz dike. 5.2.1.10. Li ser çargoşe û dirêjgoşe dîagonalan nîşan dide. 5.2.1.11. Dibêje ku şêl li gorî hejmara aliyên xwe navlêkirî ne. Ast 4 5.2.1.12. Alî û goşeyên sêgoşe, çargoşe û dirêjgoşe navlê dike. 5.2.1.13. Taybetmendiya aliyan ên çargoşe û dirêjgoşe dibêje. 5.2.1.14. Sêgoşeyan li gorî dirêjahiya aliyên wan polên dike. 5.2.1.15. Kuba ku vekirina wê tê dayîn çêdike.	bên navlêkirin, taybetmendiya tiştên wek qutî, kuba yekeyî, şûşeya pet, konika kampê, topên pîngpongê yên ku wê li gorî wan polênkirin bê kirin (gilover, bi goşe, ya ku li ser wê dirêjgoşe heyê hwd.) bên lîstekirin û li gorî wê polênkirin bên kirin. Divê rûyên tiştên bi şêlê cismê geometrîk ên ji jiyana rojane bên kolandin û xebatên girêdana wan bi şêlên geometrîk re bên kirin. Di hînkirina tevgera armanckirî 5.2.1.7. de divê ji kes bê hêvîkirin ku bibêje. Lê belê li ba kesê ku ne xwedî şîyanên gotinê ye divê tevgera nîşandanê bê xebitandin. Dema li ser tevgera armanckirî 5.2.1.5. û 5.2.1.6. tê xebitîn divê wek cismên geometrîk li ser prîzmaya çargoşe, prîzmaya dirêjgoşe, prîzmaya sêgoşe, silindîr, kûre û kubê bê xebitîn. Divê di hînkirinê de bê girankirin ku dema alî, cih yan mezinahiya cism û şêlên geometrîk diguhere taybetmendiya wan ên teşeyî naguherin. Ji bilî cismên geometrîk ên di Asta 2'yê de tên hilgirtin, divê di Asta 3'yê de li ser konî jî bê xebitîn. Ji bo tevgera armanckirî 5.2.1.7. divê pêşî têgehên “rû”, “goşe” û “kevî” ji kes re li ser modelan bên nîşandan û bên şîrovekirin. Ji bo tevgera armanckirî 5.2.1.8. divê şêlên geometrîk ji aliyê taybetmendiya goşe, rû û kevîyan ve bên berhevdan. Ji bo tevgera armanckirî 5.2.1.10. divê bê girankirin ku sêgoşe ne xwedî dîagonal e. Ji bo tevgera armanckirî 5.2.1.12. divê çargoşe, pêncgoşe, şeşgoşe û heştgoşe bên nasandin. Ji bo tevgera armanckirî 5.2.1.14. divê xebatên navlêkirina alî û goşeyên sêgoşeyekê bi awayê aliyê A, goşeya A bên kirin.
Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.2. Geometrî	5.2.2. Têkiliya cihî diyar dike.	Ast 1 5.2.2.1. Têkiliya cihî (rewş, cih, alî) dibêje. Ast 2 5.2.2.2. Ji bo diyarkirina cih, alî û tevgerê zimanê matematîkî bi kar tîne. 5.2.2.3. Şêlên sîmetrîk ên li dora xwe cuda dike. 5.2.2.4. Bi awayekî ku şêlê sîmetrîk ê tê dayîn li du parçeyên wekhev veqetîne xêza sîmetriyê xêz dike. Ast 3 5.2.2.5. Li ser şêlên ku ji xêzeke sîmetriyê zêdetir hene	Ji bo tevgera armanckirî 5.2.2.1. divê li ser cih yan aliyê tiştêkî li gorî tiştêkî din (li binê-li ser, li dora-li çepê-li rastê-di navbera-li pêş-li pişt, li bilindî-li nizmî, li dûr-li nêzîk, di hundir de-li derve) bê xebitîn. Divê xebatên ber bi bikaranîna wan di rewşên jiyana rojane de bên kirin. Ji bo tevgera armanckirî 5.2.2.2. divê li ser planên mekanî yên wek krokiyê hêsan, xerîteyêkê yan jî plana dibistanê bê xebitîn.

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		xêzên sîmetriyê xêz dike. 5.2.2.6. Şeklê sîmetrîk ê parçeyek jê tê dayîn li gorî xêza sîmetriyê ya berwarî yan stûnî xêz dike û temam dike. Ast 4 5.2.2.7. Li ser şeklên ku sîmetriya neynikê ya wan tê dayîn xêza sîmetriyê xêz dike. 5.2.2.8. Sîmetriya şeklê tê dayîn a li gorî xêza rast xêz dike.	Ji bo kesên kor divê xerîteya taktîl yan jî plana krokiyê bê bikaranîn. Dema li ser tevgera armanckirî 5.2.2.4. tê xebitîn xêza sîmetriyê ya li gorî şeklê tê dayîn tê xêzkirin dikare berwarî yan stûnî be. Her çiqas şeklê tê dayîn ji xêzeke sîmetriyê zêdetir hebe jî bes e ku kes xêzeke sîmetriyê xêz bike. Divê li ser asteke jortir bê xebitîn ku dibe ji xêzeke sîmetriyê zêdetir hebe. Di armanca 5.2.2. de di tevgerên armanckirî yên ku xêzkirinê dixwazin de divê ji bo kesên kor materyalên xêzkirinê yên bilind bîr bikaranîn.
Beş 5.2. Geometrî	5.2.3. Patronên geometrîk çêdike.	Ast 1 5.2.3.1. Patrona ku herî zêde sê hêmanên wê hene bi cism yan şeklên geometrîk çêdike. 5.2.3.2. Rêzika di patroneke ji şeklên geometrîk yan tiştên dişîbin cismê geometrîk pêk tê de dibêje. 5.2.3.3. Hêmanên kêr hatine hiştin ên di patronê de diyar dike û patronê temam dike. Ast 2 5.2.3.4. Hêmanên kêr hatine hiştin ên di patroneke geometrîk a dubare dibe de diyar dike û patronê temam dike. 5.2.3.5. Bi bikaranîna têkiliya di patroneke geometrîk de bi materyalên cuda patronên nû yên xwedî heman têkiliyê çêdike. Ast 3 5.2.3.6. Bi bikaranîna modelên şeklan li ser kaxiza bi xal yan bi çargoşe nexşeke xwedî patroneke diyar xêz dike.	Ji bo tevgera armanckirî 5.2.3.4. divê li ser patronên herî zêde çar hêmanî bê xebitîn. Ji bo koran patron bi bikaranîna şeklên bilind/taktîl tên çêkirin.
Beş 5.2. Geometrî	5.2.4. Têgehên bingeîn ên di geometriyê de cuda dike.	Ast 3 5.2.4.1. Xalê bi sembolê nîşan dide û navlê dike. 5.2.4.2. Xêza rast, tîrêj û zaviyê dibêje. 5.2.4.3. Bi modelên xêzan parçeyên xêza rast ên bi cihê stûnî û çemayî çêdike. Ast 4 5.2.4.4. Rûberê dibêje. 5.2.4.5. Zaviyê navlê dike û bi sembolan nîşan dide. 5.2.4.6. Zaviyan bi amûrên standard ên pîvandina zaviyê dipêve û wek zaviya teng, rast, fireh û xêzî diyar dike. 5.2.4.7. Bi bikaranîna amûrên standard ên pîvandina zaviyê zaviya ku pîvana wê tê dayîn çêdike.	Di armanca 5.2.4. de ji bo kesên kor pêwîst e ku têgehên wek “xal”, “xêza rast” û “tîrêj” li ser modelên bilind bîr xebitandin. Divê bê girankirin ku têgeha xalê ya di geometriyê de tê bikaranîn ji xala li dawiya hevokê tê bikaranîn cuda ye. Dema li ser tevgera armanckirî 5.2.4.2. tê xebitîn divê ji derdore mînak bîr dayîn. Di hînkirina tevgera armanckirî 5.2.4.2. û 5.2.4.4. de divê ji kes bê hêvîkirin ku bibêje. Lê belê li ba kesê ku ne xwedî şîyanên gotinê ye divê tevgera nîşandanê bê xebitandin. Ji bo tevgera armanckirî 5.2.4.6. û 5.2.4.7. divê bi alîkariya amûrên ku ji bo pîvandina zaviyê bi kêr tên (îletkî, gonye hwd.) bê ferkirin ku zaviye bi zivîrandina tîrêjekê li dora xala destpêkê ya wê pêk tê.

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.3. Pîvandîn	5.3.1. Dirêjahiyê dipîve.	Ast 1 5.3.1.1. Tiştan ji aliyê dirêjahiya wan ve berhev dike. 5.3.1.2. Tiştan ji aliyê dirêjahiya wan ve rêz dike. 5.3.1.3. Ji bo pîvandina dirêjahiyekê amûra pîvandînê ya ne-standard a guncaw hildibijêre. 5.3.1.4. Ji bo pîvandina dirêjahiyekê bi amûra pîvandînê ya ne-standard a guncaw pîvandînê dike. 5.3.1.5. Pirsgirêkên ku yekeyên dirêjahiyê yên ne-standard tê de tên bikaranîn çareser dike. Ast 2 5.3.1.6. Bi parçeyên yekeya ne-standard ên li du û çaran hatine dabeşkirin (mînak bi qelemekê, paşê bi nîvê wê) pîvandînen dubarekirî dike. 5.3.1.7. Yekeyên standard ên pîvandina dirêjahiyê dibêje. 5.3.1.8. Cihên bikaranîna yekeyên standard ên pîvandina dirêjahiyê dibêje. 5.3.1.9. Bi yekeyên standard ên pîvandina dirêjahiyê pîvandînê dike û encama wê dibêje. 5.3.1.10. Dirêjahiyên bi yekeyên pîvana standard texmîn dike. 5.3.1.11. Dirêjahiya texmîn kiriye bi encama pîvandînê re berhev dike. 5.3.1.12. Bi yekeyên pîvandina dirêjahiyê yên standard yan ne-standard modelên dirêjahiyê çêdike. 5.3.1.13. Pirsgirêkên ku yekeyên dirêjahiyê yên standard tê de tên bikaranîn çareser dike. Ast 3 5.3.1.14. Ji bo metreyekê, nîv metreyê, 10 cm û 5 cm pîvandîneke ne-standard çêdike. 5.3.1.15. Bi bikaranîna amûrên pîvandînê yên ne-standard ên ku ji bo metreyekê, nîv metreyê, 10 cm û 5 cm çêkirine pîvandînê dike. 5.3.1.16. Yekeyên standard ên pîvandina dirêjahiyê bi hev re girê dide û ji cureyê hev dinivîse. 5.3.1.17. Pirsgirêkên herî zêde du kirinî yên li ser metre û santîmetreyê ji yekeyên pîvana standard çareser dike. Ast 4 5.3.1.18. Dibêje ku yekeya herî piçûk a pîvandina dirêjahiyê ya standard mîlîmetre ye. 5.3.1.19. Cihên bikaranîna mîlîmetreyê, yekeya herî piçûk a pîvandina dirêjahiyê ya standard, dibêje. 5.3.1.20. Yekeyên standard ên pîvandina dirêjahiyê bi hev re girê dide.	Di beşa pîvandînê de di çar kirinên têkildar û çareseriyên pirsgirêkan de divê li gorî astê di nav sînordariyên di beşa Hejmar û Kirin de tên berçavgirtin bê man. Dema xebata berhevdanê tê kirin divê gotinên wek “dirêjtir” û “kurttir” bînin bikaranîn. Divê tişt û wêneyên tiştan ên ku ji pênc tiştan derbas nabin bînin rêzkirin. Ji bo tevgera armanckirî 5.3.1.7. bi metre û santîmetreyê tê sînordarkirin. Dema ji bo pîvandina dirêjahiyên amûrên standard tên bikaranîn divê pîvandîn bi metre û santîmetreyê bînin kirin. Di tevgera armanckirî 5.3.1.9. de ji bo kesên kor divê cetwela bilindkirî bê bikaranîn. Ji bo tevgera armanckirî 5.3.1.11. bi bikaranîna şerîdên rengîn (ji bo koran cudahiyên taktîl) divê modelên ku dubarebûna yekeyê jî tê de tê dîtin bînin çêkirin. Divê rêzika jîmaran bi taybetmendiyên xwe yên bingeîn bê nasandin, di çalakiyan de bê bikaranîn û bi cetwelê re bê girêdan.

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		5.3.1.21. Ji bo dirêjahiyên ku dikare rasterast bipîve li gorî yekeyeke guncaw texmînan dike. 5.3.1.22. Pîrsgirêkên ku yekeyên pîvana standard tê de tîn bikaranîn çareser dike.	
Beş 5.3.Pîvandîn	5.3.2. Dirêjahiyên derdorê dipîve.	Ast 3 5.3.2.1. Derdorên tiştan nîşan dide. 5.3.2.2. Dirêjahiya derdora şeklan bi alîkariya yekeyên standard û ne standard dipîve. 5.3.2.3. Dirêjahiya derdora şeklan hesab dike. 5.3.2.4. Pîrsgirêkên bi dirêjahiya derdora şeklan ve girêdayî çareser dike. Ast 4 5.3.2.5. Dirêjahiya derdora çargoşe û çarçikê bi dirêjahiya kêlekan re girê dide. 5.3.2.6. Şeklên geometrîk ên cuda yê bi heman dirêjahiya derdorê çêdike. 5.3.2.7. Pîrsgirêkên bi hesabkirina dirêjahiya derdora şeklan ve girêdayî çareser dike. 5.3.2.8. Pîrsgirêkên bi hesabkirina dirêjahiya derdora şeklan ve girêdayî datîne.	Di çarçoveya armanca 5.3.2. de divê di hesabên derdorê de textê geometriyê, kaxeza xalî yan çargoşeyî bêt bikaranîn. Di çarçoveya armanca 5.3.2. de divê dirêjahiya derdora çargoşe, çarçik yan şeklên ji hev girtina wan pêkhatî yê li ser textê geometriyê, kaxeza xalî yan çargoşeyî hatine dayîn bêt hesabandin. Divê cih neyê dayîn derdora bazineyê. Ji bo kesên kor divê li şûna rûpela çargoşeyî rûpela derzîyî bêt bikaranîn. Di çarçoveya tevgera armanckirî 5.3.2.1. de divê pêşî bi yekeyên ne standard bêt xebitîn. Di tevgera armanckirî 5.3.2.5. de bi çalakîyên dîtina dirêjahiya kêlekekê ya çarçika ku derdor û dirêjahiya kêlekekê hatiye dayîn yan a çargoşeya ku dirêjahiya derdorê hatiye dayîn, divê tîkiliya derdor û dirêjahiya kêlekan bêt vekolîn. Divê bêt dîtina ku dirêjahiya derdora çargoşeyekê çar qatê dirêjahiya kêlekekê wê ye. Di xebatên bi vî rengî de divê cih bêt dayîn xebatên ku kaxeza çargoşeyî yan xalî tê de tîn bikaranîn (bi girêdana bi hejmara yekeyan re).
Beş 5.3.Pîvandîn	5.3.3. Dirêjahiyên rûerdê dipîve.	Ast 3 5.3.3.1. Rûerdê şeklan bi materyalên guncaw ên ne standard bi nixumandinê dipîve. 5.3.3.2. Rûerdeki diyar bi yekeyên pîvandina rûerd ên ne standard texmînan dike. Ast 4 5.3.3.3. Dibêje ku rûerdê şeklan hejmara çargoşeyên yekeyî yê wî rûerdî dinixumînin e. 5.3.3.4. Rûerdê çargoşe û çarçikê bi karên berhevkirin û lêkdanê re girê dide.	Di tevgera armanckirî 5.3.3.1. de wek materyalê nixumandinê kaxeza rengî a hevmezî, plastîk hwd. materyal dikarin bêt bikaranîn. Divê bi taybetî bal bêt kişandin ku rûyê tîn nixumandin yek perçe be. Di pîvandina rûerd de divê girîngiya hejmara yekeyan û dubarebûna yekeyê bêt tekezîrîn. Divê cih bêt dayîn xebatên ku kes hejmara yekeyan dijmêrin û dibêjin. Divê xebatên pîvandina du şeklên cuda bi yekeyên ne standard ên heman cureyî û berhevdana rûerdên wan bêt kirin. Di van xebatan de divê bal bêt kişandin ku tiştên ji bo kesê kor tîn bikaranîn ew qas mezin bin ku dema bi du destan tîn girtin agahiya rûerd bidin. Divê tiştên pîr mezin/pîr biçûk neyên tercîhkirin Di tevgera armanckirî 5.3.3.4. de divê rûerdê çargoşe û çarçikê bi jimartina çargoşeyên yekeyî bêt hesabandin. Divê bi karên jimartin, berhevkirina dubare û lêkdanê xebatên hesabkirina rûerd bêt kirin. Dema ev xebat tîn kirin divê ji tîkiliya rêz-stûnê sûd bêt wergirtin.
Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.3.Pîvandîn	5.3.4. Têgehên bi pere ve girêdayî ji hev cuda dike.	Ast 1 5.3.4.1. Pereyên bi nîrxê 1, 5, 10, 25, 50 qurûş û 1, 5, 10, 20, 50 TL ji hev cuda dike. Ast 2	Ji bo tevgera armanckirî 5.3.4.2. bi awayê ku nîrx ji 100 lîreyan derbas neke kar tî kirin. Ji bo kesên kor divê pereyên rastîn bêt nasandin û ji bo ku bikaribin pereyan ji hev cuda bikin divê “amûra naskirina pereyan” bêt bikaranîn. Heke amûra naskirina pereyan tine be, divê şiyana ji hev cudakirina pereyên hesinî li

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		5.3.4.2. Qurûş û lîreyê bi hev ve girê dide. 5.3.4.3. Pereyên bi mîqdarên cuda yên ku nîrxê wan ji 100 lîreyan derbas nake ji aliyê mezinahî-biçûkahiye ve berhev dike. 5.3.4.4. Pîrsgirêkên bi pere ve girêdayî çareser dike. Ast 3 5.3.4.5. Qurûş û lîreyê bi hev ve girê dide. 5.3.4.6. Pîrsgirêkên bi pere ve girêdayî çareser dike. 5.3.4.7. Pîrsgirêkên bi pere ve girêdayî datîne.	gorî mezinahiya wan bê qezenckirin. Di tevgera armanckirî 5.3.4.2.de divê wisa bê mînakdan ku deh heb 10 qurûş, çar heb 25 qurûş, du heb 50 qurûş dibin 1 lîre. Divê cih neyê dayîn nîşandanên dehişkî. Divê 100 û 200 TL bên nasandin. Ji bo tevgera armanckirî 5.3.4.5. divê cih bê dayîn mînakên wek 325 qurûş, 3 lîre 25 qurûş. Divê cih neyê dayîn nîşandana dehişkî.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.3. Pîvandîn	5.3.5. Têgehên bi dem ve girêdayî ji hev cuda dike.	Ast 1 5.3.5.1. Saetên tam dixwîne. 5.3.5.2. Niv saetan dixwîne. 5.3.5.3. Li ser salnameyê roj, hefte û mehê diyar dike. 5.3.5.4. Bûyer û rewşên diyar wek referans digire û rêzkirinên demî dike. Ast 2 5.3.5.5. Çaryek saetan dixwîne. 5.3.5.6. Yekeyên pîvandina demê bi hev ve girê dide. 5.3.5.7. Pîrsgirêkên bi yekeyên pîvandina demê ve girêdayî çareser dike. Ast 3 5.3.5.8. Demê bi deqe û saetê dibêje. 5.3.5.9. Yekeyên pîvandina demê bi hev ve girê dide. 5.3.5.10. Maweyên çêbûna bûyeran berhev dike. 5.3.5.11. Pîrsgirêkên ku yekeyên pîvandina demê tê de tên bikaranîn çareser dike. Ast 4 5.3.5.12. Yekeyên pîvandina demê bi hev ve girê dide. 5.3.5.13. Pîrsgirêkên ku yekeyên pîvandina demê tê de tên bikaranîn çareser dike. 5.3.5.14. Pîrsgirêkên ku yekeyên pîvandina demê tê de tên bikaranîn datîne.	Di hînkirina tevgera armanckirî 5.3.5.8.de divê ji bilî ku kes demê bi deqe û saetê dibêje, xwendin û nivîsandina wê jî bê hêvîkirin. Ji bo tevgera armanckirî 5.3.5.4. divê peyvên “berê/paşê”, “yekem/dawî”, “îro/duh/ sibe”, “sibeh/nîvro/êvar”, “şev/roj” bên bikaranîn. Ji bo Ast 2 yekeyên pîvandina demê deqe-saet, saet-roj, roj-hefte, roj-hefte-meh, meh-werz, werz-sal in. Ji bo Ast 3 yekeyên pîvandina demê sal-hefte, sal-roj, deqe-çirke ne. Ji bo Ast 4 yekeyên pîvandina demê saet-deqe, deqe-çirke, sal-mehhefte, meh-hefte-roj in. Di tevgerên armanckirî 5.3.5.6. û 5.3.5.9.de divê neyê ketin nav karên veguhertinê di navbera yekeyên pîvandina demê de. Di tevgera armanckirî 5.3.5.12.de divê veguhertinên di navbera saet-deqe, deqe-çirkeyê de bên kirin. Divê veguhertinên di navbera sal-meh-hefte, meh-hefte-rojê de bên kirin. Dema veguhertinê tê kirin divê behsa mijara sala bazdan jî bê kirin. Ji bo hînkirina saetê ji kesên kor re divê maketa saeta bi reqemên bilindkirî/Braille bê amadekirin. Ji bo kesên kor divê salnameyên bi Braille hatine amadekirin bên bikaranîn. Bikaranîna van salnameyan di jiyana rojane de dikare bê şopandin.
Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.3. Pîvandîn	5.3.6. Têgehên bi kêşanê ve girêdayî ji hev cuda dike.	Ast 1 5.3.6.1. Tiştan ji aliyê giraniya wan ve berhev dike. 5.3.6.2. Tiştan ji aliyê giraniya wan ve rêz dike. Ast 2 5.3.6.3. Tiştan bi bikaranîna amûrên standard bi kîlogramê dikêşe û berhev dike.	Ji bo tevgera armanckirî 5.3.6.1. pêşî du tiştên berhevkin. Bi bikaranîna gotinên wek “girantir”, “siviktir”, “ya herî giran”, “ya herî sivik” tê peyda kirin ku encamên berhevdanê bên îfadekirin. Bi rêzkirina herî kêmtir tiştan li gorî giraniya wan, têkiliya di navbera wan de tê şirovekirin. Gotinên wek “ya herî giran”, “ya herî sivik” tên bikaranîn.

Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		5.3.6.4. Pirsgirêkên bi yekeya pîvandina giraniyê ve girêdayî çareser dike. Ast 3 5.3.6.5. Tiştan bi gram/kîlogramê dipîve. 5.3.6.6. Giraniya tişteki texmîn dike. 5.3.6.7. Bi pîvandinê rastiya giraniya texmîn kiriye kontrol dike. 5.3.6.8. Pirsgirêkên bi kîlogram/gramê ve girêdayî çareser dike. Ast 4 5.3.6.9. Nîv û çaryek kîlogramê bi gramê ifade dike. 5.3.6.10. Dema giraniyê dipîve kîlogram û gramê bi hev re bi kar tîne. 5.3.6.11. Cihên ku ton û mîlîgram tê de tên bikaranîn dibêje. 5.3.6.12. Yekeyên ton-kîlogram, kîlogram-gram, gram-mîlîgramê bi hev ve girê dide. 5.3.6.13. Ton-kîlogram, kîlogram-gram, gram-mîlîgramê li hev diguherîne. 5.3.6.14 Pirsgirêkên bi ton, kîlogram, gram û mîlîgramê ve girêdayî çareser dike. 5.3.6.15. Pirsgirêkên bi ton, kîlogram, gram û mîlîgramê ve girêdayî datîne.	Ji bo tevgera armanckirî 5.3.6.1. divê gotinên wek “girantir”, “siviktir”, “ya herî giran”, “ya herî sivik” bên bikaranîn. Di tevgera armanckirî 5.3.6.7.de divê cih neyê dayîn pirsgirêkên ku veguhertinê hewce dikin. Ji bo tevgera armanckirî 5.3.6.10. divê cih bê dayîn nîşandana ton û mîlîgramê bi bikaranîna kurtenavê. Ji bo koran divê cih bê dayîn sembolên Braille. Ji bo tevgera armanckirî 5.3.6.11. divê veguhertinên ku nîşandana dehişk hewce nakin bên kirin. Ji bo armanca 5.3.6. di kesên kor de kêşanên bideng, etîketên diaxivin dikarin bên bikaranîn.
Beş	Armanc	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.3. Pîvandin	5.3.7. Şilavan dipîve.	Ast 1 5.3.7.1. Bi bikaranîna yekeyên ne standard şilavan dipîve. 5.3.7.2. Mîqdara şilava di herî kêrî sê firaqên wekhev de berhev dike. 5.3.7.3. Mîqdara şilava di herî kêrî sê firaqên wekhev de rêz dike. Ast 2 5.3.7.4. Bi bikaranîna yekeyên pîvandina şilavê yê ne standard mîqdara şilavan dipîve û berhev dike. 5.3.7.5. Pirsgirêkên bi yekeyên pîvandina şilavê yê ne standard ve girêdayî çareser dike. Ast 3 5.3.7.6. Bi ravekirina pêwîstiya amûr û yekeyên pîvandina şilavê yê standard bi yekeyên lître yan nîv lître yê pîvandinan dike. 5.3.7.7. Mîqdara şilava di firaqekê de bi yekeyên lître û nîv lître yê texmîn dike. 5.3.7.8. Bi pîvandinê rastiya mîqdara şilava texmîn kiriye kontrol dike. 5.3.7.9. Pirsgirêkên bi lître yê ve girêdayî çareser dike. Ast 4	Ji bo tevgera armanckirî 5.3.7.2. dema xebatên berhevdanê tên kirin divê gotinên wek “tîjî/vala”, “bêtir/kêmtir”, “nîvê wê tîjî” bên bikaranîn. Di pîvandina şilavan de ji bo koran amûrên pîvandina asta şilavê dikarin bên bikaranîn. Amûrên pîvandina şilavê yê bideng dikarin bên tercîhkirin. Li ser firaqên pîvandina şilavê yê standard (îskanên pîvandina şilavê yê 1 lître yê, nîv lître yê) sembolên taktîl dikarin bên nivîsandin.

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		5.3.7.10. Warên bikaranîna mîlîlîtreyê dibêje. 5.3.7.11. Lître û mîlîlîtreyê bi hev ve girê dide û li hev diguherîne. 5.3.7.12. Ji bo diyarkirina mîqdare lître û mîlîlîtreyê bi hev re bi kar tîne. 5.3.7.13. Mîqdara şilava di firaqekê de bi yekeyên lître/ mîlîlîtreyê texmîn dike. 5.3.7.14. Mîqdara şilava texmîn kiriye bi pîvandîne kontrol dike. 5.3.7.15. Pirsgirêkên bi lître û mîlîlîtreyê ve girêdayî çareser dike. 5.3.7.16. Pirsgirêkên bi lître û mîlîlîtreyê ve girêdayî datîne.	

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.4. Pêvajokirina Daneyan	5.4.1 Bi vekolîna tablo û grafîkên hêsan şirove û texmînan dike.	Ast 1 5.4.1.1. Tabloyên hêsan ên bi bikaranîna sembol, reqeman hatine çêkirin dixwîne. 5.4.1.2. Tabloyên hêsan ên herî zêde du komên daneyan hene dixwîne. Ast 2 5.4.1.3. Bersiva pirsên li ser tabloyên hêsan ên herî zêde du komên daneyan hene yê xwe çêkirine tî pirsîn dide. Ast 3 5.4.1.4. Bi ravekirina agahiyên di grafîka şekl û tiştan de tî nîşandan ji grafîkê bo çetele/tabloya frekansê veguhertinan dike. 5.4.1.5. Tabloyên hêsan ên herî zêde sê komên daneyan hene dixwîne. Ast 4 5.4.1.6. Bi vekolîna grafîka stûnî şirove û texmînan dike.	Ji bo armanca 5.4.1. divê di xwendina tabloyan de berhevdana beşên cuda yê daneyan bê peyda kirin. Divê xwendina tabloyê şirovekirina tabloyê jî bihewîne. Ji bo tevgerên armanckirî 5.4.1.1. û 5.4.1.2. divê di xebatên xwendina tabloyê de tabloyên wek tabloya xwarina rojane, tevger, rêzik, çalakîyê yê ku kes pir pê re rû bi rû dimînin bî bikaranîn. Divê pêşî tişt û wêneyên tiştan bî bikaranîn. Divê sembol (stêrk, rûyê bişîrîn hwd.) bî tercîh kirin. Ji bo tevgerên armanckirî 5.4.1.1. û 5.4.1.2. divê dane bi jimarên 1-20 bî sîno darkirin.

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
Beş 5.4. Pêvajokirina Daneyan	5.4.2. Çetele, tabloya frekansê, grafîka tişt, şekl û stûnî çêdike.	Ast 1 5.4.2.1. Tabloyên tevger/çalakîyê yê bi wêne bi bikaranîna sembolan tije dike. 5.4.2.2. Tabloyên tevger/çalakîyê yê bi wêne bi bikaranîna reqeman tije dike. Ast 2 5.4.2.3. Li ser pirsgirêkek yan mijarekê bi pirsîna pirsan dane berhev dike, dabeş dike, wek şemaya darê, çetele yan tabloya frekansê rêk dixê. 5.4.2.4. Bersiva pirsên li ser şemaya darê, çetele, tabloya	Ji bo armanca 5.4.2. ast 1 divê di xebatên çêkirina tabloyê de tabloyên wek tabloya xwarina rojane, tevger, rêzik, çalakîyê yê ku kes pir pê re rû bi rû dimînin bî bikaranîn. Divê pêşî tişt û wêneyên tiştan bî bikaranîn. Divê sembol (stêrk, rûyê bişîrîn hwd.) bî bikaranîn. Divê dane bi jimarên 1-20 bî sîno darkirin. Divê tablo aidî herî zêde du komên daneyan be. Ji bo tevgerên armanckirî 5.4.2.1. û 5.4.2.2. divê du yan zêdetir taybetmendî bî bikaranîn. Ji bo tevgera armanckirî 5.4.2.6. dema grafîk tî çêkirin divê bal bî kişandin ku

Beş	Armanç	Tevgerên Armanckirî	Ravekirin
		frekansê ya herî zêde du komên daneyan hene ya xwe çêkiriye tên pirsîn dide. 5.4.2.5. Li ser pirsgirêkek yan mijarekê bi pirsîna pirsan dane berhev dike, dabeş dike, grafîka tişt û şeklan çêdike. 5.4.2.6. Bersiva pirsên li ser grafîka tişt û şeklan a herî zêde du komên daneyan hene ya xwe çêkiriye tên pirsîn dide. Ast 4 5.4.2.7. Li ser pirsgirêkek yan mijarekê bi pirsîna pirsan grafîka stûnî ya li gorî daneyên berhev kiriye çêdike. 5.4.2.8. Ji bo pêşkêşkirina daneya bi dest xistiye nîşandanên cuda bi kar tîne. 5.4.2.9. Li gorî grafîka stûnî, tablo û grafîkên din texmînan dike.	dane herî zêde di çar kategoriyan de bikaribe bê rêxistin û ji bo her daneyekê tiştêk bê bikaranîn, tişt li kêleka hev yan li ser hev bîn. Ji bo tevgera armanckirî 5.4.2.9. divê ji grafîka tişt yan şeklan sûd bê wergirtin. Çetele û tabloyên frekansê jî dikarin bîn bikaranîn.
Beş 5.4. Pêvajokirina Daneyan	5.4.3. Bi bikaranîna agahiyên bi grafîka stûnî, tablo û grafîkên din tên nîşandan pirsgirêkên bi jiyana rojane ve girêdayî çareser dike.	Ast 3 5.4.3.1. Bi bikaranîna grafîkên hatine dayîn pirsgirêkên ku kara berhevkirin/kêmkirinê hewce dikin çareser dike. 5.4.3.2. Bi bikaranîna agahiyên di pirsgirêkê de hatine dayîn grafîkê çêdike. 5.4.3.3. Bi bikaranîna grafîkên çêkirine pirsgirêkên ku kara berhevkirin/kêmkirinê hewce dikin çareser dike. 5.4.3.4. Bi alîkariya grafîkan pirsgirêkên ku karên berhevkirin/kêmkirinê hewce dikin çareser dike. Ast 4 5.4.3.5. Grafîka stûnî, tablo û grafîkên din di çareserkirina pirsgirêkan de bi kar tîne.	Ji bo armanca 5.4.3. divê kes di pirsgirêkan de bersiva pirsên wek “Çiqas zêdetir? Çiqas kêmtir?” bidin. Divê grafîk aidî herî zêde çar komên daneyan bin.

Beş	Armanç	Ast 1	Ast 2	Ast 3	Ast 4
Beş 1. Jimar û Kar	5.1.1. Bi rîtmîk dijmêre.	5.1.1.1. Ji 0an heta 100î ber bi pêş yek bi yek bi rîtmîk dijmêre. 5.1.1.2. Ji jimarekê ya di navbera 1-20 de hatiye dayîn dest pê dike û ber bi pêş yek bi yek bi rîtmîk dijmêre. 5.1.1.3. Ji 0an heta 100î ber bi pêş deh bi deh bi rîtmîk dijmêre. 5.1.1.4. Ji 0an heta 100î ber bi pêş pênc bi pênc bi rîtmîk dijmêre. 5.1.1.5. Heta 20î ber bi pêş du bi du bi rîtmîk dijmêre. 5.1.1.6. Ji 20î dest pê dike û ber bi paş yek bi yek bi rîtmîk dijmêre.	5.1.1.8. Ji 100î ber bi paş du bi du bi rîtmîk dijmêre. 5.1.1.9. Ji 0an heta 30î ber bi pêş sê bi sê bi rîtmîk dijmêre. 5.1.1.10. Ji 30î heta 0an ber bi paş sê bi sê bi rîtmîk dijmêre. 5.1.1.11. Ji 0an heta 40î ber bi pêş çar bi çar bi rîtmîk dijmêre. 5.1.1.12. Ji 40î heta 0an ber bi paş çar bi çar bi rîtmîk dijmêre. 5.1.1.13. Ji jimarekê ya di navbera 1-30 de hatiye dayîn dest pê dike û ber bi pêş sê bi sê bi rîtmîk dijmêre. 5.1.1.14. Ji jimarekê ya di navbera	5.1.1.17. Ji 0an heta 60î ber bi pêş şeş bi şeş bi rîtmîk dijmêre. 5.1.1.18. Ji 0an heta 70î ber bi pêş heft bi heft bi rîtmîk dijmêre. 5.1.1.19. Ji 0an heta 80î ber bi pêş heşt bi heşt bi rîtmîk dijmêre. 5.1.1.20. Ji 0an heta 90î ber bi pêş neh bi neh bi rîtmîk dijmêre. 5.1.1.21. Ji 100î heta 1000î ber bi pêş sed bi sed bi rîtmîk dijmêre. 5.1.1.22. Ji 1000î ber bi paş sed bi sed bi rîtmîk dijmêre. 5.1.1.23. Ji jimarekê ya di navbera 1-1000 de hatiye dayîn dest pê dike	5.1.1.25. Heta 10.000î hezar bi hezar bi rîtmîk dijmêre.

Beş	Armanc	Ast 1	Ast 2	Ast 3	Ast 4
		5.1.1.7. Ji 20î dest pê dîke û ber bi paş du bi du bi rîtmîk dijmêre.	1-30 de hatiye dayîn dest pê dîke û ber bi paş sê bi sê bi rîtmîk dijmêre. 5.1.1.15. Ji jimarekê ya di navbera 1-40 de hatiye dayîn dest pê dîke û ber bi pêş çar bi çar bi rîtmîk dijmêre. 5.1.1.16. Ji jimarekê ya di navbera 1-40 de hatiye dayîn dest pê dîke û ber bi paş çar bi çar bi rîtmîk dijmêre.	û ber bi pêş deh bi deh bi rîtmîk dijmêre. 5.1.1.24. Ji jimarekê ya di navbera 1-1000 de hatiye dayîn dest pê dîke û ber bi pêş sed bi sed bi rîtmîk dijmêre.	

Beş	Armanc	Ast 1	Ast 2	Ast 3	Ast 4
Beş 1. Jimar û Kar	5.1.2. Tiştan/ wêneyên tiştan dijmêre.	5.1.2.1. Tişt/wêneya tişt bi hejmara di navbera 1-20 de ya li kêleka hev rêzkirî yek bi yek dijmêre. 5.1.2.2. Tişt/wêneya tişt bi hejmara di navbera 1-20 de ya tevlihev hatiye rêzkirin yek bi yek dijmêre.	5.1.2.3. Tiştên/wêneyên tiştên di komekê de ku hejmara tiştan heta 100î ye yek bi yek dijmêre. 5.1.2.4. Tiştên/wêneyên tiştên di komekê de ku hejmara tiştan heta 100î ye deh bi deh dijmêre. 5.1.2.5. Tiştên/wêneyên tiştên di komekê de ku hejmara tiştan heta 100î ye pênc bi pênc dijmêre. 5.1.2.6. Tiştên/wêneyên tiştên di komekê de ku hejmara tiştan heta 100î ye du bi du dijmêre. 5.1.2.7. Tiştên/wêneyên tiştên di komekê de ku hejmara tiştan heta 30î ye sê bi sê dijmêre. 5.1.2.8. Tiştên/wêneyên tiştên di komekê de ku hejmara tiştan heta 40î ye çar bi çar dijmêre.		
	5.1.3. Pirrayiya ku li hember jimarekê heta 100î tê wek dane îfade dîke.	5.1.3.1. Komeke tiştan a di navbera 1-20 de dijmêre û hejmara wê dibêje. 5.1.3.2. Komeke tiştan a di navbera 1-20 de ya di wêneyê de dijmêre û hejmara wê dibêje.	5.1.3.4. Komeke tiştan a di navbera 20100 de ya di wêneyê de dijmêre û hejmara wê dibêje.		

Beş	Armanc	Ast 1	Ast 2	Ast 3	Ast 4
		5.1.3.3. Ji nav komeke tiştan a di navbera 1-20 de bi hejmara tê xwestin tiştan dijmêre û cuda dîke.			

Beş	Armanç	Ast 1	Ast 2	Ast 3	Ast 4
Beş 1. Jimar û Kar	5.1.4. Jimarên xwezayî dinivîse.	5.1.4.1. Dibêje ku pirrayiya ji 10 hebûnên heman cureyî pêkhatî destek e. 5.1.4.2. Dibêje ku pirrayiya ji 12 hebûnên heman cureyî pêkhatî dûzîneyek e. 5.1.4.3. Komeke tiştan/ wêneya tiştan a di navbera 10-20 de (10 û 20 tê de) li dehi û yekikên wê parve dike. 5.1.4.4. Hejmara dehi û yekika komeke tiştan/ wêneya tiştan a di navbera 10-20 de dibêje. 5.1.4.5. Jimara ku li hember koma tiştan a di navbera 10-20 de ya li dehi û yekikên wê parve kiriye tê dinivîse. 5.1.4.6. Jimara ku li hember koma tiştan a di navbera 10-20 de ya li dehi û yekikên wê parve kiriye tê dixwîne. 5.1.4.7. Jimarên di navbera 1-20 de dixwîne. 5.1.4.8. Jimara di navbera 1-20 de ya tê gotin bi reqemê dinivîse.	5.1.4.9. Pirrayiyeke ku hejmara tiştan ji 100î kêmtir e bi bikaranîna modelê li dehi û yekikên wê parve dike. 5.1.4.10. Hejmara dehi û yekika pirrayiya ku li komên dehi û yekikan parve kiriye dibêje. 5.1.4.11. Jimara ku li hember pirrayiyeke di navbera 20-100 de ya li dehi û yekikên wê parve kiriye tê dinivîse. 5.1.4.12. Jimara ku li hember pirrayiyeke di navbera 20-100 de ya li dehi û yekikên wê parve kiriye tê dixwîne. 5.1.4.13. Jimarên xwezayî yên du pileyî dixwîne. 5.1.4.14. Jimarên xwezayî yên du pileyî yên tî gotin bi reqemê dinivîse.	5.1.4.15. Pirrayiyeke ku hejmara tiştan 100-1000 e bi bikaranîna modelê li sedik, dehi û yekikên wê parve dike. 5.1.4.16. Hejmara sedik, dehi û yekika pirrayiya ku li sedik, dehi û yekikên wê parve kiriye dibêje. 5.1.4.17. Jimara ku li hember pirrayiyeke di navbera 100-1000 de ya li sedik, dehi û yekikên wê parve kiriye tê dinivîse. 5.1.4.18. Jimara ku li hember pirrayiyeke di navbera 100-1000 de ya li sedik, dehi û yekikên wê parve kiriye tê dixwîne. 5.1.4.19. Jimarên xwezayî yên sê pileyî dixwîne. 5.1.4.20. Jimarên xwezayî yên sê pileyî yên tî gotin bi reqemê dinivîse.	5.1.4.21. Jimarên xwezayî yên 4, 5 û 6 pileyî dixwîne. 5.1.4.22. Jimarên xwezayî yên 4, 5 û 6 pileyî yên tî gotin bi reqemê dinivîse.

Beş	Armanç	Ast 1	Ast 2	Ast 3	Ast 4
	5.1.5. Pile û nixên pileyê yên jimarên xwezayî dinivîse.		5.1.5.1. Navên pileyê yên jimarên xwezayî yên ji 100î biçûktir li ser modelan dinivîse. 5.1.5.2. Nixên pileyê yên jimarên xwezayî yên ji 100î biçûktir dinivîse.	5.1.5.3. Navên pileyê yên jimarên sê pileyî li ser modelan dinivîse. 5.1.5.4. Nixên pileyê yên jimarên sê pileyî li ser modelan dinivîse.	5.1.5.5. Navên pileyê yên jimarên xwezayî yên 4, 5 û 6 pileyî dinivîse. 5.1.5.6. Nixên pileyê yên jimarên xwezayî yên 4, 5 û 6 pileyî dinivîse. 5.1.5.7. Jimarên 4, 5 û 6 pileyî li beşikên wan parve dike. 5.1.5.8. Jimarên 4, 5 û 6 pileyî vedikole.

Beş	Armanç	Ast 1	Ast 2	Ast 3	Ast 4
Beş 1. Jimar û Kar	5.1.6. Jimarên xwezayî rêz dike.	5.1.6.1. Jimarên ji 1ê heta 20î bi awayekî rêz kirî dinivîse. 5.1.6.2. Jimara ku piştî jimarekê ya di navbera 1-20 de hatiye dayîn tê	5.1.6.6. Jimara ku piştî jimarekê ya di navbera 1-100 de hatiye dayîn tê dinivîse. 5.1.6.7. Jimara ku berî jimarekê ya		

Beş	Armanc	Ast 1	Ast 2	Ast 3	Ast 4
		dinivîse. 5.1.6.3. Jimara ku berî jimarekê ya di navbera 1-20 de hatiye dayîn tê dinivîse. 5.1.6.4. Jimarên ji 1ê heta 20î yê bi rêza tevlihev hatine dayîn li gorî rêza jimartinê rêz dike. 5.1.6.5. Jimara/ jimarên ku di rêzeya jimarên ji 1ê heta 20î hatiye dayîn de kêmtir hatine hiştin dinivîse.	di navbera 1-100 de hatiye dayîn tê dinivîse. 5.1.6.8. Herî zêde 4 jimarên xwezayî yê di navbera 1-100 de bi rêza tevlihev hatine dayîn li gorî rêza jimartinê rêz dike. 5.1.6.9. Jimarên ku di rêzeyeke jimarên a bi jimarên xwezayî yê ji 100î biçûktir hatiye çêkirin de kêmtir hatine hiştin dinivîse.		

Beş	Armanc	Ast 1	Ast 2	Ast 3	Ast 4
Beş 1. Jimar û Kar	5.1.7. Bi hevberkirina yek bi yek a du komên tiştan, di navbera hejmara tiştên koman de berhevdanê dike.	5.1.7.1. Du komên tiştan ên bi heman hejmarê yê di navbera 1-20 de yek bi yek hevber dike û dibêje ku wekhev in. 5.1.7.2. Du komên tiştan ên bi hejmarên cuda yê di navbera 1-20 de yek bi yek hevber dike û dibêje ku komeke tiştan ji ya din kêmtir e. 5.1.7.3. Du komên tiştan ên bi hejmarên cuda yê di navbera 1-20 de hevber dike û dibêje ku komeke tiştan ji ya din zêdetir e.			
	5.1.8. Jimarên xwezayî berhev dike.	5.1.8.1. Du jimarên di navbera 10-20 de berhev dike û dibêje ku her du jimar wekhev in. 5.1.8.2. Du jimarên di navbera 10-20 de berhev dike û ya mezin dibêje. 5.1.8.3. Du jimarên di navbera 10-20 de berhev dike û ya biçûk dibêje.	5.1.8.4. Herî zêde çar jimarên xwezayî yê ji 100î biçûktir berhev dike û ya mezin/herî mezin dibêje. 5.1.8.5. Herî zêde çar jimarên xwezayî yê ji 100î biçûktir berhev dike û ya biçûk/herî biçûk dibêje. 5.1.8.6. Herî zêde çar jimarên xwezayî yê ji 100î biçûktir ji mezin bo biçûk/ji biçûk bo mezin rêz dike.	5.1.8.7. Herî zêde pênc jimarên xwezayî yê ji 1000î biçûktir berhev dike û dibêje kîjan mezin/herî mezin e. 5.1.8.8. Herî zêde pênc jimarên xwezayî yê ji 1000î biçûktir berhev dike û dibêje kîjan biçûk/herî biçûk e. 5.1.8.9. Herî zêde pênc jimarên xwezayî yê ji 1000î biçûktir bi bikaranîna sembolen ">" û "<" ji mezin bo biçûk/ji biçûk bo mezin rêz dike.	5.1.8.10. Jimarên xwezayî yê herî zêde şeş pileyî bi bikaranîna sembola mezin/biçûk rêz dike.

Beş	Armanc	Ast 1	Ast 2	Ast 3	Ast 4
	5.1.9. Jimarên ji bo diyarkirina rêzê bi kar tîne.	5.1.9.1. Rêza tiştên/wêneyên tiştên di rêzeyeke de dibêje.			

Beş	Armanç	Ast 1	Ast 2	Ast 3	Ast 4
		5.1.9.2. Tiştê/wênêya tiştê ku rêza wê di rêzeyekê de tê gotin nîşan dide. 5.1.9.3. Jimara ku rêzê diyar dike dixwîne. 5.1.9.4. Jimara ku rêzê diyar dike dinivîse.			
Beş 1. Jimar û Kar	5.1.10. Li gorî rêzikeke diyar şablona jimarên a zêdebûyî/kêmbûyî çêdike.		5.1.10.1. Rêzika şablona jimarên a ku cudahiya di navbera wan de sabit e dibêje. 5.1.10.2. Hêmana kêmbûyî hatiye hiştin a şablona jimarên a ku cudahiya di navbera wan de sabit e dinivîse.	5.1.10.3. Şablona jimarên a ku cudahiya di navbera wan de sabit e herî zêde 4 gavan didomîne. 5.1.10.4. Li gorî rêzikeke diyar şablona jimarên a yek rêzikî ya zêdebûyî yan kêmbûyî çêdike.	5.1.10.5. Li gorî rêzikeke diyar şablona jimarên a du rêzikî ya zêdebûyî yan kêmbûyî çêdike. 5.1.10.6. Rêzîkên şablona jimarên a li gorî du rêzikan çekiriye dibêje.
	5.1.11. Jimarên xwezayî ber bi dehi/ sedik/hezarika herî nêzîk gilover dike.		5.1.11.1. Dehika ku jimareke xwezayî ya ji 100î biçûktir jê re nêzîk e dibêje. 5.1.11.2. Jimareke xwezayî ya ji 100î biçûktir ber bi dehika jê re nêzîk gilover dike.	5.1.11.3. Dehika/sedika ku jimareke xwezayî ya sê pileyî jê re nêzîk e dibêje. 5.1.11.4. Jimareke xwezayî ya sê pileyî ber bi dehika/sedika jê re nêzîk gilover dike.	5.1.11.5. Dehika/sedika/ hezarika ku jimareke xwezayî ya çar pileyî jê re nêzîk e dibêje. 5.1.11.6. Jimareke xwezayî ya çar pileyî ber bi dehika/sedika/ hezarika jê re nêzîk gilover dike.

Beş	Armanç	Ast 1	Ast 2	Ast 3	Ast 4
Beş 1. Jimar û Kar	5.1.12. Jimarên xwezayî li gorî kit yan cot bûna wan ji hev cuda dike.			5.1.12.1. Tiştan/ wênên tiştan kom dike û dibêje ku hejmara tiştan kit yan cot e. 5.1.12.2. Dibêje ku jimarên hatine dayîn kit yan cot in. 5.1.12.3. Dibêje ku berhevkarîya du jimarên xwezayî yê kit cot e. 5.1.12.4. Dibêje ku berhevkarîya du jimarên xwezayî yê cot cot e. 5.1.12.5. Dibêje ku berhevkarîya du jimarên xwezayî yê kit û cot kit e.	
	5.1.13. Jimarên bi reqemên Romî îfade dike.			5.1.13.1. Reqemên Romî yê heta 20î dixwîne. 5.1.13.2. Jimarên heta 20î bi reqemên Romî dinivîse.	

Beş	Armanc	Ast 1	Ast 2	Ast 3	Ast 4
	5.1.14. Bi jimarên xwezayî kara berhevkirinê dike.	5.1.14.1. Li koma tiştan bi qasî jimara hatiye diyarkirin tiştan zêde dike û dibêje ku hejmara komê zêde bûye/pirtir bûye.	5.1.14.11. Bi du jimarên ku berhevkarîya wan ji 100î derbas nake kara berhevkirinê ya bê destik dike.	5.1.14.17. Bi du jimarên ku berhevkarîya wan ji 1000î derbas nake kara berhevkirinê ya bê destik dike.	5.1.14.23. Bi jimarên herî zêde çar pileyî kara berhevkirinê ya bi destik/bê destik dike.

Beş	Armanc	Ast 1	Ast 2	Ast 3	Ast 4
